Molla Muhammed Şoşik’in yaşamıyla ilgili elimizin altında bulunda kaynaklarda çoğunlukla onun hem çocukluk döneminde hem de ilim öğrenme sürecinde yaşadığı sıkıntı ve zorluklar ile birlikte ilme karşı duyduğu yoğun arzu, istek ve ilim yolunda gösterdiği çaba ve başarılarından bahsedilir. Biz onun bu ilginç hayat serüvenini beş kaynaktan elde ediyoruz: O ‘‘Nûra Qelban’’ adlı eserinin son cildinde otobiyografisini kaleme almıştır (Şoşiki, 2014: 848-851). Bunun yanında eseri basıma hazırlayanlar tarafından birinci cildin başında onun kısa hayatına yer verilmiştir (Şoşiki, 2010: 4). Ayrıca yazarın hayatı üzerine üç tane akademik makale ve TRT Kurdi’de¹ de kendisiyle yapılan bir röportaj yayımlanmıştır.

Edindiğimiz bilgilerden hareketle Molla Şoşiki’nin hayatı ve yaşanmışlıklarından birçok ders ve ibret çıkarılabileceğini anlıyoruz. Örneğin, eğer insan isterse okuma, öğrenme ve ilme ulaşmada hiç bir şey kendisine engel teşkil edemez ki böylelikle kişi vatanına, milletine, dinine ve insanlığa eşsiz hizmetler edebilsin. Yarı tutsak, zavallı bir babayla çektikleri ağır yoksulluğa, öksüzlüğe ve o dönemdeki medrese ve Kur’an öğretimi üzerindeki yasaklara rağmen bir insan bilgi ve ilimde nasıl olur da böyle bir seviyeye ulaşabilir ve yetmiş yaşında ilk eseri olarak yaklaşık 4300 sayfadan oluşan bir Kürtçe Kur’an tefsirini yazabildi? Bu yüzden biz de bu değerli âlimi ve onun bu önemli eserini çalışmamıza konu edindik. Hayat hikâyesiyle başlıyoruz.

¹ Trt Kurdî: Wext Çawa Derbas Bû <https://www.youtube.com/watch?v=Dmru-RFYmKw>

Molla Muhammed Şoşiki, aslen Siirt iline bağlı Ekmekli (Binerve) köyündendir. Kimlikte resmi adı Mehmet Edebalı olarak yazılmıştır. Anne adı Fatma baba adı Abdullah'tır. Molla Şoşiki doğduğunda savaş, asayişsizlik, yokluk, yoksulluk, hayat pahalılığı, baskı ve zulümler vardı (Şoşik,2014:848). Birinci dünya savaşı birkaç yıl önce bitmesine rağmen Anadolu'da savaş daha yeni sonlanmıştı. Onlarca yıl süren savaşıllardan sonra ülke yerle bir olmuş, Kurtuluş Savaşı yeni bitmiş, Osmanlı İmparatorluğu yerine Türkiye Cumhuriyeti kurulmuştu ve daha yeni Şeyh Sait isyanı bastırılmıştı.

Ekonomik, toplumsal ve siyasal sıkıntı ve sorunlarla dolu bu dönemde Molla Şoşik'in ailesi Irak'a göç etti. O da bu dönemde 1926'da Irak'ın Zaho'da dünyaya geldi. Ailesi daha o kendisini tanıyacak yaşa gelmeden hemen birkaç yıl sonra memlekete geri dönüp köylerine yerleşirler. Yedi yaşındayken annesi Hakkın rahmetine kavuşur. O artık ablası ve kendinden küçük bir kardeşiyle öksüz kalarak bir sürü sıkıntı, zorluk ve yoksulluk içindedir. Ama annesinin ‘‘Muhammedim oku’’ sözünü yerine getirip daha sekiz yaşındayken Kur'an'ı hatim eder. Yaşadıkları fakirlik ve perişaktan dolayı Tillo'ya bağlı Fersaf köyünün sakinlerinden olan bir akrabası evlerini köyüne getirtip onları yanına alır. Ancak onları orada da fakirlik ve yoksulluk bırakmaz. Şoşiki ise daha dokuz-on yaşındayken bu Arap köyünde birisinin yanında okuma fırsatını kovalar. Bunun için Doluharmen (Fiskine) köyüne gidip Şeyh Seyfeddin'e yanında ilim tahsili almak için başvurur. Fakat hocası Kur'an ve din eğitimi üzerindeki yasaklardan dolayı din eğitimi almak isteyen öğrencilerin derslerini veremiyordu. Onun hem öksüz olduğundan hem de okumak için aşırı istekli olduğunu görünce seyisi olması şartıyla onu evine alıp ders ve eğitimi üzerine alır. Üç yıl kadar yanında okur. Fakat kendisinden başka talebenin olmamasından dolayı iznini ister ve ordan ayrılır. İlim tahsili uğruna yola çıkıp, Kurtalan'da Qadiyan köyün gelir ve orada Şeyh Hasip'in yanına yerleşir. Kısa bir eğitim sürecinden sonra ağır bir hastalıktan dolayı çaresiz kalıp tekrar evine geri döner. Bir yıla yakın yatak döşek kaldıktan sonra Allah şifa verip onu bu hastalığından kurtarır (Şoşik, 2014: 848; Şoşik, 2015)

Eski sağlığına ve gücüne kavuştuktan sonra okuma ve ilim eğitimi almak için tekrar yollara revan olur. Eski hocası Şeyh Seyfeddin Şirvan'a bağlı İrun adlı köye

ilim tahsili için gittiğinden o da yine onun yanına gider. Bu bölgedeki kötüleşen yaşam şartları, soğuk ve ayaz okuma imkânlarını oldukça zorlaştırır. Bu süreçte babası da Siirt'i terk edip evlerini Muş Ovası'na taşır. Burada maddi durumları biraz düzelir zira babası hem ticaretle uğraşır hem de bir imamın yanında müezzinlik yapmaktadır. Bir yıl sonra o da Muş'a ailesini ziyarete gelir. Babası artık onun Siirt'e gitmesine izin vermez ve O onu Muş'a bağlı Has Köyünde Şeyh Takyeddin'in yanına yerleştirir. Artık eğitimine oradan devam eder. Daha sonra Şeyh Takyeddin eğitim için Bulanık'a gidince onu da yanında götürür.

Her ikisi Ketre Köyündeki medresede Müderris Mola Muhammed Şerif'in yanında eğitime başlarlar fakat bir hafta sonra Şeyh Muhammed Şerif çok fazla talebesi olduğunu ve hepsinin geçimini sağlayamayacağını söyleyip onu medreseden göndermek ister. O an dünyası alt üst olur ve öyle üzülür sanki dünya başına yıkılır. O artık kalbi fazlasıyla kırık ve çaresizdir. Hocasına Siirt'ten Muş'a ve oradan da onun yanına geldiğini söyler. Hocası da ona Ağrı vilayetine gitmekten başka çaresi olmadığını belirtir. Ağrı'nın Zado Köyüne gidebilirse Şeyh Vecheddin adlı amcasının orada kendisine yardımcı olacağını söyler. Çaresizce yine tek başına yollara düşer. Elinde Şeyh Muhammed Şerif'in köylerin isimlerinin yazılı olduğu haritaya benzer kağıtla yolluksuz, eski püskü yırtık ayakkabı ve elbiselerle çorak toprakları, dağları, ovaları ve yaylaları aşip zorlu bir haftalık yaya yolculuğunda sonra Ağrı'ya Şeyh Vecheddin'in yanına varır. Geliş nedenini söyler. Şeyh onu yanına kabul eder, onun yerini yapar ve orada kalır. Fakat o zamanlarda medrese/dini eğitim yasak olduğu için Şeyhin talebelere dini ders verdiği resmi makamlara şikâyet edilmiştir. Onun için orada da fazla kalıp okuyamaz. Hocası ona köylerin ismini yazıp onu Van Erçiş'e yakın Gelut adlı bir köye Müderris Abdulkerim'in yanında ders görmesi için gönderir. Tekrar yola çıkıp köy köy gidip bu köye ulaşır. Müderris Abdulkerim onu kabul edip ona hem hocalık hem de babalık yapar. Ne yazık ki burada da birçok sıkıntı, zahmet ve fakirlik yakasını bırakmaz. Hocasının tek gözlü bir evi vardır ama onun talebesine yatması için vereceği bir yatağı bile yoktur. Köylüler kendi aralarında yün toplayıp yorgan yapılar. Gel zaman git zaman orada yıllarca kalır. On iki yaşında yirmiden sonrasına kadar hocasından ders alır. Köyde hocasıyla birlikte bir de medrese açıp hem okuyup hem de talebelere müderrislik yapar. Hem medrese hem de hocasının işlerini başarıyla yürütür. O artık hocasının eli

koludur olur. Hocası onu Ağrı'nın Hamur ilçesine bağlı Şoşik köyüne imam yapar ve oradan ona bir kız isteyip onu evlendirir. Bir süre Şoşik'te kalır ama eğitime devam etmek istediğinden Şoşik'ten ayrılma niyetindedir. Köylüler Mele Muhammed Şoşik'ten o kadar memnunlar ki onun gitmesine razı değildirler. Hocası ve Şoşik halkı hem imamlık yapması hem de çocukların ilmi eğitimlerinin devam etmesi için onu ikna ederler. Bu sefer o bu köyde bir medrese yapıp yıllarca talebelerin eğitim-öğretimini kendi yetiştirdiği seviyeye kadar verir. Eğitimi yarıda kaldığı için yazları şehre Müderris Molla Nadir Aziz'in yanına gidip kışları da evine gel. Bu şekilde üç yıl sonra icazetnamesini ondan alıp peşinde Şoşik köyündeki medresede onlarca yıl çok sayıda talebe ve imama dersler verir ve yüzlerce kişi ondan icazetname alır. (Şoşik, 2014: 848-851; Benek, 2015: 22-23; Şoşiki, 2015)

Aslen Siirtli olmasına rağmen yıllarca Şoşik'te kaldığı için Molla Muhammed Şoşiki olarak bilinir (Kızıl, 2018: 579). Molla Muhammed Şoşiki şu an doksan iki yaşında olup haliyen Bursa'da ikamet etmektedir. Yetmiş yaşından sonra başladığı yazarlığa halen devam etmektedir.

2.2.MOLLA MUHAMMED ŞOŞİKİ'NİN ESERLERİ

Mele Muhammed Şoşik Allah rızası için ömrünü okuma, ilim tahsili ve talebelere ders vermekle geçirmiştir. Yüzlerce talebe eğittikten sonra yetmişinde ilk eserini yazmaya başlar. Şu ana kadar birkaç kitap, şiir ve kaside yazmıştır. Şoşiki'nin "Nasihatname" adındaki Türkçe kitabı dışında diğer tüm eserlerini Kürtçe yazmıştır. Şimdiye kadar verdiği eserler aşağıdaki gibidir:

- 1.) Tefsira Qur'anê Nûra Qelban
- 2.) Nasihatname
- 3.) Xutbeyên Zelal ji bo Mislimanên Delal
- 4.) Çar Menar
- 5.) Pirewoka Heftper
- 6.) Çar Derya

Bu eserlerinden "Nûra Qelban", "Nasihatname", "Xutbeyên Zelal ji bo Mislimanên Delal" ve "Çar Derya" Nubihar yayınevi tarafından yayımlanmıştır. Tüm kitapları İslamiyet ve dini konular üzerindedir.

2.3. ‘NÛRA QELBAN’’ ADLI KUR’AN TEFSİRİ

Molla Muhammed Şoşikî 70 yaşında yazmaya başlayıp, 6 yıllık bir emeğin neticesinde ilk yapıtı olarak ‘*Nûra Qelban*’ adlı Kur’an tefsirini kaleme almıştır (Şoşikî, 2010: 4). Şoşiki bu eserini Arap harfleriyle 9 cilt olarak kaleme almıştır. Ancak Kürtçe okuyan kesimin büyük çoğunluğunun Arap alfabesi ile yazılmış eserleri okuyamamaktadırlar. Bunun yanında bilhassa Kürtler dinlerini kaynağından daha sağlam bir şekilde öğrensinler diye Nubihar yayınevi bu eşsiz eseri latizine ederek 6 ciltte toplamıştır. Latin harflere transkripsiyon ve basım işlemleri 4 yıl sürmüştür. İlk cildi 2010’da son cildi 2014 yılında yayınlanan eser yaklaşık 4300 sayfadır.

Cilt ve sayfa sayısından da anlaşılacağı üzere bu eser Kurmanci Kürtçesiyle şu ana kadar yayımlanmış en geniş ve büyük eserdir. Ayrıca bugüne kadar Türkiye’de Kürt diliyle yayımlanmış en hacimli ve geniş eser olduğu söylenebilir. Kalınlığına rağmen kadar dili çok basit ve sadedir. Kolay anlaşılır olmasının yanında kelime ve kavramların kullanımı bakımından da öne çıkmış, gayet başarılı bir eserdir. Bununla birlikte dini bir metin olmasına rağmen Şoşiki’nin hem eski hem de muassır sözcük ve kavramları ustaca kullanışı takdire şayandır. Dahası Kürtçe dil mantığı ve inceliklerini tefsirinin cümlelerinde rahatlıkla görmek mümkündür. En ilgi çekici yönlerinden biri de müellifin bütün ederde Kürtçenin ruhu ve mantığıyla ahenk içinde olan yeni kavramlar, kelimeler türetmiştir. Bir Kur’an tefsiri olmasından ötürü yoğun olarak Arapça kelime ve kavramlar kullanılmasına rağmen kelime ve kavramların birbiriyle ilişkisi, cümle yapısı ve sentaksı tamamen Kürtçedir. Tefsir incelendiğinde de anlaşılacağı üzere müellif eserde ağıdalı ve ağır bir üslup yerine açık, anlaşılır, doğal bir üslupla düşüncesini kaleme almıştır. Böyle bir beceri ve üslup Türkiye de Kürtçe yazan yazarlar arasında nadir görülen bir durumdur (Kızıl, 2016: 202).

Daha önce Arap harfleri kullanılarak üç tane Kürtçe tefsirin basım ve yayımı yapılmıştır (Özdaş, 2016: 351-353). Ancak Şoşiki’nin bu eseri, Latin alfabesiyle yazılmış ilk ve en kapsamlı Kürtçe tefsirdir. Bu durum çok dikkat çekicidir çünkü yüzlerce yıldır Kürt medreselerinde Kur’an ve İslam ilimleri dersleri verilmesine rağmen, Kürtçe meal ve tefsir eserleri son yıllarda çeşitli sebepler ile daha yeni yeni

yazılmaya başlanmıştır (Özdaş, 2016: 341-354). Tarihe bakıldığında Kürtlerin İslam'ı en önce din olarak kabul edip benimseyen ilk kavimlerden biri olduğu görülecektir. Hatta İslami kaynaklarda iki Kürt sahabeden ve onlardan nakledilen hadisten bahsedilir. Bu kıymetli kimseler Caban el-Kurdî (ya da Gavan) ve onun oğlu Meymun el- Kurdi'dir. Hadis kitaplarında onların naklettiği önemli bir hadis yer almaktadır (Çağlayan, 1996: 35). İlk Kürtçe dini yapıtları yazanlar medrese çıkışlı mollalar, müderrisler ve imamlar olduğu gibi şu ana kadar bilinen ilk Kürtçe edebi metinleri yazanlar da yine ilim ya da din adamı olan kimseler tarafından yazılmışlardır. Bu yüzden yazılı Kürt dili, edebiyatı, kültürü ve tarihi de İslam dini ve İslami ilimleriyle bir ilişkisi olduğu rahatlıkla söylenebilir. Yüzlerce yıldır Kürtlerin tarih, coğrafya, dil, edebiyat, örf, adet ve görenekleri o kadar İslam dini ve kültürüyle o kadar iç içe geçmiştir ki Kur'an'ın mesajlarının daha iyi anlaşılması bu milletin tekrar kendi kökleri üzerinde yeşermesi, güçlenmesi zenginleşmesi ve şaha kalkması için motor görevi görecektir.

Bu yüzden Nûra Qelban tefsiri bu alandaki önemli bir boşluğu doldurmaktadır. Zaten Seyda Şoşik'in tefsiri yazmasındaki amacı tam da budur. Kürtçe dini kitapların yetersizliği ve Kürtlerin dini alandaki bilgisizlik ve cehaleti onun Kürtçe tefsir yazmasına sebep olmuştur (Şoşikî, 2010: 10). Ona göre Kürtlerin iman anlayışı takliddir, bildiklerinin ya da konuştuklarının yarısı yanlışır ya da hurafedir. Onun için Kürtler kendi dilleriyle okumalı ve dinlerini kaynağından yani Kur'an'dan almalı ki bugün olduğu gibi Kur'an'ı herkes kendine göre yorumlamasın. Aksine Müslümanlar kendilerini Kur'an'a tabi tutmalı ve tanzim etmelidir (Benek, 2015: 24; Şoşikî, 2015).

Bununla birlikte Molla Şoşiki'nin Botan yöresinde doğması, 50 yıla yakın Serhat bölgesinde kalması ve tüm yaşamını okuma öğrenme, ilim, eğitim ve müderrislik yapmakla geçirmesi onun dini, fikri ve düşünce yaşamı üzerinde büyük etkileri olmuştur. Ayrıca tüm bunlar anadil becerilerinin zenginleşip kuvvetlenmesinde de kendisini göstermiştir. Özellikle Nûra Qelban adlı bu Kuran tefsirinde bunları rahatlıkla görmektedir. Zira Şoşiki tefsirde çok akıcı, duru ve güzel bir Kürtçe kullanmıştır. Kürtçe deyim ve atasözleri kullanımında, kelime türetme ve karmaşık cümle yapıları kullanmada oldukça başarılıdır. Bunların dışında 'tefsir

Kürtçe kaynaklar açısından da çok zengindir. İçerisinde hem klasik hem de sözlü edebiyat ve kültürden çok fazla örnekler barındırır. Ayrıca eserde Kur'an'ın Kürtçe meali, bazı hadis ve Arapça tefsir kitaplarından yaptığı alıntılarının tercümesi de vardır. Bu sebepten tefsir içerisinde akademik çalışmalar için kullanılabilecek çok çeşitli konu ve örnekler bulunabilir (Kızıl, 2018: 596).



ÜÇÜNCÜ BÖLÜM

ERGATİF YAPISININ ‘‘NÛRA QELBAN’’ ADLI KUR’AN TEFSİRİNDE KULLANIMI (BAKARA SURESİ ÖRNEĞİ)

Kurmanci Kùrtçesindeki ergatif yapısının yazılı bir metinde kullanımı ve etkililiğini tespit etmek amacıyla ‘‘Nûra Qelban’’ adlı Kur’an tefsirini seçtik. Bu eser Latin alfabesi kullanılarak Kurmanci Kùrtçesiyle yayımlanmış ilk ve en kapsamlı tefsirdir. Bunun yanında eser yaklaşık 4300 sayfadan oluştuğu için de şu ana kadar Tükiye’de basımı yapılmış en hacimli Kùrtçe eserdir. Ayrıca eser gayet açık, anlaşılır, sade ve akıcı olmakla birlikte Kùrtçe dil mantığı ve inceliklerini ustaca yansıtmaktadır. Cümle yapısı, kelime seçimi ve dil yapılarının birbiriyle ahenkli kullanımı eseri öne çıkaran özelliklerinden sadece birkaçıdır. Bu yüzden böyle önemli bir eserin Kùrt dili, edebiyatı ve kültürü alanında araştırma ve inceleme yapanlara tanıtılması için de onu çalışmamıza konu edindik. Ancak tefsirin tümü burada ele alınmamış olup çalışma konusunu detaylı işleyebilmek için sadece Kur’an’daki en uzun sureyi seçtik. Zira yazarın anlatım biçimi ve kullandığı dil eserin başından sonuna kadar aynı olduğu için Bakara Suresi ile kendimizi sınırlandırdık.

Bu bölümde, Kurmanci Kùrtçesinin ergatif yapısının yazılı dildeki kullanımı ve işe yararlılığını tespit etmek ve bu yapının genel özellikleri, kural ve kaideleri ve bazı istisnai durumlarını inceleyip ortaya çıkarmak amacıyla bu tefsirden konuyla ilgili örnekler çıkardık. Sonra bu örnekleri Kurmanci Kùrtçesinin ergatif yapısının doğru kullanımı, hatalı kullanımı ve kuraldışı kullanımı olmak üzere üç başlık altında sınıflandırılıp hepsinin tek tek analizi, yorumu ve değerlendirilmesini yapıp konunun bir nebze de olsa aydınlatılması için uğraştık.

3.1.ERGATİF YAPISININ DOĞRU KULLANIMI ÖRNEKLERİ

Molla Muhammed Şoşîki'nin "Nûra Qelban" adlı Kur'an tefsirinin Bakara suresi bölümünde ergatif yapısını ustalıkla kullandığını tespit ettik. Eserde ergatif yapısının doğru kullanımını ile ilgili binlerce örnek yer almaktadır. Biz mezkur bölümdeki tüm örnekleri çalışmamıza dâhil etmenin mümkün ve doğru olmayacağı düşüncesinden hareketle sadece konuyu en iyi açıklayacağını düşündüğümüz örnekleri çalışmamıza dâhil ettik.

Bu yazılı metinden ergatif yapısının doğru kullanımını gösteren bir ya da birden fazla cümleden oluşan bir örnek verildikten sonra onun tahlil ve yorum ve değerlendirmesini yaptığımız çalışma aşağıdaki gibidir.

1. "Vêca Xwedê li beşeriyetê hate rehmê, **ev** ayeta ha ji Hebîbê xwe re **nazil kir** û wî jî **ew** hînî me **kir**" (Şoşîkî, 2014: 19).

Di vê minakêde du lêkerên gerhuhêz hene: "nazilkirin" û "hînî...kirin". Her wekî ku diyar e ew di raweya dema borî de hatine kesandin. Lewma divê hêmanên hevokê yên sereke li gorî rê û rêzikên ergatîviyê teşe bigrin. Yanî divê kirde di rewşa tewandî, lê bireser di ya xwerû de bin û lêker jî li gorî bireserê werin kesandin. Niha em hevokên xwe li gorî vê rêgezê binirxînin û şîrove bikin:

Biresera hevoka yekemîn (**ev** ayeta ha) ji ber ku ji ravekekê pêk tê, ne xwerû ye yanî bi qertafa "a"yê mêjera xwe diyar kiriye. Edî em dizanin ku bireser yekjimar e. Lewma lêker jî yekjimar hatiye kesandin. Herwiha kirdeya hevoka duyemîn (wî) tewandî ye û mêjer û zayenda wê diyar e. Lêbelê ji ber ergatîvî bireser (**ew**) di rewşa xwerû de ye yanî zayend û mêjera wê ne diyar e. Lewma ji bo ragihandina mêjera bireserê lêker ketiye bin bandora hêmana xwerû yanî bireserê û yekjimar hatiye kesandin. Lêker bi vî awayî mêjera bireserê ragihandiye.

2. “Elî (r) jê re got: Gelo *Xwedê Teala* **tu** ji bo tişta ku *wî* jê hez kiriye yan jî ji bo tişta ku *te* jê hez kiribe xuliqandiyî? *Wî* gotê: Ji bo tişta ku *wî* jê hez kiribe, **ez** xuliqandime? Elî (r)jê re got: De ka ji min re bibêje, *Xwedê teala* wekî ku *wî* hez kiriye yan jî wekî ku *te* hez kiribe, **tu** xuliqandiyî? *Wî* got: Na, wekî ku *wî* hez kiriye **ez** xuliqandime” (Şoşikî, 2014: 36).

Ev nimûne ji çar hevokan pêk tê, lê mîna hev in. Ji bo hêskirana têgihîştinê em ê bi du hevokên binî xêzkirî dest bi şîrovekirina xwe bikin:

- a) *Xwedê teala* (**wî**) **ez** xuliqandime
- b) *Xwedê teala*(**wî**) **tu** xuliqandiyî

Her wekî tu dîyar e, lêkera “xuliqandin” gerguhêz e û qertafa kesane ya kesê yekem ê yekjimar yanî “-im/me”ûya kesê duyem ê yekjimar yanî “-î/yî” girtiye. Çimkî lêker di hevokê de ji bilî “rawe” û “dem”ê ew li gorî “kes”ê jî tê kişandin. Lewma lêker ev qertaf girtine. Lêbelê gelek balkêş e ku ev qertafên kesane bi kirdeyê re li hev nakin. Çimkî kirde (*Xwedê Teala*) kesê **sêyem** ê yekjimar e. Ev yek jî tê wê maneyê ku lêker li gorî kirdeyê nehatine kesandin yanî ti bandora kirdeyan li ser lêkeran tune ye. Lêbelê berevajî vê yekê, lêker li gorî bireserê teşe girtine ango bi qertafa kesane ya bireserê hatine nimandin. Çimkî qertafa kesane ya cînavka “ez”ê “-im”û ya “tu”yê “-î”ye. Piştî peyitandina vê peywendiya di navbera bireser û lêkerê em têdighêjin ku di zimanê kurmancî de gava lêkerên gerguhêz di demên borî de tên kişandin ew dikevin bin bandora bireserê û bi qertafa kesane ya wê an jî li gorî yekjimarî û pirjimariya bireserê tên kesandin. Di zanista zimannasiyê de ji vê bûyera rêzimanî re “ergatîvî” tê gotin û ji xwe mijara lêkolina me jî ew bi xwe ye.

3. “Bi devê xwe doza îmanê dikirin, *wan* bi qelbê xwe jî **kufir** diheband, vêca *Resûlullah* (s) **ew** nekuştin, lewra heke **ew** bikuştana zirar dê bigiştê Îslamê, xelqê bigotaya; haho gidî, Muhemmed hevalên xwe dikuje!” (Şoşikî, 2014: 39).

Ji bo têgihîştineke hêsanîr çêtir e ku em bi hevoka yekemin dest bi ravekirina xwe bikin.

Hevoka “*Bi devê xwe doza îmanê dikirin*” xwedî kirdeya veşartî ye. Lêker jî pirjimar hatiye kesandin. Çimkî em kirdeyê yanî “kesê/kesên ku doza îmanê

dikir/dikirin” bi alikariya qertafa ‘-in’ a ku hatiye dawîya lêkera hevokê nas dîkin. Yanî kirde kesê sêyem ê pirjimar yanî ‘wan’ e; lêbelê di hevokê de nehatiye gotin. Lewma peywendiyek di navbera kirde û lêkerê de çêbûye û lêker li gorî kirdeya hevokê hatiye kişandin. Digel ku lêker gerguhez e û di dema borî de ye jî ergatîvê pêk nehatiye. Nebikaranîna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar dibe sedem ku lêker ji dêlva bireserê bi kirdeyê re li hev bike da ku kirde nasnameya xwe diyar bike. Ji lewre rêzika ergatîvê ji holê radibe.

Hevoka duyem ‘wan bi qelbê xwe jî **kufir** diheband’ li gorî qaîdeyên tevna ergatîvê sazûnîye. Digel pirjimariya kirdeyê, lêker ne pirjimar lêbelê li gorî bireserê yekjimar hatiye kesandin ku ev jî terciheke di cih de ye.

Lê di mînakê ‘vêca Resûlullah (s) ew nekuştin, lewra heke ew bikuştana zirar dê bigiştana Îslamê, xelqê bigotaya; haho gidî, Muhemmed hevalên xwe dikuje!’ de avahiya ergatîvê serdar e û rast hatiye bikaranîn. Çimkî lêker ne bi kirdeya yekjimar (Resûlullah) lê bi biresera pirjimar (ew-yanî munafîqan) re li hev kiriye. Lewma lêker pirjimar hatiye bikaranîn da ku pirjimariya bireserê ragihîne.

4. ‘Di piştî van sîfetên wan yê xebîs de, Xwedê teala bi şanîdana dûriyê ew îşaret kirine’ (Şoşîkî, 2014: 43).

Digel ku kirdeya hevokê (Xwedê Teala) yekjimar e jî pêveber (îşaret kirine) pirjimar hatiye kesandin. Lewra li gorî avahiya ergatîviyê bireser û pêveber li hev dîkin. Ji xwe li vir jî pêveber ne li gorî kirdeyê lêbelê li gorî bireserê hatiye kişandin. Bi vî awayî bireser mêjera xwe jî bi rêya lêkerê nîşan dide. Bi gotineke din em ji qertafa kesane (-in) ya ku pêveber pê hatiye kesandin fehm dîkin ku bireser yanî cînavka ‘-ew’ pirjimar e ne kesê sêyem ê yekjimar e.

5. ‘Xwedê teala di bara munafîqan de **du heb meseleyên mûcîzewî** zikir kirine’ (Şoşîkî, 2014: 44).

Dîsa kirde (Xwedê teala) yekjimar e, lê bireser (**du heb meseleyên mûcîzewî**) ji ravekê pêk tê û mêjera wê pirjimar e. Herwiha pêveber jî mîna bireserê pirjimar e. Yanî hevoka me ne akuzatîv e, lêbelê xwedî tevna ergatîv e. Yanî hevahengiyek di

navbera bireser û lêkerê de heye. Çimkî lêker (zikir kirine) ketiye bin bandora bireserê û ew jî wekî bireserê pirjimar bûye da ku mêjera bireserê ragihîne.

6. ‘‘Lêbelê *wan* di qelbê xwe de **kufra fesadiyê** vedişart’’ (Şoşikî, 2014: 44).

Kirdeya hevokê (*wan*) pirjimar e, lê bireser (**kufra fesadiyê**) kesê sêyem ê yekjimar e. Ji ber ergatîvê kirde tewandî ye bireser jî xwerû ye. Lêker (vedişart) jî yekjimar hatiye kesandin. Ev jî tê wê wateyê ku lêker li gorî zagona ergatîviyê bi bireserê ve li hev kiriye û lewma jî mejera lêkerê ne wekî kirdeyê pirjimar lêbelê yekjimar hatiye bikaranîn.

7. ‘‘Vêca dema *agir* pêket û zemanekî kin ronahî da hawîrdora wan ji nişka ve *Xwedê teala agirê wan vetemirand*, ji binî ve **ronahiya wan bir** û ew di sê zulmet û tarîtiyan de hiştin. Zulmeta şevê, zulmeta ewrê tarî, zulmeta vetemirandinê’’ (Şoşikî, 2014: 44).

Di vê mînakê de kirde (*Xwedê Teala*) hevpar e yanî kesê ku *agirê wan* vetemirandiye, ronahiya wan biriye û ew di sê zulmet û tarîtiyan de hiştine heman kes e, yanî *Xwedê Teala (Wî)* ye. Ji lewre ne hewce ye ku sê car were dubarekirin. Ji ber tevna ergatîvê lêkerên *vetemirandin* û *birin* li gor bireserên xwe yên yekjimar hatine kesandin û mêjera wan jî şîbiye biresera wan.

Lêbelê mêjera lêkera *hiştinê* pirjimar e û ew li kirdeya yekjimar nake. Sedema wê jî diyerdeya ergatîviyê ye. Lewra pêveber li gorî hêmana xwerû yanî biresera kesê sêyem ê pirjimar (ew) hatiye kesandin. Herwiha em bireserê mêjera xwe bi qertafa kesane (-in) a ku hatiye pêveberê diyar kiriye.

8. ‘‘Yanî îbadet ji wî xwedayê xwe re bikin; ewê ku **hûn û yên pêşiya we xuliqandine**, umîd û hêvî heye ku hûn xwe ji şîrk û îsyanê biparêzin’’ (Şoşikî, 2014: 48).

Li gorî Tan ‘‘...ewê ku **hûn û yên pêşiya we xuliqandine**’’ ‘‘hevokeke navberî’’ ye yanî gava ew ji hevoka sereke were avêtin jî ramana hevokê ya bingehin tê fehm kirin (Tan, 2011: 311). Li vir kirde Xaliqê alê mî ye ango kesê ku ‘‘**hûn û yên pêşiya we xuliqandine**’’ Xwedê ye. Lewra kirde kesê sêyem ê yekjimar e.

Lêbelê pêvebera hevokê yanî “xuliqandine” pirjimar e û ji aliyê mêjerê ve bi kirdeyê re li hev nake. Sedema vê yekê ergatîvî bi xwe ye. Çimkî li gorî avahiya ergatîvê pêveber dikeve bin banbora bireserê. Di vê nîşeyê de jî ergatîvî serdar e. Lewre ji ber ku ber mêjera bireserê pirjimar e pêveber jî pirjimar hatiye kesandin. Bi saya vê yekê yekjimarî û pirjimariya bireserê diyar bûye.

9. “Ji Rebbe xwe re îbadetê bikin. Lewra *wîhûn û bav û bapîrên we xuliqandine*, di ser we re jî *asîman* wek kumbetê *kiriye* bînayeke mezin, di binê we de jî *erd* *kiriye* hemmal û balhilgira we ku *hûn* hildane piştî xwe, jixwe ev yek li ber çavan e” (Şoşîkî, 2014: 49).

Kirdeya vê hevokê cînavka tewandî “*wî*” (yanî Xwedê) ye û ji aliyê mêjerê ve jî yekjimar e. Bireser xwerû û pirjimar e. Lê pêveber (*xuliqandine*) wekî ku diyar e pirjimar e. Bi gotineke din lihevkiyê di navbera kirdeya yekjimar û pêvebera pirjimar de çênebûye. Vêca ji ber rêzika ergatîvê pêveber ji dêlva kirdeyê ketiye bin bandora bireserê û ji aliyê mêjerê ve bi biresera xwe re hevahengiyek saz kiriye.

Her wiha ji ber ku kirde eynî ye di “*komekên/clause*” (Tan, 2011: 316) din de kirde nehatiye dubarekirin. Dîsa li vir avahiya ergatîviyê derketiye hole û lewma kirde tewandî lê bireser (*asîman û erd*) jî xwerû ne. Pêveberên her du komekan jî bêjeya “*kiriye*” ye û mêjera wan yekjimar e û li gorî bireserê yekjimar hatiye kişandin û kesandin. Di komeka dawîn de (*hûn* hildane piştî xwe) heman cînavk a kesê sêyem ê yekjimar (*wî*) wekî kirde û “*hûn*” jî wekî bireser hatiye bikaranîn. Kirde tewandî û yekjimar e. Lê bireser xwerû û pirjimar e. Her wiha em dibînin ku lêkera “*hildane*” bi qertafa kesane ya “*-ne*”yê pirjimar hatiye kesandin. Ev jî tê wê wateyê ku lêker bi kirdeyê re li hev nake. Ango li gorî kirdeya yekjimar nehatiye kesandin û ti bandora wê jî li ser lêkerê tune ye. Vêca em têdigihêjin ku biresera pirjimar bandorê li ser lêkerê kiriye û bireserê pirjimariya xwe bi rêya lêkerê diyar kiriye. Sedama vê yekê jî avahiya ergatîv e û li vir rast û durist hatiye bikaranîn.

10. “Di ser we re *ewrên bi baran* çêkirine” (Şoşîkî, 2014: 49).

Di vê hevokê de kirde bi eşkerayî nehatiye destnîşankirin yanî veşartî ye. Em bi hîzreke mentiqî têdigihêjin ku kirde “Xwedê” yanî kesê sêyem ê yekjimar e û

tewandî ye. Lêbelê pêveber pirjimar e û ji aliyê mêjerê ve bi kirdeya yekjimar re li hev nake. Çimkî kirde û pêveber ji aliyê mêjerê ve ji hev cuda ne. Vêca li gor rêzika ergatîvê pêveber ketiye bin bandora bireserê û lewma pirjimar hatiye kesandin. Ev hevok bi awayekî rast û durist li gor avahiya ergatîvê hatiye saz kirin.

11. ‘‘Qur’anê mirov li sê beşan teqşîm kirin; mutteqiyên muwehid, munkerên munaîd, munafiqên durû’’ (Şoşikî, 2014: 50).

Kirdeya vê hevokê peyva ‘‘Qur’anê’’ ye. Jê pê ve kirde di *rewşa tewandî* (casus obliquus) de ye û yekjimar e. Lêbelê bireser (**mîrov**) di *rewşa xwerû* (casus rectus) de ye û lewma bi vî halî mêjera wê bi serê xwe naye fehm kirin. Lewre mêjera bireserê di avahiya ergatîv de pêveberê tê ragihandin. Kirde û bireser di rewşên dijber de ne. Ji xwe sedema bikaranîna avahiya ergatîviyê bi xwe jî jihev cudakirina kirde û bireserê ye. Bi gotineke din bi rêya avahiya ergatîvê kirde tê tewandin û bireser xwerû dimîne û mêjera xwe bi alikariya pêveberê diyar dike. Bi vî awayî kirde û bireser di demên borî yên xwedî lêkerên gerguhêz de ji hev tîndarîkirin û nasîn. Pênaseya ergatîv jî ev bi xwe ye û di kurmancî de jî ji bo vî erkê û peyvirê tê bikaranîn. Hevoka jorîn jî mînakeke baş a vê rewşê ye.

Herwiha dema em bala xwe didin pêvebera mînaka jorîn em dibînin ku pêveber pirjimar e. Sedema vê yekê jî avahiya ergatîv e. Yanî pêveber li gor kirdeya yekjimar nehatiye kişandin lêbelê ketiye bin bandora bireserê. Ji ber ku bireser di *rewşa ergatîv* de xwerû ye ango naye tewandin ew nikare qertafa pirjimariyê bigre. Vêca bireser li pêveberê tesîr dike û pirjimariya xwe bi rêya pêveberê diyar dike. Em dikarin pirjimarbûna bireserê bi pêkanîna guhertinek di dema vê hevokê de wiha îsbat bikin: Qur’an **mîrovan** li sê beşan teqşîm dike.

Belê, gava em hevokê di dema niha de ji nû ve saz dikin em bi awayeke zelaltir û hêsantir dibînin ku peyva ‘‘ **mîrovan**’’ qertafa ‘‘**-an**’’ê girtiye û pirjimar bûye. Ji ber ku di dema niha de bireser li gor rêzika akuzatîviyê tê tewandin, pêveber dikeve bin bandora kirdeyê ji lewre mêjera pêveberê yekjimar tê kişandin. Bi awayeke din em dikarin *rewşa kirde* û bireserê û mêjera pêveber wiha formulîze bikin: ‘‘**Di kurmancî de lêker paşqertafên wê peyvê, ya ku netewandî dimîne,**

digirin. Ferq nake ev peyv kirde (subjekt) yan jî bireser (objekt) be'' (Muhammed, 2002: 22).

12. ''Bi rastî *me* **horî** nipînû aferandîne. *Me* **horî** kirine keçik'' (Şoşikî, 2014: 54).

Herdu hevokên hanê li gorî rêzika ergatîvîyê rast û durist hatine saz kirin. Kirdeya herdû hevokan cînavka kesane ya tewandî ''*me*'' û bireser jî ''*horî*'' ye. Wekî ku diyar e kirde tewandî û bireser jî xwerû ye û bi vî awayî ew di hevokê de ji hev tîr cûdakirin û ji alîyê xwînêran bi hêsanî dikarin bîr ferq bikin û nasî. Ji hêmanên hevokê ''*aferandîne* û *kirine*'' jî pêveber in. Mêjera wan pirjimar e. Bireser di bi rêya qertafa kesane ango bi ''*paşkoka*'' (Kurdo, 1981) pirjimariyê ya ku hatiye dawîya pêveberan mêjera xwe diyar kiriye. Lewma lihevhatinek di navbera bireser û pêveberê de çê bûye û pêveber li gor bireserê hatiye kişandin û kesandin.

13. ''Êdî *Xwedê Teala* **demxeya xusranê** li ser wan xist, **ew** teşhîr kirin li dinyayê rezîl û riswa kirin, li axretê jî di binê xezeba *Xwedê teala* de dê bi ezabê elîm bîr ezabdayîn û reben û zelîl bibin'' (Şoşikî, 2014).

Pêvebera hevoka pêşîn - ''demxa lê xistin'' - lêkerê hevedûdanî ya bidaçek e. Lêkerên gerguhêz yê bi vî rengî digel ku di demên borî de kirdeyên wan tîr tewandin jî ew bi serê xwe hereket dike yanî ne li gorî kirdeyê ne jî li gorî bireserê tê kişandin û kesandin. Ev yek ji rewşên awarte yê ergatîva kurmancî ye. Hin lêkerên bidaçek di demên borî de nakevin bin bandora kirde û bireserê lêbelê her tim li gor kesê sêyem ê yekjimar tîr kesandin. Lewma di vî mînaka jorîn de jî heman rewş tê dîtin. Lêbelê hevoka duyem li gor rêzika ergatîvê tevgeriyaye. Kirde (*Xwedê/wî*) tewandî û bireser (*ew*) xwerû ye. Mêjera kirdeyê yekjimar e, lê ya bireser û pêveber pirjimar e. Wekî rêgez di kurmancî de lêker bi qertafa kesane ya hêmana hevokê ya xwerû tê kesandin. Ji lewre pêveber bi bireserê re li hev kiriye û pirjimariya bireserê bi qertafa ''-in''ê daye der.

14. ''Hal ev e ku hûn berê mirî bûn, *wî* bi nîmeta wicûd û çêtirîn sebebên heyatê yê wekî 'eqî û hestpêkerên zahirî û batinî **hûn** sax kirin, **ew** bexşî we kirin û bi arîkariya rizqê xwe **hûn** xwedî kirin, heta dewra ecelê we hat, paşê **hûn** mirandin,

paşê dîsa bi şandina ji gorê dê we sax bike, paşê hûnê ji bo hesab û xelat yan jî celata xêr û neqenciyan xwe lê bizîvirin” (Şoşikî, 2014: 59).

Ji bo hêskirina têgihîştinê dê çetir bibe ku em hevokên gerguhêz ên di demên borî de bineqînin, li jêr ji nuh ve binivîsîn û pişt re wan şîrove bikin. Ji bo vê armancê em ê tenê hêmanên sereke yên hevokan binivîsîn:

- **Wî hûn sax kirin**
- **(Wî) ew bexşî we kirin**
- **(Wî) hûn xwedî kirin**
- **(Wî) paşê hûn mirandin.**

Kirdeya hemû hevokan kesê sêyem ê yekjimar *wî* ye û ji vê cînavkê mabest Xwedê ye. Ev kirde ji bo hemû hevokên din jî hevpar e, lewma jî nehatiye dubarekirin. Wekî ku diyar e kirde tewandî (*wî*) lê bireser xwerû ne. Mêjera bireseran (**hûn**) û pêveberan (sax **kirin**, bexşî we **kirin**, xwedî **kirin**, mirandin) pirjimar in. Em dibînin ku kirde û pêveber li hev nakin. Pêveber ne bi paşqertafa kesane ya kirdeyê lêbelê bi ya bireserê re hatine kesandin. Bi gotineke din pêveber ne li gorî kirdeyê, lê li gorî bireserê hatine kesandin. Bireser bandorê li pêveberê kiriye û mêjara pêveberan wek a xwe kiriye pirjimar. Ev yek jî ji xwe ergatîvî bi xwe ye. Yanî kirde tewandî bireser xwerû dimîne û lêker dikeve bin bandora bireserê û bi qertafa kesene ya bireserê tê kesandin.

15. “Lewre Xwedê teala **ew** li ser erdê **kiriye xelîfe û şûngir** da ku di neqeba mirovan de fermana Xwedê Teala tetbîq bike” (Şoşikî, 2014: 63).

Kirdeya vê hevokê dîsa “Xwedê Teala” ye. Bireser jî kesê sêyem ê yekjimar “ew” e ku jê mebest Adem (a.s) e. Em vê yekê ji Qur’anê fehm dikin ku Xwedê wekî mirovê yekemîn Adem afirandiye û ji xwe re li dinyayê kiriye xelîfe (Amedî, 2014: 20). Pêveber (kiriye xelîfe û şûngir) jî li gor bireserê hatiye kişandin. Ji lewre bireser mêjera xwe daye pêveberê û bi vî awayî tevna ergatîviyê derketiye holê.

16. “Êdî ji bo rehmetê *Xwedê Teala* **pêxember** wek mizgînber û hişyarker **şandine**” (Şoşîkî, 2014: 63).

Dema em li mêjera kirde û pêveberê dinihêrin em dibînin ku ew li hev nakin. Çimkî kirde (*Xwedê Teala*) yekjimar e û pêveber (**şandine**) jî pirjimar e. Ev yek jî tê wê wateyê ku pêveber li gorî kirdeyê nehatiye kişandin û ti bandora wê li ser pêveberê tune. Wê çaxê avahiya ergatîvê dibe sedema vê yekê ku pêveber ji dêleva kirdeyê bi bireserê re li hev bike. Bêjeya “**pêxember**” biresera hevokê ye û ji ber ku bireser di avahiya ergatîvê de her tim xwerû ye, mêjer û zayenda wê ne kifş e. Pirjimarbûna bireserê ji paşqertafa kesane “-in”ê ya ku hatiye dawîya pêveberê diyar dibe. Yanî di avahiya ergatîvê de mêjera biresera xwerû ji nîşandeka ku tê dawîya pêveberê tê fehm kirin.

17. “*Temamê melaîketan* secde bir ji xeyrî îblîs, ew ji secde men bû, wî xwe mezin û kubar **kir** û got: Ezê çawa jê re secde bibim?! Hal ev e ku ez ji wî çêtir im. Lewra *te ew* ji axê/heriyê çêkiriye û *tee z* ji êgir çêkirime” (Şoşîkî, 2014: 64)

Bi mebesta ku ergatîviya vê nimûneyê baştir were dîtin, em hevokên gerguhêz li vir ji nuh ve rêz bikin:

- *Temamê melaîketan* secde **bir** ji xeyrî îblîs
- Wî xwe mezin û kubar **kir**
- *Te ew* ji axê/heriyê çêkiriye
- *Te ez* ji êgir çêkirime

Her wekî ku diyar e kirdeya van her çar hevokên gerguhêz jî di rewşa tewandî de ne. Ti bandora hêmana tewandî yanî kirdeyan li ser pêveberan tune. Pêveber li gorî bireserê hatine kesandin û her yek ji wan qertafa kesane ya biresera xwe girtiye û mêjera wê ragihandiye.

18. “Hem jî *Xwedê teala* bi şêweyeke zelal û sade gotiye: “*Me, bi rastî zaroyên Adem kirine xwediyê rûmetê. Îsra 70*” (Şoşîkî, 2014: 64).

Ji ber ku kirde “*Xwedê Teala*” ye û wî li vir tenê tiştek gotiye, pêveber li gorî bireserê yekjimar hatiye kişandin û kesandin. Ji xwe hevoka veguhastî di peywira

biresera lêkera “gotin”ê de hatiye bikaranîn û kirdeya wê, cînavka tewandî ya kesê duyem ê pirjimar e. Herwiha mêjera bireserê jî pirjimar e. Ji ber ku pêveber di rewşa ergatîv de dikeve bin bandora bireserê ew jî pirjimar hatiye bikaranîn.

19. “Dema *Xwedê Teala Adem* li ser erdê **xuliqand** li dûv wê negot; min **ew bilind kir, bir** asîmanan” (Şoşikî, 2014: 66).

Kirde (*Xwedê*) yekjimar e û ji bo hemû hevokan hevpar e dubarekirina wê ne hewce ye. Herwiha li gorî avahiya ergatîvê kirdetewandî lê bireser jî (**Adem, ew**) xwerû ne. Lewma jî pêveber bi biresera yekjimar re li hev kiriye û mêjera wê yekjimar hatiye kişandin ku ev jî rast û asayî ye.

20. “Şeytên bi sebep xwarina wan ya ji wê darê **ew herdu** şemitandin. Yan jî maneya ayetê wiha ye: **ew herdu** şemitandin, ji cennetê derxistin. Yanî şeytên bi derew ji wan re **sond xwar**; ez ji we re nesîhetkar im, ji darê bixwin(Şoşikî,2014:67).

Ergatîvî di vê mînakê de jî baş tê dîtin. Kirdeya hevokê (*şeytên*) yekjimar e û forma wê ya tewandî hatiye bikaranîn. Ji aliyê din bireser (**herdu**) xwerû ye û pirjimar e. Pêveber (**şemitandin, deranîn, derxistin**) jî pirjimar in. Lewma li vir ji aliyê mêjerê ve ti peywendiya kirde û pêveberê bi hev re tune ye. Li gor rêzikên ergatîvê kirde û bireser di rewşa asayî de ne. Lewma bireser pêveber xistine bin bandora xwe û ji aliyê mêjerê ve bi bireserê re lihevhatinek çêbûye.

21. “Lewra *Xwedê têala* gelek caran **nîmetên ku bexşî wan kirine** di bîra wan tîne û gelek caran jî tesdîqa pêxembertiya Muhemmed (s) di bîra wan dixe “ (Şoşikî, 2014: 69).

Ji ber ku pêveberê hevoka sereke (bîra wan tîne) di dema niha de ye avahiya akuzatîv li kar e. Lewma ew li gorî kirdeyê hatiye kişandin û kesandin. Lêbelê di hevoka relatîv yanî “hevoka *hevdudanî ya bi cînavka girêkî*”(Tan, 2011: 331) de ergatîvî serdar e. Dema em pîrsa “Xwedê Teala çi di bîra wan tîne?” dikin, em bersiva “nîmetên ku bexşî wan kirine” distînin ku ev dibe biresera hevokê. *Kesê nîmet* bexşî wan kirine heman biker yanî Xwedê Teala ye. Li vir kirde (*Xwedê*) yekjimar lê bireser pijimar e. Bireser û lêker ketine nav ahengiyeke ku di encamê de lêker li gorî bireserê hatiye kişandin. Herwiha, lêker pirjimar hatiye bikaranîn da ku

pirjimariya nîmetan bê fehmkirin. Bi vî awayî ergatîvî di vê mînakê de bi şarezayî hatiye bikaranîn.

22. ‘*Min hûn* di ser xelk û alemên dîgerên we yên di serdema we re girtibûn; *min* ji navbera we **pêxember** şandine û **hukimdar û milûk** rakirine’ (Şoşîkî, 2014: 73).

Bêjeya ‘*min*’ cînavkeke kesane ya tewandî ye û jê mebest Xwedê ye. Ev cînavk wekî kirdeya her sê hevokan hatiye bikaranîn. Lêbelê mêjera pêveberan pirjimar e. Biresera hevoka yekemîn ‘*hûn*’ e û ew cînavkeke kesane ya xwerû ye û pirjimar e. Bireserên hevokên din jî peyvên ‘*pêxember, hakimdar û milûk*’ in û ew jî xwerû ne û pirjimar in. Yanî kirde yekjimar û tewandî, lêbelê bireser pirjimar û xwerû ne. Ev rewşa kirde û bireseran di hevokê de bi kêrî jihevçûdakina wan tê û avahiya ergatîvê derdixe holê. Wekî rêgez di kurmancî de pêveber her car li gorî cînavka xwerû tê kesandin. Cînavkên xwerû di vê mînakê jorîn de wekî bireser hatine bikaranîn û yên tewandî jî wekî kirde. Lewma hevahengiyek di navbera pêveber û bireseran de çêbûye lê lihevhatinek di navbera kirde û pêveberan de çênebûye. Bi gotîneke din ji ber avahiya ergatîvê pêveber ketine bin bandora bireseran û li gorî wan hatine kişandin û kesandin. Bireser bûne sedem ku mêjera pêveberan pirjimar werin kesandin da ku mejera bireseran diyar bibe.

23. ‘*Fîrewn ew* kiribûn celeb celeb, **hinek ji wan** dabûn ber lêkirina xaniyan, **hinek ji wan jî dabûn** ber karên zîraet û cotkariyê û yên din jî herwiha ne’ (Şoşîkî, 2014: 76)

Her wekî ku diyar e *Fîrewn* yanî kirde yekjimar e. Lêbelê mêjera pêveber (kiribûn, dabûn) û bireser (**ew, hinek ji wan**) pirjimar in. Lewma em dikarin bibêjin ku ti bandora kirdeyê li ser pêveberan tune ye û ji ber rêgezên ergatîviyê lihevkirina bireser û pêveberê çêbûye. Ji xwe di kurmancî de pêveber li gorî hemana xwerû (li vir bireser e) tê kesandin û qertafa kesane ya wê digre. Bi vî awayî yekjimarî û pirjimariya bireserê bi rêya pêveberê diyar dibe. Mesela; ji mêjera pêveberê fehm dikin kû bireser pirjimar e yanî cînavka ‘*ew*’ a ku cînavka xwerû kesê sêyem e pirjimar e.

24. “Vêca ji peyrewên Mûsa gelean *ev yek qebûl kir*” (Şoşîkî, 2014: 77). Hevok di dema boriya têdeyî de bi lêkereke gerguhêz hatiye sazîkirin. Lewma li gorî rêzîkên ergatîvî kirde bireser û pêveber rola xwe lîstîye. Kirde di rewşa tewandî û bireser xwerû ye. Kirde pirjimar e, lê bireser û pêveber yekjimar hatine kesandin. Yanî kirde bi ti awayî bandorê li pêveberê nekiriye. Ji dêleva kirdeyê bireser pêveber xistiye bin bandora xwe û mêjera xwe bi rêya pêveberê diyar kiriye. Ev yek bûye sedem ku pêveber mîna bireserê yekjimar were kesandin.

25. “Paşê Xwedê Teala dibêje: *Me hûn efû kirin*” (Şoşîkî, 2014: (Şoşîkî, 2014: 77)).

Ev mînak hevokerê hevedudanî ye ku ew wekî ‘*hevoka veguhastî ya yekser*’ (Tan, 2011: 339) tê binavkirin. Di hevoka alîkar ya ku di navbera dînikan de hatiye veguhastin avahiya ergatîvî li dar e. Kirde di rewşa tewandî, lê bireser di rewşa xwerû de ye. Herwiha kirde û lêker ji aliyê mêjerê ve li hev nakin, çimkî kirde yekjimar e lê lêker pirjimar e. Mêjera bireserê (hûn) jî pirjimar e. Hal ew e ku bireserê lêker xistiye bin bandora xwe. Ji lewre lêker li gorî bireserê hatiye kişandin û bi qertafa kesane ya wê hatiye kesandin.

26. “Yanî ey Benî-Îsrâîlî! Wê demê di bîra xwe bînin û behsa wê bikin, wexta heftê heb ji mezinên we yên ku Mûsa(e) ji navbera we bijartibûn û bi xwe re biribûn çiyayê Tûrê da ku ji ber perestîna xwe ya conegayî uzrê xwe ji Xwedê teala bixwazin” (Şoşîkî, 2014: 80).

Hêmanên hevoka sereke di rewşa akuzatîf de ye ji lewre pêveber li gorî kirdeyê hatine kişandin û kesandin. Lêbelê di ‘*hevoka hevdundanî ya bi cînavka girêkî*’ (Tan, 2011: 339) ya bi ‘*wexta*’ dest pê dike ergatîvî li dar e. Di eslê xwe de vê mînakê jorîn ji çend komekan/clause (Tan, 2011) pêk tê. Em dikarin wê wiha ji hev bixin:

Wê demê di bîra xwe bînin û behsa wê bikin. Mûsa(e) heftê heb ji mezinên we ji navbera we bijartibûn û bi xwe re biribûn çiyayê Tûrê da ku ji ber perestîna xwe ya conegayî uzrê xwe ji Xwedê teala bixwazin.

Her wekî ku dîyar e, kirdeya hevoka duyemîn “*Mûsa*” navdêrekî nêrza, yekjimar û binavkirî ye. Wek rêgaz di demên borî yên bi lêkerên gerhuhêz de ji ber avahiya ergatîvê kirde tê tewandin. Îstisnaya vê qayîdeyê navdêrên nêrza yên yekjimar û binavkirî ne. Ji ber ku meyla zimanê kurmancî ber bi terikandina tewandina navdêrên nêrza yên yekjimar û binavkirî ye û tewandina wan ziman zortir dike li vir jî kirde (*Mûsa*) bi forma xwe ya netewandî hatiye bikaranîn (Reşîd, 6; Bozarslan, 1999: 98). Niha em vê mînakê bi cînavkan ji nuh ve saz bikin da ku bikaribin em têgihîşinê hêsantir bikin.

Wî ew bijartibûn û (ew) bi xwe re biribûn.

Ev hevoka nuh Dema em li şûna navdêrên kû di hevokê de kirde û bireser in cînavkên wan bi kar tînin em zelaltir dibînin ku kirde di rewşa tewandî ye û di ya bireser xwerû ye. Biresara ku mêjera wê pirjimar e pêveber xistiye bin bandora xwe yanî dirûvê xwe pê xistiye û ew mîna xwe pirjimar kiriye. Êdî rind tê dîtîn ku avahiya ergatîvê rola xwe listiyê û rê nedaye ku peywendiyêke di navbera kirde û bireserê çêbibe.

27. “Di hin ragihandinan de hatiye gotin, Mûsa (e) gotiye: Xwedayê min! Qewmê Îsraîlî dê bibêjin; *te eşrafên me kuştin*” (Şoşîkî, 2014: 80).

Di hevoka pêşîn de lêker li gorî “*avaniya tebatî*” (Tan, 2011: 299) hatiye kişandin yanî kirde ne diyar e lewma jî li vir rewşa akuzatîvî li dar e. Bi gotineke din kirdeyê lêkera “*hatin*”ê xistiye bin bandora xwe û ew bi qertafa xwe ya kesane kesandiyê. Lêbelê hevoka duyemîn bi rêya lêkera “*gotin*”ê di forma “*hevoka veguhastî*” (Tan, 2011: 339) de hatiye saz kirin. Ev lêkera gerguhêz di dema borî ya têdeyî de ye. Lewma jî hêmanên hevokê li gorî rêzikên ergatîvê tev geriyane. Ji ber ku ji aliyê kirde (*Mûsa*) ve tiştê hatiye gotin, lêkera “*gotiye*” yekjimar hatiye kişandin ku ev yek jî tercîhek di cîh de ye.

Durre tiştê Mûsa (e) gotiye hatiye vegotin: “*Xwedayê min! Qewmê Îsraîlî dê bibêjin; te eşrafên me kuştin.*” Dîsa li vir ji ber ergatîvî kirde (*te*) hatiye tewandin û pêveber ne bi kirdeyê re lêbelê bi bireserê re li hev kiriye. Çimkî kirde qertafa xwe

ya kesane nedaye pêveber. Berevajiya vê yekê biresera (*eşrafên me*) ku pirjimar e pêveber xistiye bin bandora pêveber bi paşqertafa pirjimariyê hatiye kesandin.

28. ‘‘Lewra *Xwedê Teala ew nîmetên xwe* ji ser wan birrîn’’ (Şoşikî, 2014: 81). Ji ber ergatîvî digel ku kirde li vir yekjimar e jî pêveber pirjimar hatiye kesandin. Kirde û lêker li hev naguncin. Lêbelê ji ber ergatîvê li şûna kirdeyê pêveber ketiye bin bandora bireserê û lêker li gorî biresera pirjimar teşe girtiye yanî di xwe de mêjera bireser diyar kiriye.

29. ‘‘*Resulê Xwedê* (s) derket nimêjgehê, teleba baranê **kir**, ebayê xwe çep **zîvirand** û paşê du rek’et nimêj **kirin**.’’ (Şoşikî, 2014: 84).

Pêveberên gerguhêz ‘talep kirin, çep zivirandin’ ji ber ergatîvê ketine bin bandora bireserê û lewma yekjimar hatine kesandin. Lêbelê pêvebera gerguhêz ‘nimêj kirin’ ji ber ku biresera wê pirjimar e ew jî pê re ketiye nav ahengiye û li gorî wê pirjimar hatiye kesandin.

30. ‘‘*Wan bêyî heqî* û ji barbariya xwe **pêxemberên xwe** dikuştin’’ (Şoşikî, 2014: 86).

Ji ber avahiya ergatîvê kirde (*wan*) hatiye tewandin da ku kirde û bireser (**pêxemberên xwe/ew**) bi awayeke morfolojîk ji hev bîr cûdakirin (Tan, 2011: 87). Herwiha ergatîvî wî barî daye lêkerê ku mêjera bireserê bi qertafa kesane ya bireserê di xwe de diyar bike. Lê ji ber ku bireser ji ravekê pêk tê, raveber veqetandeka ‘‘-ên’’ê wergirtiye û mêjera wê pirjimar bûye. Xulase, li vir ji ber ergatîvî pêveber ketiye bin bandora bireserê, ew li gorî bireserê hatiye kesandin û yekjimarî an jî pirjimariya bireserê dîsa pêveberê nîşan daye. Lewma jî li vir pêveber pirjimar hatiye kesandin û ti tîkiliya vê yekê jî bi mêjera kirdeyê re tune ye. Welew kî di vê mînakê de kirde yekjimar jî bûya pêveber dîsa dê li gorî mêjera bireserê teşe bigirta.

31. ‘‘Sebeba ku **ew** ajotin ser kafîrtî û kuştina pêxemberan, îsyankarî û derbasbûna wan ya ji heddê xwe ye’’ (Şoşikî, 2014: 87).

Di hevoka alîkar ya relatîv de ji ber ergatîviyê lêkera ‘‘ajotin’’ li gorî hêmana xwerû ango bireserê (**ew**) hatiye kesandin û bi qertafa kesane ya cînavka ‘‘**ew**’’ê

hatiye kesandin. Bi vî awayî pêveber pirjimar bûye. Herwiha ji vê mêjera pêveberê em fehm dikin ku bireser jî pirjimar e.

32. “Vêca *Xwedê Teala* **mumin** jî bi wan re **kirin** heval” (Şoşikî, 2014: 88).

Berevajiya avahiya akûzatîviyê li vir kirde (*Xwedê/wî*) di rewşa tewandî de lê bireser (**mumin**/ew) di ya xwerû de ye ku ev jî berê me dide ber avahiya ergatîviyê. Bi vî awayî kirde û bireser ji hev hatine cûdakirin. Herwiha kirde ji aliyê mêjerê ve yekjimar e, lê bireser û pêveber pirjimar in. Pêveber bi bireser re li hev kiriye û bi paşkoka kesane “-in” hatiye nimandin da ku bi vi awayî pirjimariya bireser nîşan bide. Ji xwe di kurmancî de pêveber her tim bi paşkoka kesane ya hêmana xwerû tê kesandin. Di vê mînakê de jî ji ber ergatîvî hêmana xwerû bireser e û bi duristî pêveber li gorî wê hatiye kesandin.

33. “Vêca *Xwedê Teala* **seza û cezayekî munasîbî kirina wan** da wan; **ew** ji mukemmeliyata însên derxistin û **kirin** şeklê meymûnan” (Şoşikî, 2014: 92).

Bêjeya “*Xwedê teala*” kirdeya teva hevokan e yanî kirde hevpar e. Ji ber ku hevokên vê nimûneyê li pey hev hatine gotin piştî kirde di serê hevokê de carekî hate diyarkirin ew êdî nehatiye dubarekirin. Herwiha digel ku kirde yekjimar e, lêkera “dan” yekjimar lêbelê lêkerên “derxistin” û **kirin** pirjimar hatine kesandin. Çimkî ji ber ergatîviyê pêveberan bi biresera xwe re li hev kiriye. Bi gotineke din yekjimarî û pirjimariya bireseran teşe daye mêjera pêveberan.

34. “Vêca *wîapê xwe* kuşt û bi şev hilda û bir li ber deriyê mirovekî danî, vêca sibehê rabû dawê lê kir” (Şoşikî, 2014: 93).

Her wekî ku ji mînakê diyar e, kirde cînavka tewandî ya kesê sêyem ê yekjimar e û ji bo hevokên din jî hevpar e. Herwiha bireser ji ravekê (**apê xwe**) pêk tê û veqetandek “-ê” ya ku hatiye dawiya peyva “**ap**” nîşan dide ku bireser jî yekjimar e. Dema em li şûna vê ravekê, cînaka xwerû ya kesê sêyem ê yekjimar “**ew**” bi kar tînin (*wîew* kuşt) em dibînin ku bireser cînavka xwerû ye. Lê gelo çima mêjera lêkeran yekjimar e? Çimkî wek rêgez, pêveber li gorî hêmana xwerû ya hevokê tê kesandin û li vir jî ya xwerû bireser e. Yanî bi kurtî em dikarin bêjin ku

avahiya ergatîviyê lêker xistine bin bandora bireserê û ji ber ku bireserên hemû lêkeran yekjimar in mêjera pêveberan jî yekjimar hatine kesandin.

35. ‘‘Kê **tu** kuştî? Wî **got**: *Kurê birayê min ez kuştîm*’’ (Şoşikî, 2014: 93).

‘‘Kê’’ cînavkeke pirsîyariyê ye. Di hevokê de pîrsa kesa dike ku ew di hevokê de navdêr an jî cînavkên tewandî ne. ‘‘ **tu**’’cînavka kesane ya xwerû ye û ji ber ku ew li vir di peywira bireserê de hatiye bi kar anîn, pêvebera hevokê kiriye bin bandora xwe û lewma jî pêveber qertafa kesane ya cînavka kesê duyem ê yekjimar ‘‘ **tu**’’girtiye. Çimkî ‘‘leker tim di bin bandora cînavkên xwerû de ye’’(Tan, 2011: 225). Di hevoka veguhastî de jî disa ji ber ergatîvî pêveber (**kuştîm**) li gorî bireserê (**ez**) hatiye kişandin û kesandin.

36. ‘‘Vêca qewmê wî **gotin**: Vêga *te heqî* beyan **kir** û tu şubhe û guman ji me re nema. Êdî *wan çêlek* serjê kir’’ (Şoşikî, 2014: 96).

Mêjera lêkera ‘‘gotin’’ pirjimar bûye. Lewre ji ber ergatîvî mêjer û kesaniya pêveberên gerguhêz di demên borî de ji aliyê bireserê ve tê destnîşankirin. Lewma ji pirjimariya vê pêveberê em têdigihîjin ku bireser pirjimar e yanî ji yek tiştî zêdetir tişt hatine gotin.

Herwiha lêkerên hevedudanî ‘‘ beyankirin’’ û ‘‘serjêkirin’’ jî li gorî zagonên ergatîvê teşe girtine. Çimkî digel ku kirde pirjimar e jî ev lêker yekjimar hatine kişandin û kesandin. Çimkî ew ketine bin bandora bireserê û ji ber ku mêjera bireseran yekjimar e, pêveber jî yekjimar hatine kesandin.

37. ‘‘Resûlullah (s) digel sehabiyên xwe gelek dixwestin ku xwedî-kitêb; Yehûdî û Xiristiyan beşdarî sefa Îslamê bibin, îmanê bi pêxembertiya wî binin û da ku cîhadê bi muşrikan re bikin’’ (Şoşikî, 2014:100).

Her çiqas lêkera hevokê (xwestin) lêkereke gerguhêz e biresera wê bi aşkerayî nehatiye diyar kirin. Lêbelê di berdewama hevokê de tê dîtin ku bireser yanî tiştê ku hatine xwestin gelek in. Ji ber ku xwestek ji yekê zêdetir in pêvebe jî pirjimar hatiye kesandin da ku mêjera bireserê diyar bibe.

38. “Vêca ev ayet nazil bû, û *ayetê ev yek* ji wan re bi awayekî zelal ve vegot” (Şoşikî, 2014: 100).

Di hevoka ewil de ji ber ku pêveber negerguhêz e, kirde yanî bêjeya “ev ayet” nehatiye tewandin. Lêbelê di hevoka duyemîn de heman peyv ji lêkereke gerguhêz re bûye kirde û lewma jî di rewşa tewandî (ayetê) de hatiye bikar anîn. Ji ber ku lêker li gorî hêmana xwerû tê kesandin di hevoka pêşîn de pêveber bi kirdeyê re li hev kiriye. Lêbelê di ya duyemîn de bi hêmana xwerû yanî bireserê bi pêveberê re hevahengiyek ava kiriye û wê xistiye bin bandora xwe ku ev yek jî wekî avahiya ergatîvî tê binavkirin.

39. “Lewra *wan* jî **înad û xwe mezindêrî** ji pêşiyên xwe hildaye” (Şoşikî, 2014:100).

Tevna ergatîviyê li vir jî lidar e. Kirde (*wan*) hatiye tewandin lê bireser (înad û xwemezindêrî) di rewşa xwerû de ye û ew ne navdêreke razber e. Ji ber ku navdêrên razber nayên jimartin ew yekjimar tî hesibandin. Lewma jî ber ergatîvî pêveber ketiye bin bandora vê bireserê û yekjimar hatiye kesandin.

40. “Vêca *Resûlullah* (s) **ew** efû **kirin**” (Şoşikî, 2014: 104).

Wekî ku diyar e pêveber pirjimar hatiye kesandin û ti peywendiya wê bi kirdeya yekjimar re nîn e. Sedama vê yekê avahiya ergatîvê ye ku bireser pêveberê dixê bin bandora xwe û mêjera xwe bi vî awayî diyar dike. Vêca em fehm dikin ku bireser kesê sêyem ê pirjimar e.

41. “Paşê *we* **ehd û peyman**a ku di **Tewratê** de ji pêşiyên *we* **hatibû standin qebûl kir**, *we* **ew** **înk**ar **nekir**” (Şoşikî, 2014: 112).

Gava em bala xwe didin kirde (*we*) û pêveberan (qebûl kir, înk

42. “Lewra *Xwedê teala* di cennetê de **gelek mertebeyên bilind** ji îbadên xwe re amade kirine” (Şoşikî, 2014: 114).

Kirde(*Xwedê teala*) yekjimar e, lêbelê hem biresera hevokê ya ku ji ravekê (**gelek mertebeyên bilind**) pêk tê, hem jî pêveber (amade kirine) pirjimar in. Yanî pêveber bi bireserê re di nav ahengiyê de ye û li gorî mêjera bireserê teşe girtiye. Berevajî kirdeyê pêveber ji ber rêgezên ergatîvî pirjimar hatiye kesandin da ku mêjera bireserê diyar bike.

43. “Lêbelê eger *evd* ji **tixûbên** ku *Xwedê teala* jê re danîne û teyîn kirine bibihure û exlaqên paqij yên dînî piştguh bike, bêguman ewê bikeve vê îqabê” (Şoşikî, 2014: 114).

Ev mînak ji du hevokan pêk tê: Hevoka sereke û hevoka alîkar a ku xwedî raweya şertî ye. Ji ber ku pêveberê hevoka sereke (ewê bikeve) di dema bê de ye, ergatîvî derneketiye holê. Lêbelê hevoka alîkar li gorî rêgezên ergatîvî tev geriyaye. Em dikarin vê hevoka kompleks ji nuh ve wiha saz bikin da ku em têgihîştinê siviktir bikin û ergatîvî çêtir nîşan bidin:

“*Xwedê Teala ji evdê xwe re tixûb danine û teyîn kirine. Divê ew jê nebibihure û exlaqên paqij yên dînî piştguh neke. An na bê guman ewê bikeve vê îqabê.*”

Her wekî ku jê diyar e, bireser berevajî rewşa akuzatîv xwerû maye da ku ji kirdeyê bi hêsanî were cûdakirin. Herwiha kirde (*Xwedê Teala*) ji aliyê mêjerê ve yekjimar e, lê bireser û pêveber pirjimar in. Ji ber ergatîvî bireser pêveber xistiye bin bandorê û mêjera xwe bi rêya nîşandeka “-in” nîşan daye. Bi vî awayî em êdî dizanin ku bireser pirjimar e.

44. “Yanî ez qesem dikim ku *me* **kitêba Tewratê** daye Mûsa û *me* li piştî wî **pêxember** li dûv hev, yek li pey yekî şandine” (Şoşikî, 2014: 117).

Ji ber ergatîvî kirde hatine tewandin, lê bireser xwerû mane û bi vî awayî ji hev bi rêya peyvsaziyê hatine cûdakirin. Herwiha digel ku heman kirde (*me*) ji bo herdu hevokan hatiye bi kar anîn jî yek ji pêveberan yekjimar, lê ya din jî pirjimar

hatiye kesandin. Ev yek tê wê wateyê ku pêveber (**daye**, **şandine**) li gorî kirdeyê nehatine kişandin û kesandin. Ji xwe her wekî me berê jî gotibû ergatîvî dibe sedem ku pêveber ji dêlva kirdeyê bi bireserê re li hev bike û bi paşqertafa kesane ya bireserê re were kesandin û bi vî awayî yekjimarî û pirjimariya bireserê jî diyar bibe. Nimûneya jorîn heman rêgez û qayîdeyên ergatîvî di xwe de dihevine. Mesela; di hevoka peşîn de digel ku kirde pirjimar e, pêveber yekjimar hatiye kesandin. Ji lewre ti peywendî di navbera wan de tune ye. Lêbelê ji ber rewşa ergatîvî, pêveber bi bireser (**kitêba Tewratê**) re li hev kiriye. Yanî bireser, pêveber xistiye bin bandora xwe û mêjera pêveberê wek xwe yekjimar kiriye. Çimkî di rewşa ergatîv de peveber li gorî yekjimarî an jî pirjimariya bireserê teşe digre. Herwiha di hevoka din de încâ pêveber pirjimar hatiye kesandin. Em jî bi vî awayî jê fehm dikin ku mêjera bireserê pirjimar e. Ji ber ku di avahiya ergatîv de ji bo kirde û bireser ji hev bîr cûdakirin bireser xwerû dîmîne yanî ti qertafan nagire. Vêca em mêjera bireserê ji mêjera pêveberê fehm dikin.

45. “Vêca hesûdî û çavnebariya wan **ew** ajotin înkarkirinê” (Şoşîkî2014: 118)

Hesûdî û çavnebarî peyvên hemwate ne. Peyvek erebî ya din jî kurdî ye. Ji ber bandora ol û çanda Îslamê di kurdî de bikaranînên wiha zehf in (Tan, 2011: 77). Ji ber ergatîvî bireser wekî rêgez di rewşa xwerû de ye. Paşqertafa kesane (**-in**) ya ku hatiye dawiya pêveberê û ew pirjimar kesandiye ne ji kirdeyê ye. Çimkî kirde yekjimar e û ti têkilî di navbera wan de çenebûye. Lêbelê bireser pêveber xistiye bin bandora xwe û mêjera pêveberê pirjimar kiriye da ku pirjimariya xwe bide nasîn.

46. “Yanî îllet û sersebebê ku ezabê îhanetker ji **wan** re heye, kafirtiya wan e, vêca *kafirtiya wan* **ew** ji laîqbûna wan ya ji rehma Xwedê teala re derxistine û kirine musteheqê ezabê biçûkxistina wan” (Şoşîkî, 2014: 119).

Kirdeya hevoka duyemîn (*kafirtiya wan*) yekjimar e. Lêbelê mêjera pêveberan (derxistine û kirine)pirjimar e. Çimkî ji ber ergatîvî pêveber li gorî hêmana xwerû yanî bireserê hatine kesandin. Herwiha pirjimariya pêveberan jî nîşan dide ku mêjera bireserê pirjimar e.

47. “Vêca Xwedê teala gazî li însanan dike, ji wan re wiha dibeje: Îmanê bi wan hukmên ku min ji hebîbê xwe Muhemmed (s) re şandine bînin” (Şoşikî, 2014: 120).

Ji ber ku pêveberên hevokên bingeîn ne di demên borî de ne ew li gorî kirdeyê hatine kesandin. Lêbelê hevoka alîkar ya relatîv li gorî rê û rêzikên ergatîvî tevgeriyaye. Ev hevoka alîkara hevdudanî ya bi cînavka girêkî bi peywira biresera pêvebera “îman bînin” hatiye bi kar anîn. Em dikarin vê hevoka kompleks wiha ji hev bixin û ji nuh ve saz bikin da ku ergatîvî çêtir bê dîtîn: *Min ji hebîbê xwe Muhemmed (s) re hukm şandine. (Hûn) Îmanê bi wan bînin.*

Wekî ku jê dîyar e, kirde (*min*) û bireser (**hukm**) di du rewşên dijber de ne yanî kirde tewandî lê bireser xwerû ye. Ji ber ergatîvî pêveber (**şandine**) ketiye bin bandora bireserê û li gorî wê teşe girtiye. Êdî em ji mêjera pêveberê yanî ji paşqertafa (**-in**)ê ya ku pêveber pê hatiye kesandin fehm dikin ku bireser pirjimar e.

48. “Lewra *Cebraîlî* bi fermana Xwedê teala **Qur’an** nazilî ser qelbê te kiriye” (Şoşikî, 2014:127).

Di kurmancî de ji ber ku kirde û bireser nabe ku herdu di heman hal û rewşê de bin, li vir jî ev rêgez karîger e yanî kirde tewandî lê bireser xwerû ye. Çimkî kirde (*Cebraîlî*) bi qertafa “-î” hatiye tewandin, lê bireser (**kîjan çêlek**) xwerû maye. Bi vî awayê jî herdu ji hev hatine cudakidirin. Her wiha pêveber jî bi bireserê ve li hev kiriye û ji lewma mêjera herduya yekjimar hatiye kesandin.

49. “Muheqqeq me **ayetên rewşen** ji te re nazil kirine û ji fasiqan pê ve tu kesî din înkara wan nake.” (Şoşikî, 2014: 128).

Di meala vê ayeta pîroz de mêjera kirde bireser û pêveber hemû pirjimar in. Kirde tewandî (*me*) lê bireser di rewşa xwerû de ye ku ew jî li gorî avahiya ergatîvê rast û durist e. Bireser ji raveka “*ayetên rewşen*” pêk tê. Divê bê zanîn ku li vir qertafa “-ên” veqetandek e, yanî ne ji bo tewandinê lê ji bo veqetandin û nîşandana zayend û mêjera navdêran hatiye bikaranîn. Bi vî awayê êdî em dizanin ku bireser pirjimar e. Herwiha ji ber ku pêveber di pergala ergatîvê de li gorî bireserê tê

kişandin û bi paşqertafa kesane ya bireserê tê kesandin li vir jî pêvebera hevokê wekî bireser pirjimar hatiye kesandin.

50. “Ev ayet, nîşan didin ku *wan* **hemû hukmên Tewratê jê neavêtine**, belkî **ew mijarên ku sifetên Resûlullah beyan dikirin**, jê avêtine” (Şoşikî, 2014: 130).

Her wekî ku diyar e kirde (*wan*) tewandî lê bireser jî di rewşa xwerû de ne. Ji ber ergatîvî bireserên pirjimar pêveber xistine bin bandora xwe, bi pêveberan re li hev kirine û ew jî wek xwe pirjimar kesandine.

51. “Heta Yehûdî bi îftira dibêjin: *Suleymanî* bi xwe **kitêbên sêhrê** kom kirine û di binê kursiya xwe de veşartine” (Şoşikî, 2014).

Her wekî ku dixuye kirde (*Suleymanî*) yekjimar e û bi qertafa ‘-î’ hatiye tewandin. Lê bireser (**kitêbên sêhrê**) ji ravekê pêk tê û raveber bi qertafa ‘-ên’ê pirjimar bûye yanî mêjera wê kifş e. Herwiha mêjera pêveberê jî pirjimar e. Ev jî tê vê maneyê ku di navbera kirde û pêveberan (kom kirine, veşartine) de ti têkilî tune ye. Berevajî vê yekê bireser pêveber xistiye bin bandora xwe û pê re re li hev kiriye yanî ew ji aliyê mêjerê ve şibandiye xwe û ev yek jî li gorî rêzikên ergatîvê pêk hatiye.

52. “Vêca *Mislimanan* bi feraseta xwe **ev hîle û cure damûdahfikên wan pûc û tune kirin** û bi taybetî jî têgihan ku qeşmeriya wan ya zîvirîna wan ya ji dînê heq piştî esrê sirf ji bo veğerandina mislimanan ji Îslamiyetê ye” (Şoşikî, 2014: 146).

Ji ber ergatîvî kirdeya hevokê (*Mislimanan*) qertafa ‘-an’ girtiye û wê kirde xistiye rewşa tewandî. Herwiha bi xêra wê zayend û mêjera kirdeyê jî tê zanîn. Yanî êdî bi saya vê qertafê em dizanin ku kirde pirjimar e û tewandî ye. Berevajî vê rewşê bireser jî di rewşa xwerû de ye. Lêbelê ji ber ku bireser ji ravekeke pêk tê di rewşa bêjeyan de hin guherîn çêbûne. Weke mînak qertafa veqetandekê ‘-ên’ hatiye bikaranîn da ku li vir mêjer û zayenda wê bê zanîn. Bi vî awayî em têdigihêjin ku bireser jî pirjimar e. Di avahiya ergatîvê de pêveber li gorî bireserê tê kişandin. Ji ber vê yekê bireserê pêveber xistiye bin bandora xwe û ew jî weke xwe pirjimar kesandiye.

53. “Bi taybetî *Yehûdî û hinek Xirîstiyânên ku di qelbê wan de **agirê dijminahiya Îslamê** dişixulî, curecur mekr û hîlebazî* çêdikin heta pey re bi xweşikahî bikarin bi dûv Mislimanan bikevin û li welatê Îslamê fikrên pîs dawêşînin” (Şoşikî, 2014:1 46).

Ev nimûne hevokeke hevdudanî ya bi cînavka girêkî (hevoka relativ) ye. Hevoka alîkar (*Yehûdî û hinek Xirîstiyânên ku di qelbê wan de **agirê dijminahiya Îslamê** dişixulî*) bi giştî di peywira kirdeya hevoka sereke de hatiye bikaranîn. Ji ber ergatîvî pêvebera “*dişixulî*” li gorî biresera (***agirê dijminahiya Îslamê***) yekjimar hatiye kişandin û lewma jî her dû li hev diguncin. Pêvebera hevoka sereke jî ketiye bin bandora biresera xwerû ku ew bi jî serê xwe mêjera bireserê nîşan nade. Digel ku bêjeya “*curecur*” di xwe de wateya piraniyê dihewîne jî em mêjera bireserê ji qertafa kesane ya pirjimariyê “*-in*” a ku hatiye dawîya pêveber fehm dikin.

54. “Lewra wan **hevalên xwe** ji rêya rast derdixistin, dibirin delaletê, lêbelê ji xwe re îddîya cennetê dikin û dibêjin; em milletê bijarte yên Xwedê teala ne!!” (Şoşikî, 2014: 148).

Ji ber ergatîvî kirde (*wan*) di rewşa tewandî de ye û bireser (**hevalên xwe**) ji ber ku di ravekê de hatiye bikaranîn mêjera xwe bi veqetandeka “*-ên*” diyar kiriye. Êdî em dizanin ku bireser pirjimar e. Li gorî rêzikên ergatîvî bireser pêveberê dixê bin bandora xwe. Li vir heman qayîde kariger e û ji lewre pêveber (derdixistin, dibirin) jî li gorî pirjimariya ravekê bi qertafa kesane “*-in*” pirjimar hatiye kesandin.

56. “Yanî *Yehûdiyan* digot: Xirîstiyân ne li ser tu dîn û baweriyê heq in û bi vî awayî **înkara Îsa (e) û Încîlê** dikirin. *Xirîstiyanan* jî digot: Yehûdî ne li ser tu dîn û baweriyê heq in û bi vî awayî **înkara Mûsa (e) û Tewratê** dikirin” (Şoşikî, 2014: 150).

Kirdeya herdu hevokên ku bi “*Yehûdiyan* digot” û “*Xirîstiyanan* jî digot” dest pê dikin bi qertafa “*-an*” hatine tewandin û mêjera wan bi vî awayî pirjimar bûne. Vêca ji ber ku kirde di rewşa tewandî de ne, pêveber (digot) bi bireseran re li hev kirine û ji ber vê yekê ew yekjimar hatine kişandin. Bi gotineke

din ji aliyê kirdeyê ve tiştê tenê hatiye gotin yanî bireser yekjimar e. Lewma pêvebera “gotin” di hevokê de yekjimar hatiye kesandin.

Di berdwama herdu hevokên veguhastî de dîsa ergatîvî de hatiye bikaranîn. Wek mînak, “...(*Yehûdîyan*) **înkara Îsa (e) û Încîlê** dikirin” û “...(*Xirîstîyanan*) **înkara Mûsa (e) û Tewratê** dikirin” Kirdeya herdu hevokan ji di destpêka hevokên sereke de hatine diyarkirin ji ber vê yekê ne hewceye ku were dubarekirin û lewma em dikarin bibêjin ku kirde cînavka kesê sêyem ê pirjimar (*wan*) in û di rewşa tewandî de ne. Herwiha bireser pirjimar in. Lêbelê mêjera pêveber(înkara...dikirin) û bireser herçiqas li hev bike jî li vir rewşeke awarte ya ergatîvîyê heye. Çimkî “*Di ergatîviye de gellek caran kirdeya pirrjimar nayê gotin, ji bo pirrjimariya wê peveber dibe pirrjimar*”(Baran, 2012: 62).

57. “Hal ev e ku *herdu grûban* jî **kitêba xwe** dixwend, di kitêba wan de tiştê wiha tune bû” (Şoşikî, 2014: 150).

Kirdeya hevokê (*herdu grûban*) pirjimar e. Lêbelê mêjera pêveberê (dixwend) yekjimar e ango ew li gorî cînavka kesê sêyem ê yekjimar hatiye kesandin. Bi gotineke din teşeya ku pêveber girtiye nîşan dide ku ti hevbendî di navbera kirde û pêveberê de tune ye. Li şûna kirdeyê, ji ber ergatîvîyê pêveber bi bireser (**kitêba xwe**) re li hev kiriye. Çimkî ji aliyê mêjerê ve bireser yekjimar e. Bireserê pêveber xistiye bin bandora xwe û mêjera wê şibandiye a xwe.

58. “Ev hedîseyeke ku waq’î bûbû, destnîşan dike, piştî heftê salî *Tîtesê Rûmanî* ket Beyt’ul-Meqdisê û **ew** xirab kir, heta ew bû wekî komek ax, **heykelê Suleyman** (e) jî xirab kir û **gelek nusxeyên Tewratê** jî şewitandin” (Şoşikî, 2014: 151).

Kirde (*Tîtesê Rûmanî*) kesê sêyem ê yekjimar e. Pêvebera “ket” negerguhêz e û ew li gorî kesê sêyem ê yekjimar hatiye kesandin. Ev yek jî nîşan dide ku ji ber akûzatîvî di navbera kirde û pêveber de lihevhatinek çêbûye. Herwiha, herçiqas nehatibe dubarekirin jî, bi lêkerên gerguhêz (xirab kirin, şewitandin) re bi awayekî veşarî heman kirde hatiye bikaranîn. Lê ji ber ergatîvî di van hevokên gerguhêz de kirde ti bandorê li pêvebaran nekiriye. Vêca pêveber li gorî bireserê hatine kişandin û

kesandin. Wek mînak; (*Tîtesê Rûmanî*) **heykelê Suleyman** jî xirab kir û (*wî*) **gelek nusxeyên Tewratê** jî şewitandin.

Dema em bala xwe didin bireseran em dibînin ku ew ji ravekê pêk tên. Raveberê “heykelê Suleyman” veqetandeka “-ê” girtiye û bi vî awayî em dizanin ku yekjimar û nêrza ye. Raveberê raveka “nusxeyên Tewratê” jî bi veqetandeka “-ên” pirjimar bûye. Lewma pêveberên hevokê “xirab kir” yekjimar, lê pêveberê hevoka duyem “şewitandin” pirjimar hatine kesandin. Xulase, kirdeya herdu hevokan jî eynî ye. Lêbelê pêvberên wan heman teşe negirtine yanî yek li gorî kesê sêyem ê yekjimar, a din jî li gorî kesê sêyem ê pirjimar hatiye kesandin. Sedema vê yekê ev e ku ji ber ergatîvî pêveber li gorî bireserê tê kişandin.

59. “Hal eve ku *Xwedê teala* di dirêjîya tarîxa dinyayê de bê hed û bê hesab **ayetên ronîker û delîlên eşkerekar** peyapey nîşanî wan **dane** da ku ew tesdîqa pêxemberan bikin” (Şoşikî, 2014: 157).

Her wekî ku diyar e, mêjera kirdeyê (*Xwedê teala*) yekjimar. Lê bireser (**ayetên ronîker û delîlên eşkerekar**) ji du ravekan pêk tê û qertafa “-ên” a ku wekî veqetandek tê binavkirin hatiye dawîya raveberan û ew pirjimar kirine. Herwiha pêveber (**dane**) ji ber ergatîvî ketiye bin bandora bireserê û li gorî wê bi qertafa kesane ya “-ne” yê pirjimar hatiye kesandin.

60. “Yanî ya Muhemmed! *Me tu* bi heqiyê bi wê wehiya sabit û heq ji mirovan re şandî ew wehiya ku kesê xwe pê bigre, rêwinda nabe, wehm û xurafeyên batil pê naleyîzin (Şoşikî, 2014: 158).

Bi kurtasî em dikarin hevoka pêşîn wiha binivîsin: “*Metu şandî.*” Ji ber ergatîvî kirde û bireser ne di heman rewşê de ne. Yanî kirde (*Me*) hatiye tewandin bireser (**tu**) xwerû maye û bi vî awayî ew ji hev hatine cûdakirin. Herwiha pêveber (**şandî**) ketiye bin bandora bireserê û ji lewre bi qertafa kesane ya kesê duyem ê yekjimar (**-î**) hatiye kesandin. Her wekî diyar e ji ber ergatîvî ji dêlva kirdeyê hevbendî di navbera bireser û pêveberê de çêbûye.

61. “Yanî ya Muhemmed! Di bîra wan bîne wê dema ku *Xwedê Teala Îbrahîm* (e) bi çend bêjeyan îmtihan kir; **hin teklîf** lê **kirin** da ku wan eda bike, vêca wî jî bi çêtirînê edakirinê **ew eda kirin**” (Şoşikî, 2014: 163).

Mêjera lêkera gerguhêz “îmtihan kirin” ji ber ergatîvî mîna biresera xwe yekjimar hatiye kesandin. Çimkî ji ber ku bireser yanî kesê hatiye îmtihankirin yek kes e lêker li gorî mêjera wê yekjimar bûye. Niha em bala xwe bidin lêkera “edakirin”ê ji ber ku ev nimûne xwedî du helwestên pir balkêş e.

“**Hin teklîf** lê **kirin** da ku *(ew) wan eda bike*, vêca wî ew eda kirin” Kirdeya lêkera “eda kirin”ê di herdu hevokan de jî “Îbrahîm” yanî kesê sêyem ê yekjimar e. Lêbelê pêşî di forma xwerû (*ew*), piştî jî di a tewandî (*wî*) de hatiye bikar anîn. Her wiha digel ku bireser (*hin teklîf*) jî eynî ne, di hevoka ewil de forma wê ya cînavkê ya tewandî (*wan*) di ya din de jî forma wê cînavkê ya xwerû (*ew*) hatiye bikaranîn. Digel ku kirde û bireserên herdu hevokan jî yek in, yanî kirde yekjimar lê bireser pirjimar e çima heman lêker pêşî yekjimar durre jî pirjimar hatiye kesandin? Sedema van cûhadiyan du taybetmendiyan balkêş yên zimanê kurmancî ne ku em dikarin wiha bi kurtasî vebêjin:

1. **Kurmancî zimaneke nîv-akûzatîv e.** Yanî di dema niha û bê û hevokên bi lêkerên negerguhêz (intransitive) yên di demên borî de; kirde di rewşa xwerû (direct case), lê bireser di ya tewandî (oblique case) de ye û lêker bi kirdeyê re hevbendiyê çêdike yanî li gorî wê tê kişandin. Lewma di hevoka “...*(ew) wan eda bike*” de kirde xwerû ye, lê bireser hatiye tewandin û lêker li gorî hêmana xwerû yanî kirdeyê hatiye kişandin.

2. **Kurmancî zimaneke nîv-ergatîv e.** Yanî di demên borî yên bi lêkerên gerguhêz (transitive) de, berevajî rewşa akûzatîv, kirde tê tewandin lê bireser di rewşa xwerû de ye û lêker dikeve bin bandora bireserê û li gorî mêjera bireserê qertafan digre. Lewma di hevoka “...wî ew eda kirin” de kirde di rewşa tewandî de ye, lê bireser xwerû maye. Herwiha lêker li gorî hêmana xwerû yanî bireserê teşe girtiye û mêjera bireserê jî ji lêker tê fehm kirin.

Niha jî em bi lêkerên din şîrovekirina xwe bidomînin. Di hevokên bi lêkerên gerguhêz ên di dema borî de ergatîvî bi şarezayî hatiye bikaranîn. Çimkî li gorî rêzikên ergatîvê kirde (*Xwedê, wî*) hatine tewandin, bireser (**Îbrahîm, hin teklîf, ew**) di rewşa xwerû de mane û pêveber (îmtihan kir, teklîf lê **kirin**, eda **kirin**) ketine bin bandora bireserê û li gorî yekjimarî an jî pirjimariya bireserê teşe girtine. Wek mînak; “...*Xwedê teala **Îbrahîm** (e) bi çend bêjeyan îmtihan kir; **hin teklîf** lê **kirin**...*” Li vir ji ber ku bireser (**Îbrahîm**) yekjimar e, lêkera “kirin”ê jî li gorî wê yekjimar hatiye kesandin. Lêbelê lêkera “kirin”ê durre pirjimar hatiye kesandin. Sedema vê yekê ev e ku lêker bi vî awayî pirjimariya bireserê nîşan daye. Yanî êdî em dizanin ku bireser pirjimar e.

62. “*Xwedê Teala di van rojên heccê de **gelek nîmetên semedanî** ji me re amade **kirine**; di saxî û mirinê de **Kebe** ji me re **kiriye lêveger** û qiblegeh” (Şoşikî, 2014: 164).*

Her çend ku kirdeya (*Xwedê*) herdu hevokan jî eynî ye û mêjera wê yekjimar e, lêkera “kirin”ê li vir pêşî pirjimar (amade **kirine**) dur re yekjimar (kiriye lêveger) hatiye bikaranîn. Sedema vê yekê ergatîvî ye. Çimkî ev lêker di raweya dema borî ya dûdar de ye gerguhêz e. Ji ber ergatîvî ew li gorî bireserê hatiye kişandin. Di hevoka pêşîn de bireser (**gelek nîmetên semedanî**) ji ravekê pêk tê û pirjimar e, ji lewre pêveber xistiye bin bandora xwe û ew mîna xwe pirjimar kesandiye. Welew ku, li vir raveber (**nîmet**) di ravekê de nehata bikaranîn yanî xwerû bûya jî, ji ber ku pêveber pirjimar e, dê mêjera wê bi rêya pêveberê dîsa bihata fehm kirin. Lêbelê di hevoka din de bireser (**Kebe**) xwerû ye û yekjimar e. Vêca pêveber yekjimar hatiye kesandin da ku yekjimariya bireserê kifş bibe.

63. “*Hîç guman nîne ku **me Îbrahîm** li dinyayê ji bo resultî û pêxembertiya xwe **bijartiye**” (Şoşikî, 2014: 169).*

Kirde pirjimar e, lêbelê pêveber yekjimar e yanî ew ji aliyê mêjerê ve li hev nakin. Çimkî ergatîvî di vê mînakê de serdar e. Li gorî vê rêpîvanê kirde (*me*) hatiye tewandin lê bireser (**Îbrahîm**) di rewşa xwerû de maye û bi awayî yanî bi nîşandekên morfolojîk ji hev hatine cûdakirin. Ji ber ku bireser yekjimar e, pêveber (**bijartiye**) jî

li gorî bireserê teşe girtiye û ji aliyê mêjera ve di navbera wan de lihevhatinek derketiye holê.

64. “Yanî wexta *Xwedayê wî* gazî wî kir, ew bangî Îslamê kir, ew **delîlên eşkere yên ku yekîtiya Xwedê teala nîşan didan** jê re nîşan dan, bêtê tereddut got: *Min ji bo Xwedayê ku mexluq xuliqandinedine dînê xwe* xalis kir” (Şoşikî, 2014: 169).

Avahiya ergatîvê di vê nîşeyê de baş xwe daye der. Kirde di rewşa tewandî de ne û ti bandora wan li ser pêveberan tune. Pêveber li gorî mêjera biresera xwe teşe girtine. Yanî pêveber li gorî yekjimarî û pirjimariya bireserê hatine kesandin.

65. “Jixwe di ayeta pêşî de *Xwedê teala mumin* hîn kirin” (Şoşikî, 2014: 176).

Kirde (*Xwedê*) yekjimar e lêbelê mêjera pêveberê (hîn kirin) pirjimar e yanî ew li hev naguncin. Ji ber ergatîvê pêveber, wek rêgez, bi bireserê re li hev dike û li vir jî pêveber di bin bandora bireserê de ye û lewma ew pirjimar hatiye bikaranîn da ku mêjera bireserê diyar bibe. Bi vî awayî peyva “ **mumin**” a ku di hevokê de xwerû ye û ti zayend û mêjer destnîşan nake bi saya pêveber mêjera wê diyar kiriye.

66. “Di vê ayetê de jî emr li me dike ku em bibêjin: *Xwedê Teala* bi boyaxa îmanê **em** boyax kirine û **em** li ser dînê Îslamê xuliqandine” (Şoşikî, 2014: 176).

Kirde (*Xwedê*) tewandî, lê bireser (**em**) di rewşa xwerû de ne û bi vî awayî ji hev hatine cûdakirin. Pêveberên “ boyax kirine” û “ xuliqandine” gerguhêz in û di dema borî ya dûdar de hatine kişandin. Ji ber vê yekê hêmanên hevokê yên sereke li gorî avahiya ergatîvê hereket kirine. Wek rêgez, di kurmancî de pêveber her tim li gorî hêmana xwerû tê kişandin. Ji ber ergatîvê, li vir hêmana xwerû bireser e, lewma pêveber ketiye bin bandora wê û pêveber bi qertafa kesane ya vê cînavkê hatiye kesandin.

67. *Çi tişt ew* ji qibleya ku ew li serê bûn zîvirandin? (Şoşikî, 2014: 177).

Cînavka pirsyariyê “*Çi tişt*” kirdeya hevokê ye. Bireser (**ew**) xwerû ye û mêjera wê ne diyar e. Lêbelê ji ber ergatîvê pêveber li gorî bireserê tê kişandin û

mêjera bireserê diyar dike. Di vê mînakê de jî pêveber (zîvirand**in**) ketiye bin bandora bireserê û ew bi qertafa kesane ya bireserê hatiye kesandin. Pêveber pirjimar bûye û bi vî awayî mêjera bireserê jî derketiye holê.

68. “Belê Xwedê teala berê axaftina xwe dide Mislimanan û wiha dibêje: *Me* çawa **dînê Îslamê** nîşanî we **dabe** û *hûn* hîdayet kirib**in**, eynî wisan *me* ji we re **qibleya Îbrahîm** jî bijartiye, tercîh kiriye” (Şoşikî, 2014: 180).

Cînavka kesane “*me*” di rewşa tewandî de ye û ji hemû pêveberên binî xêzkirî re bûye kirde. Ji ber ku ev pêveber di raweya pêşkerî ya dema bori de ne û gerguhêz in, avahiya ergatîvî derketiye meydanê û hêmanên sereke yê hevokê li gorî wê teşe girtine. Wek mînak, pêvebera “hîdayet kirib**in**” ketiye bin bandora bireserê (*hûn*) ku ew cînavkeke xwerû ye û qertafa kesane ya vê cînavkê “-**in**” wergirtiye û dirûvê xwe wekî bireserê pirjimar kiriye. Wekî din, lêkerên “nîşan dan, bijartin û tercîh kirin” jî ji ber ku biresera (**dînê Îslamê, qibleya Îbrahîm**) herduyan jî yekjimar in pêveber xistine bin bandora xwe û mêjera van pêveberan yekjimar kesandine.

69. “*Me* **hûn** kirine mirovên qenc û adil; hûn qenctirînê ummetan in, hûn ummeta weset û navîngir in; hûn ne îfratê dîkin, ne jî tefrîtê dîkin” (Şoşikî, 2014: 180).

Dem a bala xwe didin kirde û bireserê em wan bi hêsanî ji hev derdixin. Çimkî herdu jî xwedî hal û rewşa (bi îngîlîzî *case*) cûda ne. Yanî kirde (*Me*) tewandî lê bireser (**hûn**) di rewşa xwerû de ye. Ev halê ku kirde û bireser tê de ne bandorê li pêveber (kirine) jî kiriye û ew li şûna kirdeyê bi biresera xwe re li hev kiriye. Ji lewma pêveber ji aliyê mêjerê ve dirûvê bireserê girtiye û ew jî pirjimar hatiye kesandin.

70. “Birayê mumin! *Me* **ev** bi kurtî got**in**, lêbelê her yek ji van mijaran behsa wan têra kitêbên bi cildan dike” (Şoşikî, 2014: 185).

Her wekî ku tê dîtin ji ber ergatîvî, kirde (*Me*) di halê tewandî de ye lê bireser (**ev**) cînavka şanîdanê ya xwerû ye. Ji ber ku bireser xwerû ye, em zayend û mêjera wê nizanin. “Her wekî me got, leker tim di bin bandora cînavkên xwerû de ye”

(Tan, 2011: 125). Ji ber vê rêgezê pêveber li gorî wê hatiye kesandin; çimkî li vir ev cînavka xwerû di peywira bireserê de ye. Vêca ji ber hemahengiya di navbera pêveber û bireserê, pêveber (gotin) qertafa ‘-in’ê girtiye û ev jî bûye nîşandeka pirjimariya herduyan jî. Bi vî awayî êdî em têdigihêjin ku bireser jî pirjimar e, yanî ne tenê tiştek lêbelê jê zêdetir hatiye gotin.

71. ‘‘Gelî cemeata ku îman aniyê! Wan tiştên wekî zewq û xweşiyên ku *Xwedê teala* ji we re helal kirine, hûn li xwe heram nekin. Lewra *min ew* ji we re helal kirine û nefsa we jî meyla wan dike’’ (Şoşikî, 2014: 187).

Hevoka ewil ji du komekan pêk tê: Komeka alîkar (subordinate clause) û komeka sereke (main clause). Ji ber ku pêvebera komeka sereke (li xwe heram nekin) di dema niha de ye akuzativî serdar e. Kirde hêmana xwerû ye, ji lewma kirdeyê pêveber xistiye bin bandora xwe û bi qertafa kesane ya xwe ew jî pirjimar kesandiye. Herwiha komeka alîkar li gorî avahiya ergatîviyê tevgeriyaye. Pêveber (ji we re helal kirine) ketiye bin bandora bireserê. Ji ber ku bireser pirjimar e pêveber jî aliyê mêjerê ve bi bireserê re gunciye û lewma jî pirjimar hatiye kesandin. Heman helwest di hevoka duyem de jî tê dîtin. Ji ber ergatîvî kirde (*min*) tewandî lê bireser (*ew*) xwerû hatiye bikaranîn. Pêveber li gorî cînavka xwerû yanî bireserê teşe girtiye da ku pirjimariya bireserê nîşan bide.

72. ‘‘Lêbelê îro, însan li erdê siwar bûye, destên xwe davêje binê behran, davêje stêran û alema jorîn û *wî alem* ji xwe re sernerm û stûxar kiriye. Însan di sedsala nozdehem de pê hesiya, lêbelê ev bû pazdeh sedsal ku *Qur’ana pîroz ew* kişf kirine, hem jî di demek wisan de *ew* kişf kirine ku însên newêrîbû li ser erdê bigere, *wî* hê ji ber tirsê xwe ji heywanan re *îbadet* dikir, lêbelê vêga ew goştê heywanan dixwe û ji postê wê îstifade dike, vêca çima tu şukrê *Xwedayê* xwe nakî?! (Şoşikî, 2014: 187)’’

Di nimûneya jorîn de du hevokên gerguhêz yên ku di dema borî de ne bala me dikişînin:

- ‘‘*wî alem* ji xwe re sernerm û stûxar kiriye’’
- ‘‘lêbelê ev bû pazdeh sedsal ku *Qur’ana pîroz ew* kişf kirine’’

Herdu hevok jî li gorî rê û rêzikên ergatîvîyê tevgeriyane. Di hevoka yekemîn de kirde (*wî*) tewandî lê bireser (**alem**) xwerû ye. Ev du halên cûda yên ku kirde û bireser tê de ne alikariya me dikin da ku em wan ji peyzasiyê ji hev cûda bikin. Wekî din ev rêpîvan rê li ber tevlihevîyên wateyê jî digrin. Vêca ji ber ku pêveber di vê avahiyê de bi bireserê re li hev dike pêveberê hevoka yekemîn yekjimar hatiye kesandin da ku mêjera wê diyar bike. Herwiha di hevoka duyemîn de jî heman helwest tê dîtin. Kirde (*Qur'ana pîroz*) ji ravekê pêk tê û raveber (*Qur'an*) veqetandeka “-a”yê wergirtiye û bi vî awayî mêjera kirdeyê yekjimar bûye. Lê bireser (**ew**) hêmana xwerû ya hevokê ye û lewma pêveber ketiye bin bandora wê. Çimkî mêjera bêjeya xwerû ji lêkerê tê fehmkirin. Vêca pêveber(kişf kirine) qertafa “-in”ê wergirtiye û mêjera xwe û bireserê diyar kiriye. Em bi vî awayî têdigihêjin ku bireser pirjimar e.

73. “*Me tu* ji Beyt’ul-Meqdîsê carekî din zîvirandî Kebeyê da ku em îmtihana însanan bikin ka kî îteata te dike û kî jî îteata te nake” (Şoşîkî, 2014: 188).

Çer ku em li rewşa û nîşandekên kirde, bireser û pêveberê dinêrin em bi hêsanî dibînin ku ew tev li gorî rêpîvana ergatîvî teşe girtine û rast û durist hatine bikaranîn. Ji ber ergatîvî kirde hatiye tewandin lê bireser xwerû maye da ku ji hev cihê bibin. Digel ku kirde(*Me*) pirjimar e jî, pêveber (zîvirandî) yekjimar e. Yanî ew teqez li hev nakin lêbelê peywendiya bireser û pêveberê çêbûye. Çimkî pêveber li gorî hêmana xwerû tê kesandin û qertafa xwe ya kesane ji bireserê digre. Lewma li vir ev rêgez jî pêk hatiye û pêveber qertafa kesane ya bireserê (tu) “-î”yê girtiye. Yanî pêveber ketiye bin bandora bireserê û ew li gorî kesê duyem ê yekjimar hatiye kesandin.

74. “Belê, Resûlullah (s) xwest berê xwe bide qiblegeha bavê xwe Îbrahîm (e) lewra *Kebeyê*, bêhtir **însan dikişandin** îslamiyetê, bi taybetî jî **qewmê Ereb dikişand** Îslamiyetê” (Şoşîkî, 2014: 190).

Lêkera “kişandin” di vê mînakê de pêşî pirjimar, piştê yekjimar hatiye kişandin di gel ku kirde (*Kebeyê*) eynî ye jî. Sedama vê yekê avahiya ergatîv e ku li gorî vê rêpîvanê kirde tê tewandin (oblique case), lê bireser di rewşa xwerû (direct case) de ye. Ji ber ku bireser xwerû ye mêjera wê nediyar e. Lewma pêveber dikeve

bin bandora bireserê û li gorî wê teşe digre da ku bi rêya lêkerê mêjera bireserê bê ragihandin.

Mînaka jorîn jî li gorî vê rêgez û qayideyê tevgeriyaye. Kirde (*Kebe*yê) bi qertafa “-ê” hatiye tewandin lê bireser (**însan**) xwerû maye û mêjera wê ne diyar e. Pêveber (dikişandin) pirjimar hatiye kesandin. Çimkî bireserê pêveber xistiye bin bandora xwe û mêjera xwe bi rêya wê diyar kiriye. Vêca em ji mêjera pêveberê fehm dikin ku bireser jî pirjimar e. Yanî tiştê ku dikişîne, yanî “Kebe” her çiqas yek tişt be jî kesên ku hatine kişandin yanî “însan” gelek in. Herwiha di hevoka duyemîn de bireser (**qewmê Ereb**) jî ber ku ji ravekê pêk tê mêjera xwe bi veqetandeka “ê” ragihandiye yanî birerser yekjimar e. Vêca di tevna ergatîv de pêveber tim li gorî kirdeyê teşe digre. Lewma jî ber ku li vir mêjera bireserê yekjimar e, pêveber (dikişand) jî yekjimar hatiye kişandin û kesandin.

75. “Madem *min evqas nîmet* li we kirine, nexwe hûn jî bi taet, tesbih, tehmîd, tekbr û tehlîlan min di bîra xwe bînin” (Şoşikî, 2014: 197).

Ji ber ergatîvî kirde di rewşa tewandî de ye. Her çend ku kesê dipeyîve yek kes be jî gelek nîmet jî aliyê wî ve li berpeyvan hatine kirin. Em vê yekê ji mêjera pêveberê jî fehm dikin; çimkî wekî rêgez di tevna ergatîv de pêveber bi bireserê re li hev dike. Lewma pêveber (kirine) bi qertafa kesane ya pirjimariyê yanî “-in”ê hatiye nimandin da ku pirjimariya bireserê ragihîne.

76. “Lêbelê *Îslamê ew pût* şikandin û avêtin, vêca tewafa Mislimanan ya herdu giran û sa’ya di neqaba wan de êdî ji bo bicihanîna emrê Xwedê ye” (Şoşikî, 2014: 202).

Hêmanên sereke li gorî tevna ergatîvî tevgeriyane. Kirde qertafa “-ê”yê girtiye û bi vî awayî hem ketiye rewşa tewandî hem jî zayend û mêjera xwe ragihandine. Êdî em dizanin ku kirde sernaveke mê ye û yekjimar e. Herwiha bireser jî ravekeke pêk tê jî mêjera wê ne diyar e. Lêbelê pêveberan bi rêya qertafa “-in” pirjimariya xwe diyar kiriye. Wekî ku tê dîtin kirde û pêveber li hev nakin. Çimkî jî ber ergatîvî pêveber bi bireserê re li hev dike û jî ber ku bireser di tevna ergatîv de xwerû ye yanî nayê tewandin ew xwe bi pêveberê re digunce bi vî awayî mêjera xwe

dîyar dike. Di vê mînakê de jî heman rêgez li dar e. Lewre pêveber ketiye bin bandora bireserê û pirjimar hatiye kesandin da ku pirjimariya bireserê ragihîne. Êdî em dizanin ku Islamê ne tenê putek lêbelê gelek put şikandine û avêtine.

77. “Dibêjin: Emê bibin tabîê wan kevneşopî adetên xwe yên ku **me bav û bapîrên xwe** li ser wan dîtine” (Şoşîkî, 2014: 212).

Hevoka alîkar ya ku bi gihaneka “yên ku” dest pê dike avahiya ergatîv di xwe de daye der. Çimkî kirde hatiye tewandin û bireser jî ji ber ku ji ravekê pêk tê ew bi rêya veqetandeka “- ên” pirjimariya xwe diyar kiriye. Ji ber ergatîvî, wek rêgez, divê bireser û pêveber li hev bikin û pêveber li gorî yekjimarî û pirjimariya bireserê were kişandin û kesandin. Lewma li vir pêveber pirjimar e da ku pirjimariya bireserê nîşan bike.

78. “Xwedê *teala* di vê ayetê de **tiştên paqij** helal kirine. Vêca çima bi taybetî **behsa muminan** kiriye? Ji ber fazîleta wan **behsa wan** kiriye. Ji xwarinê meqsûd îstifadekirin e. Nexwe îstifadekirin ji temamê giya, heywan, masî û teyrên bejî behrê caiz e, lêbelê ji bilî yên ku *Xwedê Teala* ew heram kirine. Di vê ayetê û di ayeta sûretê Maîde de jî *Xwedê tealaew tiştên heram jimartine*” (Şoşîkî, 2014: 214).

Digel ku kirdeya lêkerên “helal kirin” “heram kirin” û “jimartin” yekjimar (*Xwedê teala*) e, ew bi xwe pirjimar hatine kesandin. Çimkî di avahiya ergatîv de mêjera pêveberê li gorî yekjimarî û pirjimariya bireserê diyar dibe. Vêca ji ber ku biresera her sêyan jî pirjimar in, ew ketine bin bandora bireserê û lewma ew jî pirjimar bûne. Lêbelê lêkera “behsa... kirin” di avahiya ergatîv de lêkereke awarte ye ku her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin. Lewma di her du hevokan de jî her wekî ku diyar e yekjimar hatine kesandin.

79. “Paşê *Îslamiyet* hat, ji bo edalet û wekhevî pêk were **qisasiyet** danî” (Şoşîkî, 2014: 226).

Kirde ji ber ku berê hatiye destnîşankirin di devoka duyemîn de nehatiye dubarekirin. Yanî kirdeya lêkera ‘dan’ bêjeya “Îslamiyetê/Wê” ye û yekjimar e. Bireser (**qisasiyet**) jî di rewşa xwerû de ye. Lewma ji ber ergatîvî pêveber li gorî hêmana xwerû yanî bireserê hatiye kesandin. Di encamê de mêjera wê yekjimar

lewma pêveber (derxistin- perîşan kirin) ketiyê bin bandora wê û bi qertafa kesane “-in” a cînavka “hûn”ê hatiye kesandin û bi vî awayî ew jî pirjimar bûye.

83. “Lêbelê *Îslamiyetê ew* pûç kirin û hinek nisûkên din jî lê zêde kirin” (Şoşikî, 2014: 246).

Ji ber ergatîvî kirdeya hevokê “*Îslamiyetê*” bi qertafa “-ê” hatiye tewandin. Yekjimar e û zayenda wê mê ye. Lêbelê bireser xwerû ye. Yanî zayend û mêjera wê nediyar e. Heger ne ji kontekstê be, naye zanin bê ka cînavka “ew” yekjimar e an jî pirjimar e. Lewma li gorî ergatîviyê pêveber (pûç kirin) bi bireserê re li hev kiriye û bi qertafa “-in” pirjimar hatiye kesandin da ku bi vî awayî mêjera bireserê ragihîne. Pêvebera “zêde kirin”ê jî li gorî heman rêpîvanê tevgeriyaye. Lewra biresera ku ji ravekê (hinek nisûkên din) pêk tê û pirjimariya xwe eşkere kiriye, pêveber xistiye bin bandora xwe û ew jî mîna xwe pirjimar kesandiye.

84. “Vêca *Xwedê teala* bi şerefa îmanê hûn muşerref kirin” (Şoşikî, 2014: 251)

Kirde (*Xwedê*) ji aliyê mêjerê ve yekjimar e lê bireser û pêveber pirjimar in. Wek rêgez pêveber li gorî dem, kes û raweyê tê kişandin; di zimanê kurmancî de ew li gorî hêmana xwerû teşe digre. Lewma ji ber ergatîvî di mînakê jorîn de bireser (hûn) xwerû maye, ji lewra pêveber (muşerref kirin) li gorî bireserê hatiye kişandin û bi qertafa kesane ya pirjimariyê “-in”ê pirjimar hatiye nimandin û bi vî awayî mêjera xwe û bireserê jî diyar kiriye.

85. “Vêca *Xwedê mumin* hîdayet kirin; ew heqîqeta ku ji ber hesedê tê de îxtilaf dikirin, nîşanî wan muminan da” (Şoşikî, 2014: 259).

Digel ku kirdeya her du hevokan jî (*Xwedê*) eynî ye û yekjimar e, lêkera ‘hîdayet kirin’ pirjimar, lê a ‘dan’ yekjimar hatiye kesandin. Heger lêker li gorî kirdeyê bihatana kesandin diviya mêjera her dû lêkeran jî yekjimar yanî wek hev bibûya. Sedema vê yekê ev e ku lêkerên gerguhêz di demên borî de li gorî kirdeyê nayên kişandin lê ew dikevin bin bandora bireserê û li gorî wê teşe digrin. Ev yek jî ji xwe di zimannasiyê de wekî ergatîvî tê binavkirin.

Li jor lêkera ji ber ergatîvî “hîdayet kirin” pirjimar e çimkî mêjera bireserê pirjimar e. Bi gotineke din; ji ber ku di avahiya ergatîv de bireser xwerû ye mêjera wê naye zanîn. Lewma pêveber pirjimar hatiye kesandin. Herwiha lêkera ‘dan’ vê care yekjimar hatiye kesandin çimkî mêjera biresera wê yekjimar e.

86. ‘‘Bi rastî *muşrikan* ji ber qebûlkirina wan ya Îslamiyetê û bijartina wan ya dînê heq **gelek îşkence dane** Mislîmanan’’ (Şoşîkî, 2014: 264)

Dîsa tevna kirdeya tewandî, biresera xwerû û peywendîya di navbera bireser û pêveberê de derketiye meydanê ku navê vê tevne jî di zimannsiyê de ergatîvî ye. bi qertafa ‘‘-an’’ a ku kirdeyê (*muşrikan*) girtiye hem wê pirjimar kiriye hem jî tewandiye. Lêbelê bireser (**gelek îşkence**) ji ravekê pêk tê. Peyva ‘‘gelek’’ wateya pirjimariyê daye ravekerê. Herwiha pêveber (**dane**) li gorî vê biresera pirjimar hatiye kişandin û bi vî awayî bi hev re ketine nav hevahengiyê.

87. ‘‘Fîlan kes *Îslamê em* ji hev qetandin’’ (Şoşîkî, 2014: 272).

Ji ber ergatîvî kirde (*Îslamê*) bi qertafa ‘‘-ê’’yê hatiye tewandin lêbelê bireser (**em**) xwerû ye. Bi saya van her du rewşên cuda em êdî dikarin kirde û bireserê ji hev bi hêsanî cihê bikin û rê li ber tevliheviya wateyê bigrin. Herwiha mêjera kirdeyê yekjimar, lêbelê ya bireser û pêveberê pirjimar e. Ev jî tê wê wateyê ku pêveber dema hatiye kesandin ji dêvla kirdeyê bi bireserê re li hev kiriye. Lewma pêveber bi qertafa kesane ya bireserê hatiye nimandin û bi vî awayî mêjera bireserê diyar bûye.

88. ‘‘Min **tu** bi xwîşka xwe kirî xwedan şeref, *min ew* li te zewicand, lê *te jî ew* berda’’ (Şoşîkî, 2014: 287).

Di her sê hevokan de jî ergatîvî baş hatiye bikaranîn. Lewra kirde (*min- te*) di rewşa tewandî, lê bireser (**tu- ew**) di ya xwerû de ne û pêveber bi bireserê xwe re li hev kirine. Çimkî pêveber bi qertafên kesane yên bireseran re hatine kesandin û bi vî awayî hem mêjera bireserê û hem jî ya pêveberê diyar bûye. Wek mînak pêvebera ‘‘kirin’’ê ketiye bin bandora bireserê û bi qertafa kesane ya wê yanî bi ya cînavka ‘‘**tu**’’yê hatiye kesandin û bûye ‘‘kirî’’. Wekî din, herwiha cînavka ‘‘**ew**’’ hem ji bo kesê sêyem ê yekjimar û hem jî ji bo yê pirjimar tê bikaranîn. Ji hevoka yekem tê fêhmîkirin ku ev cînavka ku di peywira biresera hevoka duyemîn û sêyemîn de hatiye

bikaranîn yekjimar e. Lêbelê hevoka yekem tunebûya jî me yê vê yekê ji mêjera pêveberê (zewicand – berda) ku gorî kesê sêyem hatiye kesandin fehm bikira. Yanî pêveber di avahiya ergatîvî de li gorî bireserê tê kişandin û bi vî awayî yekjimarî û pirjimariya bireserê radigihîne.

89. “*Îslamê terka nimêjê* di tu haletan de caîz nedêriyaye. Heta **terka wê** di haletê tîrsa li ser nefsê û malê xwe de jî caîz nedêriyaye” (Şoşîkî, 2014: 297).

Kirde (*Îslamê*) qertafa “-ê”yê girtiye û bi vî awayî hem yekjimar bûye hem jî ketiye rewşa tewandî. Wek rêgez, bireser di rewşa ergatîv de xwerû ye lêbelê ji ber ku di vê mînakê de ew ji ravekê pêk tê, raveber qertafa veqetandekê “-a”yê girtiye û raveker jî hatiye tewandin û herdu zayend û mêjera xwe diyar kirine. Êdî em dizanin ku bireser yekjimar e. Herwiha ji ber ergatîvî pêveber li gorî bireserê tê kişandin. Lewma mêjera pêveberê jî yekjimar hatiye nimandin da ku yekjimariya bireserê diyar bibe.

90. “*Xwedê, çawa hûn* hînî edakirina îbadetê kirine ku we berê wisan nizanîbû, wisan îbadetê wî bikin” (Şoşîkî, 2014: 298).

Digel ku kirde hevoka alîkar (*Xwedê*) yekjimar e, lêker (hînî ... kirine) pirjimar e. Bi gotineke din dema ew ji aliyê kesê ve hatiye kişandin kirdeyê ti bandorê li lêkerê nekiriye. Çimkî di kurdiya kurmancî de lêker di bin bandora hêmana xwerû (netewandî) de ye. Di vê mînakê de ji ber avahiya ergatîv hêmana xwerû bireser (**hûn**) e. Lewma lêker bi bireserê re li hev kiriye û qertafa kesane ya cînavka “**hûn**”ê yanî “-in”ê girtiye. Bi vî awayî mêjera bireserê û lêkerê mîna hev pirjimar bûye.

91. “Yan jî bêyî şerr *Xwedê teala ew* mirandin. Paşê ji bo îbretwergirtinê dîsa **ew** sax kirin. Bi vî awayî da ku ew bizanin rev ji qeder û hukmê *Xwedê nabe!*” (Şoşîkî, 2014: 301).

Ji avahiya ergatîv re ev mînakeke baş e. Bireser (**ew**) di rewşa xwerû de ye û lewma mêjera wê nayê zanîn. Vêca wê, pêveber xistiye bin bandora xwe da ku mêjera xwe diyar bike. Bi vî awayî pêveberê (mirandin) qertafa kesane ya pirjimariyê yanî “-in”ê ji bireserê girtiye û wiha mêjera bireserê jî diyar bûye. Yanî

ji pirjimariya pêveber em têdigihêjin ku bireser pirjimar e. Yanî cînavka ‘ew’ ji bo kesê sêyem ê pirjimar hatiye bikaranîn.

92. “Vêca *Xwedê Teala ew* mirandin û paşê dîsa *ew* bi îbret sax kirin” (Şoşikî, 2014: 301).

Bireserên her dû hevokan jî di rewşa xwerû de ne. Lewma ji ber ergatîvî lêkerên mirandin û sax kirin ketine bin bandora biresera xwe û bi qertafa kesane ya vê cînavkê hatine kesandin û bi vî awayî mêjera wan pirjimar bûye. Ev pirjimariya pêveberan nîşan dide ku cînavka ‘ew’ a ku di peywira biresera hevokan de hatiye bikaranîn kesê sêyem ê pirjimar e. Yanî *Xwedê teala* canê ne kesekî lêbelê gelek kesan standiye û paşê ruhê wan li wan zivirandiye yanî ji nuh ve can daye wan û ew sax kirine.

93. “Vêca *Dawud wî cîwanê xurt, Calûtê zalim û zordest* kuşt” (Şoşikî, 2014: 309).

Biresera (*Calûtê zalim û zordest*) hevokê ji ber ku ji ravekê pê tê, ravberê(**Calût**) veqetandeka ‘-ê’ girtiye û zayend û mêjera xwe diyar kiriye. Êdî em dizanin ku bireser yekjimar e. Bireserê ji ber rewşa ergatîvî pêveber xistiye bin bandora xwe. Lewma pêveber jî yekjimar hatiye kesandin. Ji aliyê din kirdeya hevokê (*Dawud*) navdêreke nêrza ye, lewma nehatiye tewandin. Çimkî êdî qismek ji kurdan bi egera sivikkirina zimên dev ji tewandina wan berdidin. Ev bikaranîn her çiqas li gorî rêzikên ergatîviyê şaş be jî berbelav e. Herwiha ji ber ku navdêrên mêza her tim di rewşa oblik (tewandî) de tên tewandin ew ji hev tên cudakirin.

94. “*Dawudî* bi kewkaniya/berkaniya xwe **kevirek** avêt wî, tam li serê wî da û ew li erdê da” (Şoşikî, 2014: 309).

Kirde yekjimar e û di rewşa tewandî de ye. Lê bireser qertafa ‘-ek’ê girtiye û yekjimariya xwe diyar kiriye. “Di rewşa ergativ de bireser dikare qertafen nenasiye bigire” (Baran, 2012: 61). Vêca ji ber ergatîvî pêveber (avêt) ketiye bin bandora bireserê û ew jî yekjimar hatiye kesandin.

95. ‘‘Yanî ya Muhemmed! Ew pêxemberên kîram, ewên ku *me qisseya wan* ji te re vegot, hemû heq û rast in, lêbelê di mertebeyên bilind de *me hinek ji wan ji hinekên din* çêtir girtine. Wek nimûne; wekî Mûsa (e) hinek ji wan hene ku bi xeberdanê *Xwedê* qedrê wan girtiye û *ew* tefdîl kirine’’ (Şoşikî, 2014: 310).

Di hevoka alîkar de kirde (*me*) tewandî û pirjimar e. Lêbelê lêker (vegots) yekjimar hatiye kişandin û wekî ku diyar e ew her du ji aliyê mêjerê ve li hev nakin. Çimkî ji ber ergatîvî pêwendî di navbera bireser û lêkerê de çêdibe û bi vî awayî bireser mêjera xwe bi rêya lêker diyar dike. Her çend ku bireser di ravekê de yekjimariya xwe diyar kiribe jî lêker ne li gorî kirdeya pirjimar, lêbelê dîsa li gorî biresera yekjimar hatiye kişandin. Berevajî vê yekê pêveberên her du hevokên (çêtir girtine - tefdîl kirine) durre tîr pirjimar hatiye kesandin. Çimkî biresera wan pirjimar e û ji ber ergatîvî bireser û pêveber dîsa bi hev re ketine nav ahengiyê lewma mêjera pêveberan pirjimar hatine kişandin.

96. ‘‘Wî bi Îbrahîm (e) re di bara Xwedayê wî de **mucadele** kiriye, ji xwe re **îddiaya Xwedatîyê** kiriye û ji xwe re **hin defîlên xav û rîziyayî** anîne. *Xwedê Teala mulkek mezin* dabûye wî. Lê mixabin, di şûna ku ewjî Xwedayê xwe re şukra wî nîmetê bike, wî **nankorî û tûxyan** kir û har bû’’ (Şoşikî, 2014: 318).

Ji ber ergatîvî kirde di rewşa tewandî de ne. Lewma pêveberan bi biresera xwe re li hev kiriye. Ji bilî biresera lêkera ‘anîn’ pêveberên din xwedî biresera yekjimar in. Ji ber vê yekê mêjera wêpirjimar ên din jî yekjimar hatine kesandin.

97. ‘‘Hatiye rîwayetkirin ku *Nemrûd* **du mirov** girtine, îdam kirine, li ser wan **ev** nivîsandibû; yek ji wan kuşt’’ (Şoşikî, 2014: 319).

Digel ku kirde (*Nemrûd*) yek kes e jî pêveber (girtine, îdam kirine) ji ber ergatîvî ketine bin bandora bireserê û lewma pirjimar hatine kişandin. Lêbelê mêjera pêveberên dur re tîr yekjimar in. Lewre bireser yekjimar in. Pêveber jî li gorî bireserên yekjimar li gorî kesê sêyem ê yekjimar hatine kesandin.

98. “Çawa *Xwedê* bêyî mîsal û bêyî nimûne, **hûn** ji xezîneya xwe ya xeybî anîne wicûdê, anîne alema şihûdê, eynî wisan bi heman terzê yê we li heyatê ewde jî bike, yanî li heyatê vegeerîne” (Şoşikî, 2014: 322).

Avahiya ergatîviyê bi hal û rewşa kirde, bireser û pêveberê re têkildar e. Çimkî kirde û bireser li gorî rewşa ku tê de ne ji hev tîr cihêkirin û pêveber jî li gorî hêmana xwerû tê kesandin. Di vê mînakê de jî bireser (**hûn**) hêmana xwerû ye û pêveber ketiye bin bandora wê û bi qertafa kesane ya vê cînavkê ew jî pirjimar hatiye kesandin.

99. “*Mucahîd* gotiye: Ev teyr, teyrê tawîs, qîjîk, kevok û dîk bûne. Vêca *Îbrahîm* (e) ew serjê kirin; **hestiyên wan, goştê wan, xwîna wan û perên wan** tevî hev kirin, lêbelê **serê wan** li cem xwe hiştin, **perçeyên wan** jî li serê çiyayan belav kirin” (Şoşikî, 2014: 324).

Kirdeya hevoka yekemîn (*Mucahîd*) yekjimar e û ji ber ku ew serenaveke nêrza ye nehatiye tewandin. Herwiha ji ber ku biresera wê nediyar e, lêkera “gotin” yekjimar hatiye kesandin (Hirorî, 2005). Dîsa her çar hevokên dur re tîr jî xwedî heman kirdeya (*Îbrahîm*) yekjimar in. Lêbelê ji ber ergatîvî pêveber bi bireseran re li hev kiriye û lewma ew pirjimar hatine kesandin da ku pirjimariya bireseran ragihîne.

100. “Ev **sûal û ev cewab**, hema hesab bike ku *Îbrahîm* ji ber me temamê muminan ve ji Xwedayê me kirine” (Şoşikî, 2014: 324).

Mêjera kirdeyê (*Îbrahîm*) yekjimar, lêbelê ya pêveber (**kirine**) pirjimar e û wekî ku diyar e li hev naguncin. Herwiha bireser (**ev sûal û ev cewab**) hîç qertafan negirtiye lewma mêjera wê nediyar e. Ji ber vê yekê pêveber (**kirine**) li gorî bireserê pirjimar hatiye kesandin da ku mêjera bireserê diyar bibe. Bi rêya pêveberê em êdî dizanin ku hejmara “**Ev sûal û ev cewab**” ên ku hatine kirin pir in.

101. “*Wî* **hezar deveh digel cil û kurtanên wan** hîbe kirin. Hem jî **Bîra Rewmet ya avê** jî ew wek sedeqe da Mislimanan” (Şoşikî, 2014: 326).

Di vê mînakê de ji bo her du hevokan jî heman cînavka kesane ya tewandî yanî “-wî” wekî kirde hatiye bikaranîn. Digel ku kirde eynî ye û yekjimar e

pêvebera hevoka yekemîn pirjimar ya duyemîn jî yekjimar hatiye kesandin. Sedema vê yekê ev rêgeza ergatîviyê ye ku di avahiya ergatîv de pêveber xwe li ba bireserê digunce. Ji ber ku biresera hevoka pêşîn (**hezar deveh digel cil û kurtanên wan**) pirjimar e pêveber jî pê re li hev kiriye û mêjera xwe jî şibandiye wê. Lê di hevoka paşîn de, wekî ku ji ravekê jî tê fehmkirin, mêjera bireserê (**bîra Rewmet ya avê**) yekjimar e. Lewma pêveber vêca yekjimar hatiye kesandin.

102. ‘‘Ebû Saîd el-Xudrî gotiye: Min dîtîye ku Resulê Xwedê (s) **destê xwe** bi hewayê ve bilind kiriye û ji ‘Usman re dua kiriye û wiha digot: ‘Xwedayê min! ‘Usman kurê ‘Effan **ez razî kirim**, tu jî jê razî bibe.’’ Her wiha jê re **dua kir** heta ku şefeqê avêt’’ (Şoşikî,2014:326).

Di vê mînakê de pêveberên ‘‘ gotiye’’, ‘‘dîtîye’’ û ‘‘digot’’ yekjimar hatinekesandin; çimkî bireserê wan nediyare an jî ji ber ku tenê tiştek hatiye gotin, dîtîn pêveber yekjimar hatine kesandin. Çimkî pêveber di avahiya ergatîv de bi bireserê re ji aliyê mêjerê ve li hev dike û bi qertafa kesane ya bireserê tê kesandin. Wek mînak; di vê hevokê de ‘‘... ‘Usman kurê ‘Effan **ez razî kirim**,’’ jî bireser xwerû ye û pêveber ketiye bin vê cînavka netewandî û bi qertafa kesane ya wê hatiye kesandin da ku mêjera bireserê diyar bibe.

103. ‘‘Yanî mumin dibêjin: Xwedayê me! **Me bang û fermana te bihîst û qebûl kir** û **me îteata emrê te kir**’’ (Şoşikî, 2014:354).

Di vê hevoka veguhastî de digel ku ‘‘kesên karê bihîstinê kiriye, ew qebûl kiriye û îteata emrê yekî kiriye’’ heman kes yanî kesê duyem e. ‘Herwiha pirjimar e. Lê pêveber ne li gorî vê cînavka tewandî lêbelê li gorî bireserê hatine kişandin. Ji ber ku bireser yekjimar e pêveber jî yekjimar hatine kesandin.

3.2. ERGATÎF YAPISININ KURALDIŞI KULLANIMI ÖRNEKLERİ

Kurmanci Kürtçesindeki ergatif dizgesinin en önemli kurallarından biri olan yüklemın nesneye göre çekimlenmesi kuralı bazı durumlarda gerçekleşmez. Molla Muhammed Şoşiki’nin bu istisnai yapıları da aynı ustalıkla kullandığı görülmüştür. Müellifin ‘‘Nura Qelban’’ adlı Kur’an tefsirinin Bakara Suresi bölümünden konuyla ilgili birçok örnek alınıp analiz edildi. Sonra bu örnekler yorumlanıp

değerlendirilerek konunun önemi, kullanımı ve işe yararlılığı tespit edilmeye çalışıldı. Aşağıdakiler ‘‘Nura Qelban’’ adlı Kur’an tefsirinin ergatif dizge örnekleri, onların analizi, yorumu ve değerlendirmesidir.

1. ‘‘Êdî tişteke nedidîtin’’ (Şoşikî, 2014: 44).

Her wekî ku ji mînakê diyar e, pêveber (nedidîtin) lêkereke gerguhêz e û di raweya ‘‘dema boriya berdest’’ (Tan, 2011: 272) de hatiye kişandin. Ji ber vê yekê divîya pêveber li gorî avahiya ergatîv tevbigeriya û li gorî bireserê bihata kesandin. Lêbelê pêveber û bireser ji aliyê mêjerê ve li hev nakin; çimkî bireser (tişteke) yekjimar, lê pêveber pirjimar e. Xuyaye pêveber li gor rêzikên ergatîvî nehatiye kesandin. Vêca em bi rewşeke awarte re rû bi rû ne.

Sedema vê rewşa awarte nediyarbûna kirdeyê ye. Dema kirde kesê sêyem ê pirjimar be û di hevokê de neyê diyarkirin yanî wekî kirdeya veşartî were bikaranîn pêveber li şûna bireserê bi kirdeyê re li hev dike û lewma ew pirjimar tê kesandin da ku kirde bi rêya pêveberê xwe diyar bike. Heger em mînaka jorîn ji nuh ve bi kirdeyê yanî kesê sêyem ê pirjimar binivîsîn dê mabesta me çêtir bê fehm kirin:

Wan êdî tişteke nedidît.

Dema em kirdeyê di hevokê de bi cih dikin em dibinin ku pêveber li gorî avahiya ergatîvî xwe bi bireserê re digunce. Vêca mêjera pêveber yekjimar tê kesandin çimkî bireser yekjimar e. Ji ber ergatîvî peywendiya bireser-pêveber çêdibe.

2. ‘‘Belê mîsala ewwel; *qewmê minafîqan* e, zemanekî bi devkî **Îslama xwe îzhar kirin**’’ (Şoşikî, 2014: 44).

Pêvebera hevokê ‘‘îzhar kirin’’ lêkereke gerguhêz e û di raweya dema borî de pirjimar hatiye kesandin. Lê bireser (**Îslama xwe**) ji ravekê pêk tê û yekjimar e çimkî qertafa ‘‘-a’’yê zayend û mêjera wê diyar kiriye. Li gorî rêzikên ergatîvî divê pêveber yekjimarî û pirjimariya biresera ku ji ravekê pêk tê ragihine. Lê digel ku bireser yekjimar e pêveber pirjimar hatiye kesandin. Serê pêşîn meriv dibe qey şasiyek heye. Lêbelê dema em bala xwe didin hevokê em baş dibînin ku ev hevok bê kirde ye. Ji ber ku kirdeya vê hevokê û ya hevoka berê wê hevpar e cara duyemîn ne

hewceye were dubarekirin. Êdî em dizanin ku kirdeya veşartî kesê sêyem ê pirjimar e. Gava kirdeya kesê sêyem ê pirjimar veşartî were bikaranîn ergatîvî pêk nayê û pêveber xwe li ba kirdeyê digunce û pirjimar tê kesandin da ku nasnameya kirdeya xwe diyar bike. Ji ber vê yekê pêveber li dijî avahiya ergatîviyê hereket kiriye û pirjimar hatiye kesandin.

3. ‘‘Xulesaya mîsala **munafiqan** ev e; **ew** bi devên xwe mumin in û bi dilên xwe kafir in. Wexta bi devkî digot**in**; amenna, feydeyek didît**in**. Eynî wekî berqa li ser munafiqan pêşiya xwe pê didît**in**. Wek nimûne; bi wê kelîmeya diketin sef û rêza Mislimanan, ji wan dizewicîn, **qîzên xwe** didan wan, ji hev **mîras** werdigirt**in**, xenîme werdigirt**in**, di goristana Mislimanan de dihatin definkirin û bi wê kelîmeya tewhîdê selametiya xwe, selametiya malê xwe û zaroyên xwe muhefeze dikir**in**’’ (Şoşikî, 2014: 45-46).

Di hevoka pêşîn de cînavka kesê sêyem ê pirjimar (ew) cihê navdêra ‘‘munafiqan’’ girtiye û ew di peywira kirdeyê de hatiye bikaranîn. Lêbelê kirdeya hemû hevokên din veşartî ye. Ji ber ku kirde di hevoka ewil de hatiye ragihandin êdî ne hewceye were dubarekirin. Lewma kirde di van hevokan de nehatiye bikaranîn. Lêbelê ji ber ku kirde veşartî ye, pêveber ji bo nasnameya kirdeyê diyar bikin qertafa ‘‘-in’’ê girtine yanî li gorî kesê sêyem ê pirjimar hatine kesandin û bi vi awayî peywendî di nav bera kirde û pêveberê de çêbûye. Ev yek jî tê wê wateyê ku pêveber li dijî avahiya ergatîviyê tevdigeriyane, çimkî di vê avahiya de pêveber li gorî mêjera bireserê tê kesandin.

Niha bi mabesta ku mijar zelaltir bibe, em hem van hevokên ku ergatîvî bin pê dikin ji nuh ve bi kirdeyê yanî bi cînavka kesê sêyem binivîsîn. Bi vê yekê em ê çêtir bibînin çawa pêveber diguhere, li gori bireserê teşe digre û tewna ergatîvî bi rêk û pêk derdikeve holê.

a) Wexta bi devkî digot**in**; amenna, feydeyek didît**in**.

Wexta **wan** bi devkî digot; amenna, **wan** feydeyek didît.

b) Eynî wekî berqa li ser munafiqan pêşiya xwe pê didît**in**.

Wan eynî wekî berqa li ser munafîqan pêşiya xwe pê didît.

c) Ji hev **mîras** werdigirtin, xenîme werdigirtin.

Wan ji hev **mîras** werdigirt, xenîme werdigirt.

Xulase, ji ber nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar, pêveber ji dêleva bireserê bi kirdeyê re li hev dike û bi qertafa kesane ya pirjimariyê tê kesandin da ku bi vî awayî nasnameya kirdeyê ragihîne. Çimkî dema kirde kesê sêyem ê pirjimar û veşartî be divê nasnameya kirdeyê bi rêya pêveberê were diyarkirin.

4. “Yanî dema *êgir ronahî* da wan, **hawîrdora xwe û qismek dewrûberên xwe** jî **dîtîn**, vêca zen û gûman kirin ku ewê wisa dewam bike. Ji nişka ve *Xwedê teala nûra wan* bir û **ew** di gellek tarîtiyan de **hiştin**, êdî li ber xwe nema **tişte** **didîtîn**” (Şoşikî, 2014: 44).

Ev nimûne ji bo tevna ergatîvî hem mînakên asayî hem jî yên awarte dihundirîne. Pêşî em em dest bi mînakên asayî bikin:

- *êgir ronahî* da wan
- ji nişka ve *Xwedê teala nûra wan* bir
- (*Xwedê Teala*) **ew** di gellek tarîtiyan de hiştin

Ev her sê hevok jî li gorî rêzikên ergatîviyê rast û dirust in. Ji ber ku biresera (ronahî - nûra wan) lêkera “dan” û “birin” yekjimar in, pêveber jî ketine bin bandora biresera xwe û yekjimar hatine kesandin. Lêbelê ji ber ku biresera lêkera “hiştin” cinavka kesê sêyem ê pirjimar e lêker jî li gorî mêjera wê teşe girtiye û lewma pirjimar bûye. Niha em li mînakên ji bo rewşa awarte binêrin:

- vêca zen û gûman kirin
- êdî li ber xwe nema **tişte** didîtîn.

Her wekî ku diyar e kirdeya van her dû mînakên jî di serê hevokê de nehatiye bicihkirin. Ango kirdeya veşartî hatiye bikaranîn. Ji ber ku kirdeya kesê sêyem ê pirjimar berê hatiye gotin û heman kirde ji bo hevokên li pey tînin jî hevpar e ew êdî nehatiye dubarekirin. Lêbelê nebûna kirdeya kesê sêyemê pirjimar nahêlê ku

lihevhatina bireser û pêveber çêbibe û ev yek tevna ergatîvî ji holê radike. Çimkî pêveber ji bo ku kirdeya pirjimar eşkere bike li gorî kirdeya pirjimar tê kesandin. Ziman ji bo kirdeya hevokê diyar bibe û ji alozîyê xelas bibe barê ragihandina kirdeyê dide pêveberê û lewma ergatîvî pêk nayê. Her wekî di mînaka b) yê de jî tê dîtîn digel ku bireser yekjimar e jî pêveber pirjimar hatiye kesandin û ev yek jî tê wê maneyê ku pêveber bi bireserê re li hev nekiriye û ergatîvî ji holê rabûye.

Heger pêveber bi kirdeyê re li hev neke û pirjimar neyê kesandin lêbelê ew li gorî rêzikên ergatîvî bikeve bin bandora bireserê vêca wateya hevokê diguhere û têkiliya hevokê bi yên din re qut dibe çimkî kirde vedigere ser kesê sêyem ê yekjimar. Wek mînak:

- vêca zen û gûman kir.
- êdî li ber xwe **nema tiştek didît**.

Her wekî ku ji mînakan diyar e kesê ku çalakiyan kiriye yanî zen û gûman kiriye û tiştek dîtiye êdî yek kes e. Bi vî halî êdî ev hevok bi hevokên li pêş û paş wan tîn li hev nakin. Ev yek jî baş nîşanê me dide ku ev qalibê awarte yê ku pêveber di nebûna kirdeya kesê sêyem de pirjimar tê kesandin çiqas girîng e û bi kêrî me tê. Niha em hevokan ji nuh ve bi kirdeya wan binivîsînin. Bala xwe bidin pêveberê ka çawa diguhere û vedigere ser peywendiya bi bireserê re:

- **Wan** vêca zen û gûman kir.
- **Wan** êdî li ber xwe **nema tiştek didît**.

Çer ku em kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de bi cih dikin vê care ergatîvî disa xwe dide der.

5. ‘‘Paşê wan **xwe** hew **dît** û ketin tarîtiyê û qeleq, teheyur û îzdirab li ser wan musellet bû, *qudreta îlahî ew* hildan binê çenbera hukmê xwe’’ (Şoşîkî, 2014: 45)

Di vê nişeyê de tenê hevokerê gerguhêz heye. Em ê niha wê analîz û şîrove bikin. Di hevoka ‘‘ Paşê wan **xwe** hew **dît**’’ de kirde (*wan*) pirjimar û tewandî ye. Lê pêveber (**dît**) yekjimar e. Gelek balkêş e ku pêveber bi kirdeyê re li hev nake çimkî mêjera wan ji hev cuda ye. Bireser cînavka vegerok (*xwe*) e. Ji ber ku ev cînavk ji

aliyê mêjerê ve yekjimar tê hesibandin, pêveber jî pê re li hev kiriye û lewma yekjimar hatiye kesandin.

6. “*Wan xisar kiriye, hîdayet dane di şûna wê de delalet kirrîne, mexfîret dane bi gunehan, cennet dane bi cehennemê; pêkanîna sozê dane bi sozşikandinê, sileya rehmê dane bi qutkirina lêzimtiyê û îslahkirin dane bi îfsadkirinê”* (Şoşikî, 2014: 57-58).

Di hevoka serî de ji ber ku ji aliyê kirdeyê ve tiştek tenê hatiye îfade kirin û vegotin pêveber li gorî rêzikên egatîvî tevgeriyaye û yekjimar hatiye kesandin. Lê di hevokên li du wê tîgê digel ku bireser (hîdayet, delalet, mexfîret, cennet, pêkanîna sozê, sileya rehmê, îslahkirin) yekjimar in jî pêveberên wan pirjimar in. Lewma avahiya ergatîvî li vir bi rêk û pêk bi cih nehatiye. Vêca dema em li ser sedamên vê aloziyê hûr dibin em dibînin ku kirdeyên van hevokan veşartî ne. Ji ber ku kirdeyên van hevokan û a hevoka serî heman kirde ye ev hevok bê kirde hatine bikaranîn. Lewma “*Nebûna kirdeyê ku kesê sêyem ê pirhejmar e wî barî dide lêkerê ku nasnameya kirdeya xwe ragihîne*” (Aydoğan, 2013: 84-85). Çimkî nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di avahiya ergatîv de dikare wateya hevokê tevlihev bike, lewma pêveber bi bireser re nakeve nav ahengiye lê bi rêya qertafên kesane kirdeya kesê sêyem ê pirjimar diyar dike. Ji ber vê yekê pêveber li gorî bireserê nayê kişandin û ergatîvî bi vî awayî ji holê radiibe.

Lê niha em van hevokên bê kirde bi kirdeyê wê yanî bi cînavka kesê sêyem ê pirjimar ji nuh ve binivîsînin û bala xwe bidin bê ka çawa hevok li gorî ergatîvî vedigere ser peywendîya bireser û pêveber:

- **WAN hîdayet daye,**
- **WAN delalet kirrîye,**
- **WAN mexfîret daye bi gunehan,**
- **WAN cennet daye bi cehennemê,**
- **WAN pêkanîna sozê daye bi sozşikandinê,**
- **WAN sileya rehmê daye bi qutkirina lêzimtiyê**
- **WAN îslahkirin daye bi îfsadkirinê.**

Her weki ku ji minakên jorîn diyar e, dema kirdeya pirjimar di hevokê de tê bicihkirin, ji ber ergatîvî pêveber bi biresera xwe re li hev dike. Vêca ji ber ku bireser yekjimar in pêveber jî vedigerin ser yekjimariyê. Herwiha minakên jorîn tiştêkî dinê jî nîşanê me dide: Eger di nivîs û axaftinan de ev kirdeya pirjimar a ku ji bo çend hevokên ku kirdeya wan hevpar e her carê were dubarekirin dê ziman bê reng û ruh û girantir bibe. Carinan ziman kaîdeya *teserrûfa zimanî* dixê dewrê û bi vê yekê ji dêleva avahî û bêjeyên giran û tevlihev ên rehet û siviktir hildibijêre. Dîvê ev yek neyê jibîrkin. Ji xwe diyar e ku ev avahiya awarte ya ku di tevna ergatîviyê de derketiye holê ji bo qenckirin û hêsanîkirina zimên roleke baş dilîze.

7. “Bi vî awayî *Xwedê teala* **destên me** ji vê şirkê **şuşt** û berê me da ezameta xwe” (Şoşîkî, 2014: 19).

Ji ber ku “destên yekî/ê ji... şuştin” lêkereke biwêjî ya bidaçek e ew li gorî zagonên ergatîvî hereket nake yanî peywendiya di navbera bireser û pêveberê xwe nade der. Lêbelê lêkerên bi vî rengî her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin. Li vir jî heman qalibê awarte karîger e.

8. “Vêca *wesweseya wî* zora wan bir, heta jê **xwarin** û **ew** ji wê nîmeta ku tê de bûn **deranîn**” (Şoşîkî, 2014: 67).

Pêvebera hevoka yekemîn (zora wan bir) lêkereke biwêjî ye. Digel ku kirdeya lêkerên biwêjî yê bidaçek tê tewandin, ew cûre lêker her tim li gorî kirdeya kesê sêyem tên kişandin. Ji ber ku pêvebera vê hevokê jî lêkereke biwêjî ye kirdeya wê li gor vê avahiya awarte hereket kiriye û yekjimar bûye. Lêbelê pêvebera hevoka duyemîn (**xwarin**) pirjimar e. Herwiha ev lêker *xwedî* kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar e. Dema ev kirde di hevokê de nepen be avahiya ergatîvî hildiweşe. Çimkî êdî pêbever bi birerê re li hev nake. Yanî nebûna kesê sêyem ê pirjimar nahêle ku ergatîvî derkeve holê. Di vê hevokê de jî heman rewşa awarte derketiye holê: Pêveber ketiye bin bandora kirdeya veşartî ya pirjimar û di encamê de pirjimar bûye da ku nasnameya wê diyar bike.

Di hevoka dawîn de jî kirde nehatiye bikaranîn. Lê ev kirde ne mîna ya hevoka berê ye. Lewre ev kirdeya veşartî yekjimar e û li vir avahiya ergatîviyê serdar

e. Ji xwe dema em li hevokê dinêrin bi bi hizreke mentiqê têdigihêjin ku kesê weswese daye wan û ew ji cennetê deranîne şeytan e. Êdî em dizanin ku kirdeya veşartî ya vê hevokê *şeytan* e. Herwiha ji ber ku kesên ku wî weswese daye *H.z. Adem û Hewwa* ne. Êdî em dizanin ku cînavka “ew” ya ku di peywira biserê de ye kesê sêyem ê pirjimar e. Yanî kirde yekjimar, lê bireser pirjimar e. Lewma lêkera ‘deranîn’ ji ber qaîdeyên ergatîviyê ketiye bin bandora bireserê û di encamê de vê biresera pirjimar pêveber bi qertafa xwe nimandiye û mêjera wê jî mîna ya xwe pirjimar kiriye.

9. “Vêca *Xwedê têala rexne li wan girt û ew şermezar kirin*” (Şoşikî, 2014: 72).

Her du pêveber jî gerguhêz in û li gorî raweya dema borî hatine kişandin. Ji xwe ergatîvî ev qaîdeya rêzimanê ye e ku piştî hebûna van her du şertan, pêveber li yekjimarî û pirjimariya bireserê teşe digre. Lê digel ku biresera her du hevokan jî eynî ne yanî kesê sêyem ê pirjimar in, pêvebera hevoka pêşîn yekjimar, lê ya din pirjimar hatiye kesandin. Li gorî rêzikên ergatîviyê diviya her dû jî pirjimar bûna. Diyar e ku li vir rewşeke awarte heye. Lêkera ‘rexne li yekî/ê girtin’ lêkerekê hevedudanî ya bi daçeka ‘li’ hatiye çêkirin. Wek rêgez hin lêkerên bi daçek li gorî rêzikên ergatîviyê tevnagerin, lêbelê ew li gorî kesê sêyem ê yekjimar tîne kesandin. Lewma pêvebera hevoka yekemîn yekjimar e.

Lê pêvebera hevoka duyemîn jî (şermezar **kirin**) lêkerekê hevedudanî ye, lêbelê ne xwedî daçek e, lewma li gorî rêzikên ergatîviyê hereket kiriye û ew ketiye bin bandora bireserê. Ji ber ku bireser pirjimar e mêjera wê jî pirjimar hatiye kesandin.

10. “Lewra *wan zulm ne li me kir, lêbelê zulm li xwe bi xwe kirin*” (Şoşikî, 2014: 81).

Kirde û pêvebera her du hevokan jî eynî ne. Lêbelê di hevoka yekemîn de pêveber yekjimar lê di ya din de pirjimar hatiye kesandin. Hal ev e ku helwesteke awarte ya zimên li dar e. Lêkera ‘zulm li yekî/ê kirin’ lêkerekê hevedudanî ya bi daçek e. Lewma avahiya ergatîvî bi temamî neçûye serî. Peywendiya pêveber û

bireserê ji hev qut bûye û di vê rewşê de bi kirdeyê re jî nakeve nav peywendiyê. Lêbelê ev pêvebera xwedî daçek li gorî qalibêke cuda yanî li gorî kesê sêyem ê yekjimar hatiye kesandin. Herwiha heman lêker dur re pirjimar hatiye kesandin. Gelo çima wiha bûye? Em li vir rastî rewşêke awarte ya din tînin. Qalibê ku lêkerên bi daçek dikevinê li vir ji holê rabûye. Çimkî heman pêveber xwedî kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar e. Bi gotineke din, ji ber ku ev her du hevok li dûv hev hatine û kirdeya kesê sêyem ê pirjimar (*wan*) hevpar e, hevoka duyemîn bê kirde hatiye bikaranîn. Lewma, di rewşa nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar de, ziman wî barî dide pêveberê ku li gorî kirdeyê were kesandin û mêjera xwe pirjimar bike da ku bi vî awayî nasnameya kirdeya veşartî diyar bike.

11. “Êdî her kesê ku ew didîtin ji wan nefret dikir” (Şoşikî, 2014: 92).

Ji ber ergatîvî bireser (*ew*) di rewşa xwerû de ye û lêkera “dîtin”ê ketiye bin bandora hêmana xwerû yanî bireserê û li gorî wê teşe girtiye. Li vir girîngiya avahiya ergatîvî dertê meydana. Em ji pirjimariya vê lêkerê fehm dikin ku bireser ne cînavka kesê sêyem ê yekjimar e lêbelê pirjimar e. Yanî pêveberê mêjera bireserê ragihandiye an na ji ber ku bireser di rewşa xwerû de ye mêjera wê nedihat zanîn.

Lêbelê lêkera “ji yekî/ê nefret kirin” digel ku mîna lêkera “dîtin”ê gerguhêz e û raweya wê jî dema borî ye li gorî ergatîvî hereket nekiriye. Çimkî ew xwedî daçek e. Hin lêkerên xwedî daçek her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tînin kesandin û ergatîvî di xwe de nîşan nadin. Lewma lêkera bidaçek li vir jî yekjimar hatiye kesandin. Tiştê herî balkêş jî ev e ku ev hevok xwedî kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar e. Wek rêgez di rewşa kirdeya kesê sêyem ê pirjimar de lêker bi kirdeyê re li hev dike û her tim pirjimar tînin kesandin da ku nasnameya kirdeya xwe diyar bike. Lêbelê li vir ev qayide pêk nehatiye çimkî hevoka me xwedî lêkereke bi daçek e.

12. “Beyana sebebê kufra wan dixuye ku wan ji îmanê nefret dikir” (Şoşikî, 2014: 118).

Lêkera bi daçek “ji yekî/ê nefret kirin” li vir yekjimar hatiye kesandin. Çimkî hevokên xwedî hin lêkerên bi daçek ne li gorî kirdeyê ne li gorî bireserê tevdigerin.

Lêbelê ew her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tèn kesandin. Li vir jî ev qalibê awarte serdar e.

13. “Vêca ew hatin cem Mûsa(s) û hîkaye û serbihuriya xwe jê re eşkere kirin” (Şoşikî,2014:93).

Pêvebera ‘hatin’ ji ber ku negerguhêz e li gorî kirdeyê teşe girtiye. Lewma em ji qertafa kesane ya pirjimariyê “in” a ku pêveber girtiye fehm dikin ku kirde (ew) kesê sêyem ê pirjimar e. Êdî kirde li vir diyar bûye û ji ber ku kirdeya hevoka duyemîn jî heman kirde ye ew careke din ji bo wê nehatiye dubarekirin yanî kirdeya wê vaşartî ye. Lêbelê pêvebera wê (eşkere kirin) ji ber ku gerguhêz e, diviya bi biresera xwe re li hev bikira û wek wê yekjimar bihata kesandin. Lê pêveber mîna hevoka ewil bi kirdeyê re ketiye nav ahengiyê û lewma pirjimar hatiye kesandin. Hal ev e ku pêveber li gorî rêzikên ergatîviyê tevnegeriyaye û ergatîvî ji holê rabûye. Sedema vê rewşa awarte ev e ku eger kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de neyê bicihkirin, pêveber li şûna bireserê bi kirdeyê re li hev dike û pirjimar tê kesandin da ku kirdeyê diyar bike. Çer ku em kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de bi cih dikin pêveber dîsa vedigere ser pêywendiya bireser- pêveberê:

Vêca ew hatin cem Mûsa(s) û wan hîkaye û serbihuriya xwe jê re eşkere kir.

14. “Vêca ew serjê kirin, hin ji goştê wê li bedena yê kuştî dan, ew rabû ser xwe. Vêca qatil nexistin waris û mal nedanê. Li gorî rîwayetekê jî ew girtin û kuştin” (Şoşikî, 2014: 93).

Di vê nimûneyê de ji bilî lêkera ‘rabûn’ ê hemû lêker gerguhêz in û dem jî dema borî ye. Bireser (ew, goştê wê,qatil,mal, ew) bi giştî yekjimar in, lêbelê pêveber pirjimar in. Yanî ergatîvî pêk nehatiye lewre mêjera bireser û pêveberan li hev nakin. Ji ber ku ev hevokên gerguhêz hemû bê kirde ne ango kirdeya veşartî hatiye bikaranîn pêveber mecbûr dimîne ku bi kirdeyê re li hev bike û bi rêya nîşandeka pirjimariyê dive xwe diyar bike. Vêca em ji nîşandekên pirjimariyê yên ku pêveber girtine fehm dikin ku kirde kesê sêyem ê pirjimar e. Çimkî gava kirdeya kesê sêyem ê pirjimar neyê gotin pêveber êdî bi bireserê re li hev nake lêbelê ew li gorî kirdeya pirjimar teşe digre. Bi vî awayî kirde xwe dîyar dike.

Divê neyê jibîrkin ku dema kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de were bicihkirin pêveber vedigere ser lihevhatina bi bireserê re û ergatîvî derdikevê holê. Wek mînak em dikarin hevokên jorîn wiha bi kirdeyê bidin:

- Vêca WAN ew **serjê kir**
- WAN hin ji goştê wê li bedena yê kuştî **da**
- Vêca WAN qatîl **nexist** waris û WAN mal **nedayê**
- Li gorî rîwayetekê jî WAN ew **girt û kuşt**

15. “Vêca çi dema ku nêrîn ku wa ye Mûsa (e) ciddî ye, pîrsa wesf û salixên çêlekê jê kirin. Bê lîzûmî gelek sual jê kirin” (Şoşîkî, 2014: 93).

Hevokên vê nimûneyê bê kirde ne yanî kirdeya veşartî hatiye bikaranîn. Ji qertafên kesane yê pêveber girtine tê fehm kirin ku ev kirdeya veşartî kesê sêyem ê pirjimar e. Lewma ji bo nasnameya kirdeyê diyar bibe pêveber pirjimar hatine kesandin û di encama vê helwestê de tevna ergatîvîyê derneketiye holê. Eger em bixwazin bi kirdeya kesê sêyem ê pirjimar hevokan ji nuh ve ava bikin vêca peywendiya bireser û lêker xwe dide der:

“Vêca çi dema ku WAN nêrî ku wa ye Mûsa (e) ciddî ye, WAN pîrsa wesf û salixên çêlekê jê kir.”

16. “Lêbelê wan dîsa bi vê cewabê îktifa **nekir** û ketin pey sûalan û jê **xwestin** ku hin sîfet û salixên wê hîn zehftir ji wan re eşkere bike û bi berdewamî jê re wiha **gotin**” (Şoşîkî, 2014: 94).

Kirdeya hevoka ewil kesê sêyem ê pirjimar (*wan*) e û di rewşa tewandî de ye. Lêbelê pêveber yekjimar e, çimkî ji ber ergatîvî ew li gorî bireserê hatiye kişandin. Tişteke balkêş hatiye serê pêvebera ‘**xwestin**’ û ‘**gotin**’ê. Lewre ji ber ku kirdeya van pêveberan jî kesê sêyem ê pirjimar e, hevok bê kirde hatine sazkirin û kirde bi rêya qertafa kesane ya pirjimariyê xwe di pêveberan de diyar kirine. Lewma ji ber kirdeya veşartî ev pêveber li gorî kesê sêyem ê pirjimar hatine kesandin da ku bi vî awayî kirde diyar bibe.

17. “Lêbelê ji ber giraniya bihayê wê nêzik bû ku dîsa ew serjê nekirana” (Şoşikî, 2014: 96).

Mêjera lêkera ‘serjênekirin’ pirjimar e. Lê biresera wê (ew) yekjimar e çimkî cînavka ‘ew’ê ji dêvla navdêra ‘çêlekek’ê hatiye bikaranîn. Yanî pirjimariya lêkerê ji bireserê nayê. Ev jî tê wê wateyê ku mêjera pêveber û bireser li hev nakin û ergatîvî ji holê rabûye. Dema em li ser sedema vê yekê difikirin em dibînin ku ev hevok bê kirde ye lewma pêveber têkiliyê bi bireserê re çênekirîye. Lêbelê ew li gorî kirdeya veşartî yanî kesê sêyem ê pirjimar hatiye kesandin. Bi saya vê yekê jî kirde eşkere bûye.

18. “Lewra wan bi neseb û kalên xwe yên berê îftixar dikir û kirina bavên xwe û kalên wan bi wan xweş bû” (Şoşikî, 2014: 96).

Kirdeya hevokê (wan) di rewşa tewandî de ye. Digel ku biresera hevokê jî pirjimar e pêveber yekjimar hatiye kesandin. Ev yek jî li rêgezên ergatîviyê nake. Xuyaye ku rewşeke awarte heye. *Di hin lêkerên bidaçek de, rewşa ergatîviyê rewşeke awarte ye. Her çi qas ev lêker gerguhêz bin jî, lê biresereke rasterast (yekser) ji wan re nîne. Di demên borî de hem kirde hem jî bireser tewandî ye, lêker yekjimar tê kişandin, ne li gorî kirde û ne jî li gorî bireserê. Ji ber ku pêvebera vê hevokê yanî “bi (pê) îftixar kirin” jî lêkereke bidaçek e ergatîvî pêk nehatiye.*

19. “Bi rastî cemaetek ji wan hebû ku **kelamê Xwedê teala** dibihîst, piştî ku ew fehm dikirin bi zanabûn ew diguherandin.” (Şoşikî, 2014: 99).

Em ji hevokên vê nimûneyê fehm dikin ku peyva “**kelamê Xwedê teala**” biresera hevpar a ji bo hemû hevokan e û cînavka “ew” di şûna wê de hatiye bikaranîn. Lewre ev cînavka xwerû kesê sêyem ê yekjimar e. Lêbelê pêveber pirjimar in û ev yek jî li rêzikên ergatîviyê nake. Çimkî cînavka kesê sêyem ê pirjimar wekî kirdeya veşartî hatiye bikaranîn. Nebûna vê kirdeyê rê li ber hevahengiya bireser û pêveberan girtiye yanî nehiştiye ku ergatîvî pêk were. Li şûna vê yekê pêveber pirjimar hatine kesandin da ku nasnameya kirdeya veşartî diyar bibe. Eger ev rewş û qalibê awarte bi cîh neye lêbelê li gorî avahiya ergatîviyê

pêveber bi biresera xwe ya yekjimar re li hev bike wê çaxê dê kirde vedigere ser kesê sêyem ê yekjimar.

➤ ‘.... piştî ku ew fehm DIKIR bi zanabûn ew DIGUHERAND’

Ji vê nîşeyê xuya ye ku kesê çalakî pêk anîne yek e. Lêbelê di rastiyê de kirde kesê sêyem ê pirjimar bû. Wek encam em bi awayekî pir zelal dibînin ku her çiqas tevna ergatîvî ji holê rabe jî ev qalibê nuh û awarte yê ku ziman pejirandiye gelek pêwîst û karîger e.

20. ‘‘Qur’ana pîroz di ayetên pêşî de **behsa** nîmetên Xwedê teala yên li ser qewmê Îsrâîlî **dikir**, wek nimûne; çêtirîya wan ya ji alemê, rizgarbûna wan ya ji behrê, ji wan re şandina gezo û selwayê, pişt re **behsa** cezakirina dijberan û qebûlkirina tobeyê **kir**’’ (Şoşîkî, 2014).

Lêkera ‘‘behsa...kirin’’ tevî ku lêkereke gerguhêz e di avahiya ergatîvê de xwedî helwesteke awarte ye. Çimkî her çiqas kirde di rewşa tewandî de be jî ew her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin. Di nîşeya jorîn de jî du caran bi vê awayê awarte hatiye bikaranîn.

21. ‘‘Yanî ewên ha, **nîmetên axretê** dane û di şûna wan de **heyata dinyayê** kirrîne. Bi vî awayî çendan ji cihetê zulm û êrîşkariyê ve be jî wan **para pertalên dinyayê** ji xwe re wergirtiye. Ew li ser lutf û nîmetên baqî yên ku xasê bi alema axretê re ne, tercîh kirine’’ (Şoşîkî, 2014: 114).

Mêjera kirdeyê (ewên ha) pirjimar e. Ji ber ku lêkera ‘‘dayîn’’ xwedî biresereke (**nîmetên axretê**) pirjimar e, pêveber li gorî mêjera bireserê teşe girtiye û pirjimar bûye. Lêbelê her çend ku bireser (**heyata dinyayê**) yekjimar be jî lêkera ‘‘kirrîn’’ pirjimar hatiye kesandin. Ev yek jî rê li ber rewşeke awarte vekiriye û avahiya ergatîviyê pêk nehatiye. Lewre pêveber ji bo nasnameya kirdeya veşartî eşkere bike, bi kirdeyê re li hev kiriye û pirjimar bûye. Herwiha hevoka dawîn jî bê kirde ye. Pêveber di vê rewşê de barê diyarkirina nasnameya kirdeyê digre ser xwe û lewma li şûna bireserê li gorî kirdeya veşartî ya ku kesê sêyem ê pirjimar e, hatiye kesandin.

22. “Belê exlaq û û tebîetê Yehûdiyan ev bû: Çi dema pêxemberek ji wan re bihata şandin, wî ji wan re hukmek/şerîeteke îlahî bianiya, vêca heke ev hukim, ne li gorî arzûyên nefsa wan bûya, îman pê nedianîn, xwe mezin dikirin û bi neheqî tekzîba wî dikirin” (Şoşikî, 2014: 116).

Di vê mînakê de lêkerên ‘îman pê anîn’, ‘mezin dikirin’ û ‘tekzîba yekî kirin’ xwedî biresereke yekjimar in, lê ew li gorî rê û rêzikên ergatîviyê tevnegeriyane lewre ew pirjimar hatine kesandin. Ev rewşa awarte ji ber bikaranîna kirdeya veşartî derketiye holê. Dema kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de neyê bicihkirin, pêveber bi armanca diyarkirina nasnameya kirdeyê li gorî kesê sêyem ê pirjimar tê kesandin. Çer ku em van lêkeran bi kirdeya wan re bi kar tînin rewşa awarte ji holê radibe û li gorî avahiya ergatîviyê yekjimar tên kesandin:

- **Wan** îman pê nedianî.
- **Wan** xwe mezin dikir.
- **Wan** bi neheqî tekzîba wî dikir.

23. “Lewra li hemberî sefa pêxember û îzhara mûcîzeyan ev îsyan û înad dikirin” (Şoşikî, 2014: 118).

Her wekî diyar e kirde di hevokê de nehatiye bikaranîn. Lewra dema em pîrsa “kê” ji pêveberê dikin em bersiva “wan”ê digrin ku ev jî tê wê wateyê ku ew li gorî kirdeya veşartî kesê sêyem ê pirjimar hatiye kesandin. Ergatîvî ji holê rabûye çimkî eger pêveberê li gorî bireserê teşe bigirta wê demê kirdeya veşartî bi ti awayî nedihat zanîn. Bi saya vê lihevhatinê nasnameya kirdeya veşartî tê radigihandin.

24. “Çira **nefsa xwe** bi kufrû înkare firotime?” (Şoşikî, 2014: 119).

Raveka “**nefsa xwe**” di peywira bireserê de hatiye bikaranîn û yekjimar e. Lêbelê pêveber (firotime) pirjimar û gerhuhêz e û dem jî dema borî ye. Bi gotineke din ergatîvî bi cih nehatiye. Çimkî kirdeya hevokê veşartî ye û kesê sêyem ê pirjimar e. Di vê rewşê de pêveber li gorî kirdeyê tê kesandin da ku bi vî awayî nasnameya kirdeyê diyar bibe. Niha jî em kirdeyê di hevokê de bi cih bikin û bala xwe bidin pêveberê ka çawa vegeriye ser lihevhatina bi bireserê re.

Çira **WAN** **nefsa xwe** bi kufr û înkare firotiye?

Her wekî ku tê dîtîn bi bi cih kirina kirdeya pirjimar ya kesê sêyemê pirjimar pêveberê xwe li ba bireserê guncand û ji bo diyarkirina mêjera bireserê ew yekjimar bû. Bi vî awayê jî tevna hevokê vejeriya ser ergatîviyê.

25. “Ji ber hesûdî û zalimtiya xwe, ji ber ku *Xwedê teala* ji fedl, kerem û îhsana xwe **Qur’an** ji Muhammed Pêxemberî (s) re şandiye xwarê, çavnebarî ji vê kirine, hesûdî ji vê kirine ku çima **pêxembertî** ji ewladên Îshaq (e) re jî şandiye, *wan pê îman neanî û înkare kirin*” (Şoşikî, 2014: 119).

Peyva “**Qur’an**”ê bireserê lêkera “şandin”ê ye û di rewşa xwerû de ye. Lewma lêker ketiye bin bandora wê û ji ber ku ew yekjimar e lêker wekî “şandiye” yanî yekjimar hatiye kesandin. Her wiha dîsa pêveberên “şandiye” û “**pê îman neanî**” jî her wekî ku tê dîtîn yekjimar hatine kesandin. Çimkî wan jî ji ber ergatîvî bi biresera xwe re li hev kiriye. Yanî ji ber ku biresera wan ango peyva “**pêxembertî**” yekjimar e, ev her du lêker jî yekjimar hatine kesandin.

Lêbelê mêjera pêveberên binîxêz kirî pirjimar in. Her çiqas biresera wan jî yekjimar be ew li gorî avahiya ergatîviyê tevnegeriyane. Çimkî kirdeya van her sê lêkeran jî veşartî ye û wek rêgez, nebûna kirdeya kesê sêyemê pirjimar nahêle ergatîvî pêk were. Lewre ziman ji bo nasnameya kirdeya veşartî ragihine ji dêvla ergatîviyê ji xwe re qalibêke din afirandiye û lewma pêveber pirjimar hatine kesandin.

26. “*Wan* bi hesûdiya xwe, **xwe kirine** musteheqê kufr û naletê” (Şoşikî, 2014: 119).

Biresera hevokê cînavka “xwe” ye. Ji ber ku ev cînavk yekjimar tê bikaranîn di avahiya ergatîviyê de lêker jî divê yekjimar bê kesandin. Lêbelê li vir pêveber (kirine) pirjimar e çimkî kirdeya kesê sêyemê pirjimar ji bo lêkera “kirin”ê nehatiye gotin. Lewma ji bo diyarkirina nasnameya vê kirdeyê pêveber pirjimar tê kesandin.

27. “**Wan** daîm **ev** digot û **ew** soz didan û gef li wan dixwarin” (Şoşikî, 2014: 118).

Kirdeya hevoka ewil di rewşa tewandî, lê birasera wê di ya xwerû de ye û lewma ji ber ergatîvî pêveber ketiye bin bandora hêmana xwerû û yekjimar hatiye kesandin. Ev yek jî tê wê wateyê ku mêjera bireserê yekjimar e. Lêbelê hevokên binî xêzkirî ji ber ku li pey hevoka pêşîn hatine û kirdeya wan hevpar yanî kesê sêyem ê pirjimar e, kirdeya wan nehatiye gotin. Vêca ji bo nasnameya vê kirdeya kesê sêyem ê pirjimar diyar bibe pêveber li gorî kirdeya pirjimar hatiye kesandin û lewma mêjera wê jî pirjimar bûye. Ev lihevhatina di navbera kirde û pêveberê avahiya ergatîviyê di van her du hevokan de xera kiriye.

28. “Lewra Xwedê teala nalet **li kafirên wan anîye** û **ew** ji rehma xwe dûr kirine!” (Şoşikî, 2014: 120).

Lêkerê “nalet **li...**(lê) anîn” yek ji lêkerên bidaçek e ku ew li gorî ergatîviyê tevnagere lêbelê her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin. Her wekî ku diyar e di vê nimûneyê jî bi awayê yekjimar derketiye pêşberî me ku ew jî rast e. Lêbelê lêkera hevedudanî “dûr kirin” li gorî rewşa ergatîviyê hereket kiriye. Lewra bi biresera xwe re li hev kiriye û ji ber ku bireser pirjimar e ew jî bi qertafa kesane ya bireserê pirjimar hatiye kesandin.

29. “Yanî wan *Cihûyan ew qismê Tewratê* yên ku salix û sifetên Resûlullah (s) di wan de hebû, guherandin, jê derxistin. Meazellah! Wisan bi xwînsarî û hêsanî **ev yek pêk anîn**, her wekî ew hîç nizanibin guherandina Tewratê wan dibe kufrê jî” (Şoşikî, 2014: 129).

Pêveberên “guherandin”, “jê derxistin” û “pêk anîn” her wekî ku diyar e xwedî kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar in û digel ku biresera wan yekjimar e ew pirjimar hatine kesandin. Sedema vê rewşa awarte nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar e. Piştî ku ew kirde di hevoka yekemîn de hatiye diyarkirin ji bo ku kirde hevpar e bi hevokên li pey wê tîn re ew nehatiye gotin. Ji ber vê yekê diyarkina nasnameya kirdeya veşartî ketiye stûyê pêveberan. Lewma ew pirjimar hatine kesandin.

30. “Paşê **iftirayeke mezin** avêtin Suleyman Pêxember û gotin: di dawiya emrê xwe de murted bûbû, ji bo razîkirina jinên xwe yên pûtperest wî **pût dihebandin**” (Şoşikî, 2014: 132).

Her wekî diyar e mêjera pêvebera hevoka yekemîn pirjimar e. Çimkî kirdeya veşartî ya kesê sêyemê pirjimar nehatiye bikaranîn. Lewma ji bo nasnameya wê diyar bibe pêveber pirjimar hatiye kesandin. Di eslê xwe de hevok bi kirdeya pirjimar wiha ye: “Paşê WAN **iftirayeke mezin** avêt Suleyman Pêxember”

Heke ev qalibê awarte pêk nehata û hevok li gorî bireserê bihata kişandin dê wateya hevokê biguheriya û bihata wê maneyê ku kirde kesê sêyem ê yekjimar e. Lewma nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar pêveberê mecbûr dike ku pirjimar bibe û bi vî awayî nasnameya wê diyar bike.

Lêbelê hevoka dawîn li gorî avahiya ergatîviyê teşe girtiye. Kirde tewandi ye, lê bireser di rewşa xwerû de ye û ti zayend û mêjer diyar nake. Lewma ji bo mêjera bireserê diyar bibe pêveber (**dihebandin**) li gorî hêmana xwerû yanî bireserê teşe girtiye û pirjimar bûye. Ji mêjera pêveberê em fehm dikin ku bireser pirjimar e yanî hejmara pûtan ji yekî zêdetir e.

31. “Yanî **îlmê sêhrê** hînî mirovan dikirin, hem jî **mirov** hînî wê sêhrê dikirin” (Şoşikî, 2014: 132).

Bireser ji raveka “**îlmê sêhrê**” pêk tê û yekjimar e. Lêbelê pêveber pirjimar e. Çimkî kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de nehatiye gotin ev jî bûye sedem ku pêveber pirjimar were kesandin û bi vî awayî nasnameya wê diyar bibe. Heman rewş di hevoka duyemîn jî tê dîtîn. Niha em heman mînakê bi kirdeya wê re binivîsînin û bala xwe bidin bê ka tevna hevokê çawa diguhere.

Yanî WAN **îlmê sêhrê** hînî mirovan dikir, hem jî WAN **mirov** hînî wê sêhrê dikirin.

Wekî ku tê dîtîn, dema em kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokan de bi cih dikin pêveber xwe li ba bireserê digunce û ergatîvî bi rêk û pêk dîsa dertê meydanê. Ji ber ku biresera hevoka yekemîn yekjimar e pêveber jî yekjimar bû. Lê gelo çima

heman pêveber di hevoka duyemîn de pirjimar bûye? Çimkî di tevna ergatîviyê de ji ber ku bireser di rewşa xwerû de ye tu mêjer û zayend diyar nake. Vêca pêveber li gorî bireserê tê kişandin û bi qertafa kesane ya wê tê kesandin. Li vir jî heman rêgez li dar e. Em ji mêjera vê pêveberê fehm dikin ku bireser (mirov) pirjimar e.

32. ‘‘Lewra dema **esa û kopalê Mûsa** (e) dîtîn, wan sêhrbazan îman pê anî’’ (Şoşikî, 2014: 136).

Biresera hevoka alikar raveka ‘‘esa û kopalê Mûsa’’ ye û mêjera wê yekjimar e. Lê pêveber (dîtîn) pirjimar e û ji aliyê mêjerê ve bi biresera xwe re li hev nake. Çimkî kirde di hevokê de nehatiye gotin. Bûyerek qewimiye lê kesên ku bûyerê dîtine pir in. Yanî kirde kesê sêyem ê pirjimar e. Ji bo ku pêveber nasnameya vê kirdeya veşartî ragihîne, ew li der rêzikên ergîviyê hereket kiriye û qertafa ‘‘-in’’ê girtiye.

33. ‘‘Ev ayet hedîseya Qaramîtan destnîşan dike ya ku hatin Kebeya Şerîf hilweşandin, nehiştin Misliman werin tewafa Kebeyê bikin, tê de nimêj û taetên xwe bikin û gelek mizgeftêndin jî xirab kirin’’ (Şoşikî, 2014: 152).

Kirde yanî kesên ku çalakîyên di vê nimûneyê de kirine Qaramatî ne. Ji ber ku di destpêkê de qala wan hatiye kirin û heman kirde ji bo hevokên li pey tînin jî derbasdar e ew nehatine dubarekirin. Vê yekê jî rê li ber avahiya ergatîviyê girtiye û pêveber ketiye halê pirjimariyê da ku nasnameya kirdeyê ragihîne.

34. ‘‘Lewra ev grûp hatin bi Mislimanan re munaqeşe kirin û her grûpekê ji wan digot; li cem Xwedê teala em ji ya din heqîr in’’ (Şoşikî, 2014: 169).

Ji ber ku lêkera ‘‘hatin’’ê negergerguhêz e rewşa akuzatîvî li dar e û ewli gorî kirdeyê teşe girtiye. Di tevna akûzatîv de ji ber kirde xwerû ye mêjera kirdeyê jî pêvebereê tê fehmkirin. Vêca ji ber ku mêjera pêveberê pirjimar e û ev jî nîşanê me dide ku kirdeya vê hevokê (ev grûp) pirjimar e. Her wiha heman kirde ji bo lêkera gerguhêz ‘‘munaqeşe kirin’’ ê jî hatiye bikaranîn. Lewma pêveber ketiye bin bandora kirdeya veşartî û li gorî kesê sêyem ê pirjimar hatiye kesandin. Bi vî awayî pêveber nasnameya kirdeyê diyar kiriye û ev yek jî bûye sedem ku avahiya ergatîvê ji holê rabe û pêveber vegere ser rewşa akuzatîviyê.

35. “Îbn Ebbas gotiye: Dema ji Xirîstîyanan re zarokek bibûya, aveke wan heye ku navê wê ‘M’emûdî’ ye, di piştî heft rojan de **ew zarokê xwe** di wê avê de boyax dikirin, bi wê avê **ew zarokê xwe tahir dikirin** û digotin; ev tahir e û ji zarokî re dikeve şûna sunnetkirina Mislîmanan” (Şoşîkî, 2014: 176).

Pêveberên binîxêzkişî gerguhêz in û di raweya dema borî de pirjimar hatine kişandin. Lêbelê bireser (**ew zarokê xwe**) yekjimar in. Xuyaye pêveber û bireser li hev nekirine û tevna ergatîviyê ji holê rabûye. Sedema vê rewşa awarte bikaranîna kirdeya veşartî ye. Çimkî di van hevokan de kirde kesê sêyem ê pirjimar e. Lêbelê ew di hevokan de nehatine bicihkirin. Nebûna vê kirdeya kesê sêyem ê pirjimar wî barî daye pêveberan ku nasnameya kirdeya xwe diyar bike. Lewma pêveber li gorî kirdeyê yanî kesê sêyem ê pirjimar hatine kesandin û ji xwe qertafta kesane ‘-in’ jî vê hevbandiyê nîşan dide.

36. “Ew kesê ku **mizgîniya Muhemmed Pêxemberî** (s) ya ku Xwedê teala di kitêbên wan de nazil kiriye vedişêrin û ketim dikin yan jî tu kesî re nedigotin; **ew** di kitêba xwe de mexfî dihîştinyan jî redd dikirin û di şûna wan beyan û hîdeyeta rêya rast de tiştêk din digotin” (Şoşîkî, 2014: 202).

Pêveberên binî xêzkişî tevî ku xwedî biresereke yekjimar in jî ew li gorî zagonên ergatîvê tevnegeriyane û pirjimar hatine kesandin. Bi gotineke din ew neketine bin bandora bireserê. Çimkî kirdeya kesê sêyem ê pirjimar bi van lêkeran re nehatiye gotin. Lewma pêveberan karê diyarkirina nasnameya kirdeya veşartî girtiye ser xwe û bi vî aramancê li dijî avahiya ergatîvê hereket kirine û pirjimar bûne. Lewre ev kar jî diyarkirina mêjera bireserê giringtir û ferztir e. An na ne gengaz e ku kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar were ragihandin.

37. “Hin caran jî xeyrê qatîlî dikuştin. Hinek caran serokêl dikuştin. Yan jî di şûna mirovekî de zehftir dikuştin, heta ji ber însanekî ve deh însan jî dikuştin. Çawa keyfa wan bixwesta wisan dikirin” (Şoşîkî, 2014: 22).

Hemû hevokên vê nimûneyê bê kirde hatine gotin. Digel ku pêveberên wan gerguhêz in jî ergatîvî pêk nehatiye çimkî kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de veşartî be avahiya ergatîviyê jî holê radibe û lihevhatinek di navbera kirde û

pêvebere de çêdibe yanî pêveber li gorî kirdeyê tê kesandin. Lewma li vir jî pêveber pirjimar hatine kesandin da ku kirdeya veşartî bi alikariya wan diyar bibe.

38. “Lêbelê eger Îslam ne xalib be yanî mexlûb be, wek nimûne, eger dijmin ketibin welatê Îslamê û **ew** dager kirin, li gorî dîtina pirraniya aliman; ew çax cîhad, li ser Mislimanan ferzuleyn e” (Şoşikî, 2014: 263).

Di hevoka alikar ya mercî de cinavka “**ew**” di peywira bireserê de ye û ji ber ku cihê navdêra “welatê Îslamê” girtiye mêjera wê yekjimar e. Lêbelê pêvebera ku diviya li gorî vê biresera yekjimar teşe bigirta li dijî rêzikên ergatîviyê hereket kiriye û pirjimar hatiye kesandin. Ev yek her çiqas li ergatîviyê neke jî li gorî rêzimanê ne şaş e û xwedî qalib û rêzikekê ye. Çimkî kirdeya vê hevokê di hevoka berê de (dijmin) hatiye diyarkirin û lewma ew li vir nehatiye dubarekirin. Ji ber nebûna vê kirdeya kesê sêyem ê pirjimar lêker karê diyarkirina nasnameya kirdeyê girtiye ser xwe û têkliya xwe ya bi bireserê re qut kiriye û li şûna wê li gorî kirdeya pirjimar mêjera xwe pirjimar kiriye.

39. “Vêca Xwedê Teala cewaba wê pirsê dide û wiha dibêje: Şiddet, tirs, feqîrtî, derd û elem wisan ketin pêşîra wan, *istirab û elemê ew* îstila kirin, ew ketin çenbera wan kafirên ku ji Xwedê neditirsiyan û eziyet her didan wan, wisan *teheyyur û zelzeleyê ew* girtin heta ku di dawiyê de pêxember û yên ku pê re bûn, bi hev re digotin: “*Gelo arîkariya Xwedê yê kengî ji me re were*” Lewra ji ber cansojî û eziyetên ku dîtibûn sebra wan meheqî bû. Vêca Xwedê cewaba wan da” (Şoşikî, 2014: 260).

Hevokên “*istirab û elemê ew* îstila kirin” û “*teheyyur û zelzeleyê ew* girtin” li gorî rêzikên ergatîviyê rast û durist in. Çimkî kirde bi qertafa “ê” yê ketine rewşa tewandî lê bireser di rewşa xwerû de ne û pêveber jî (îstila kirin - girtin) ketine bin bandora bireserê ji lewma ew pirjimar hatine kesandin. Herwiha wek rêgez, di zimanê kurmancî de pêveber her tim li gorî hêmana xwerû tê kesandin û ji ber ku hêmana xwerû ti zayend û mêjerê diyar nake, bi rêya qertafên kesane mêjer yanî yekjimarî û pirjimariya hêmana xwerû di pêveberê de tê nîşandan. Li vir jî heman rêgez kariger in.

Lêbelê pêvebera hevoka ‘eziyet her didan wan’ pirjimar e. Ji ber ku ev hevok xwedî kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar e pêveber êdî ne di bin bandora bireserê de ye. Ew ji bo nasnameya kirdeyê diyar bike li gorî kirdeya veşartî teşe girtiye û pirjimar bûye. Çimkî karê diyarkirina nasnameya kirdeya veşartî ji karê diyarkirina mêjera bireserê girîngtir e.

40. “Heta çiqas bi kurtî be jî emê behsa çend nimûneyên îşkenceya ku li Mislimanan hatiye kirin, bikin; ‘Emmar kurê Yasîr (r) bi agirî dax lê **dan** da ku ji dînê xwe vegere kufrê’ (Şoşikî, 2014: 264).

Ji ber ku kesên ku bi agirî dax li ‘Emmar kurê Yasîr dane nediyar in yanî ji ber ku kirdeya pirjimar di hevokê de nehatiye gotin ergatîvî ji holê rabûye û pêveber li gorî kirdeyê teşe girtiye. Pêveberê qertafa kesane ya pirjimariyê (-in) girtiye û bi vî awayî mêjer û nasnameya kirdeyê diyar kirine.

41. “Heta bavê wî Yasîr di ezabê de mir, **dêya wî Sumeyye** jî çiqas dane ezabê ew ji dînê xwe nezîvirî” (Şoşikî, 2014: 264).

Raveka “**dêya wî Sumeyye**” yekjimariya xwe bi veqetandeka “-a” yê diyar kiriye û di peywira biresera lêkera “dan” de hatiye bikaranîn. Dema em li mêjera vê lêkerê dinêrin em dibînin ku pirjimar e. Her wekî ku diyar e mêjera bireser û pêveberê ji hev cuda ye û ergatîvî pêk nehatiye. Li vir rewş û qalibeke awarte derketiye holê, lêwma ev awa rast û durist e. Em ji pêveberê fehm dikin ku kirde kesê sêyem ê pirjimar e. Lêbelê ji ber ku kirde di hevokê de cih negirtiye pêveberê hevokê pirjimar bûye da ku vê kirdeya pirjimar diyar bike.

42. “Vêca **ew** teslîmî Ebû Cehîl kirin da ku hê bêhtir wê bixe îşkenceya dijiwartir” (Şoşikî, 2014: 264).

Cînavka “**ew**” biresera hevokê ye û di rewşa tewandî de ye. Mêjera vê cînavkê di berdeyama hevokê de kifş bûye. Çimkî cînavka tewandî “wê” zayend û yekjimara bireserê diyar kiriye. Êdî em bi saya cînavka “wê” yê dizanin ku cînavka “**ew**” yekjimar e û xwedî zayenda mê ye. Her wiha kirdeya vê hevokê veşartî ye yanî nehatiye gotin. Lewma pêveber (teslîmî yekî kirin) ji bo nasnameya kirdeya xwe diyar bike qertafa “- in”ê girtiye û di encamê de ergatîvî pêk nehatiye.

43. “Paşê **Bîlal** didane destê zarokan digerlandin, paşê li newala Mekkeyê girêdidan, dengê wî dihat û her digot: Ehed! Ehed! Xwedê yek e! Xwedê yek e!” (Şoşikî, 2014: 264).

Bêjeya “**Bîlal**” biresera hevoka yekemîn û duyemîn yekjimar e. Lêbelê pêveber (digerandin-girêdidan) nîşandekên kesane yên pirjimariyê girtine û ev jî tê wê maneyê ku ergatîvî pêk nehatiye çimkî kirde û bireser lihev nakin. Sedema vê rewşa awarte bikaranîna kirdeya veşartî ye. Çimkî kesê sêyem ê pirjimar wekî kirde di hevokê de nehatiye bicihkirin. Ji ber vê yekê pêveberê barê ragihandina nasnameya kirdeyê girtiye ser xwe. Lewma ew ketiye bin bandora kirdeya veşartî û li gorî mêjera wê hatiye kesandin. Di encama vê lihevhatinê de jî ergatîvî ji holê rabûye.

44. “*Muşrikan ev sûc û gunehên mezin* dikirin, qet jê xeber nadin lêbelê ji Mislimanan re xeta didîtin û digotin” (Şoşikî, 2014: 265).

Kirdeya hevokê bi qerfafa “-an” hem pirjimar bûye hem jî ketiye rewşa tewandî. Bireser jî pirjimar e lewre ji ber ku ji ravekê pêk tê mêjera xwe di ravekê de diyar kiriye. Pêveber jî ji ber ergatîvî ketiye bin bandora bireserê û di encamê de ew jî pirjimar bûye. Lêbelê lêkera “ji ... re xeta dîtin” lêkereke biwêjî ya bidaçek e ku jê re biresereke rasterast tune ye. Lêkerên bi vî rengî ne li gorî kirdeyê ne jî bireserê tên kesandin. Lêbelê her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tên kesandin. Lê ev lêker di nîşeya jorîn de li gorî vê qalibê awarte jî hereket nekiriye û pirjimar bûye. Sedema vê yekê jî dîsa kirdeya veşartî ya kesê sêyem e. Lêker barê diyarkirina nasnameya vê kirdeya pirjimar girtiye ser xwe ji lewre pirjimar bûye.

45. “Lewra dema *Mislimanan* **eyb û xirabiyên wê dîtin** di cih de dev jê berdan” (Şoşikî, 2014: 266).

Kirdeyê (*Mislimanan*) qertafa “a”yê girtiye û bi vî awayî hem rewşa tewandî hem jî pirjimar bûye. Lêkera “dîtin” jî ber ergatîvî li gorî bireserê teşe girtiye û ew jî pirjimar bûye. Lêbelê “dev jê berdan” lêkereke biwêjî ya bidaçek e. Di avahiya ergatîv de xwedî rewşeke awarte ye. Ev cûre lêker ne li gorî kirdeyê û ne jî li gorî bireserê lêbelê li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kişandin û kesandin. Lêbelê li jor ev

yek pêk nehatiye û her wekî diyar e mêjera wê pirjimar bûye. Çimkî kirdeya veşartî pê re hatiye bikaranîn. Ji bo nasnameya kirdeyê diyar bibe lêker pirjimar hatiye kesandin. Lewre nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar nahêle ergatîvî pêk were.

46. “Rojekê *Ebdurrehman kurê Ewf* gazî hinek sahabiyên hevalên xwe kiribû û **şerab** vexwarin, paşê dema nimêjê hat, vêca yek bû îmamê wan, rabûn **nimêj kirin** û tê de **sûretê Kafîrûn xwend** lêbelê şaş **xwend** û wiha got: “*E’budû ma te’budûn!*” Yanê ezê evdîniyê ji pûtê we re bikim. Êdî ev ayet di vê mijarê de nazilbû” (Şoşikî, 2014: 267).

Di zimanê kurmancî de hin lêkerên hevedûdanî yên gerguhêz hene ku di tevna ergatîv de tevî ku kirdeya wan tê tewandin jî ew ne li gorî bireserê û ne jî kirdeyê tîn kişandin û kesandin. Lêbelê ew timî li gorî kesê sêyem ê yekjimar tîn kesandin. Yanî li gorî rewş û qalibeke awarte tevdigerin. Lêkera “gazî kirin” an “gazî li...kirin” jî yek ji van lêkerên awarte ye. Lewma ew li gorî vê qayideyê yekjimar hatiye kesandin.

Lêbelê digel ku lêkera “vexwarin” ne lêkereke awarte ye ew jî li dijî zagonên ergatîvê hereket kiriye. Lewra li gorî biresera xwe ya yekjimar (şerab) nehatiye kesandin û pirjimar bûye. Em bi rewşeke awarte ya din re rû bi rû ne. Sedema vê îstisnayê nebûna kirdeyê ya kesê sêyem ê pirjimar e. Her wekî ku ji mînakê diyar e şerab ji aliyê *Ebdurrehman kurê Ewf* û hin kesên ku wî gazî wan kiriye ve hatiye vexwarin. Yanî kirde pirjimar e. Lêbelê ev kirde ji ber ku carekî di serê hevoka berê de hatiye eşkere kirin êdî ji bo lêkera “vexwarin” nehatiye dubarekirin çimkî kirdeya wan hevpar e. Lewma ji bo ku nasnameya vê kirdeyê diyar bibe lêkera “vexwarin” pirjimar hatiye kesandin. Eger wiha nebûya yanî li gorî zagonên ergatîvê lêker bi bireserê re li hev bikara (yanî mêjera lêkerê yekjimar bibûya) wê çaxê dê bihata wê maneyê ku kesê şerab vexwariye tenê *Ebdurrehman kurê Ewf* bûye. Ji ber ku wate diguhere zimên ji xwe re qalibeke awarte afirandiye û ji vê aloziyê xilas bûye.

Herwiha ji bo lêkera “nimêj kirin” jî ev kirdeya pirjimar nehatiye gotin. Lewma ew pirjimar hatiye kesandin û ev awayê awarte rast û durist e. Lê mêjera lêkera “xwendin” li gorî zagonên ergatîvê yanî li gorî bireserê hatiye kişandin û

lewma yekjimar bûye. Bi vî awayî tevna ergatîviyê bi rêk û pêk derketiye meydana. Eger wisa nebûya lê ew jî pirjimar bihata kesandin dê wateya hevokê tevlihev bibûya û bihata wê maneyê ku ne tenê *Ebdurrehman kurê Ewf* lêbelê yên din jî sûreta Kafîrûn şaş xwendiyê. Vêca em têdigihîjin ku kesê ji cemaatê re bûye îmam û ev sûre xwendiyê *Ebdurrehman kurê Ewf* bûye.

47. “Paşê ew bi xwe hesiyan, edî rêzên xwe kirin yek, bi îxlas û semîmiyet şerrê dijminên xwe kirin; îzzet û şerafa xwe û serxwebûna xwe dîsa bi dest xistin” (Şoşikî, 2014: 301).

Em ji hevoka serî ya negerguhêz fehm dikin ku kirde kesê sêyem ê pirjimar e. Ji bo hemû hevokên gerguhêz ên li pey wê tî jî heman kirde derbasdar e. Lewma hevok bê kirde hatine rêzkirin. Lêbelê ji bo ku nasnameya vê kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di van hevokên gerguhêz de bê ragihandin pêveber pirjimar hatine kesandin. Di encamê de avahiya ergatîviyê ji holê rabûye, çimkî pêveber li şûna ku bi biresera xwe re li hev bikin ew li gorî kirdeya kesê sêyem ê pirjimar hatine kesandin.

48. “Vêca çi dema ku **ceng** li ser wan hat ferzkirin, wekî ku *wan* ji bo li xwe vegeandina hiquqên xwe yên talankirî **ew** ji pêxemberê xwe xwestibûn û talep kiribûn, vêca ew ji cîhadê li paş man, newêrebûnê xelebetî li wan kir û dema ku ew ji çem derbas bûn, êdî ji xwe li uzran geriyan û xwestin neçin cenga neyaran. Lêbelê *Xwedê teala* bi wan kesên ku zalim in û cîhadê nakin, dizanîbû” (Şoşikî, 2014: 304).

Cînavka xwerû “**ew**” bireser e û ji ber ku di şûna “ceng”ê de hatiye bikaranîn mêjera wê yekjimar e. Lêbelê lêkerên “xwestin û talep kirin” gorî vê bireserê teşe negirtine lewma li vir ergatîvî xwe nedaye der. Beravajî vê yekê lêker pirjimar hatine kesandin da ku nasnameya kirdeya pirjimar diyar bibe. Yanî ji ber nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar lêker mecbûr kirine ku kirdeya xwe diyar bikin û peywendiya bi bireserê re qut bikin.

49. “Lewra *xelkê Filistînê* li ser wan musellet bûbûn û gelek ji wan kuştibûn, heta ew tabûta ku Tewrat tê de bû, **ew** jî ji wan standibûn” (Şoşikî, 2014: 304).

Pêşî meriv dibe qey lêkerên kuştin û standin ji ber ergatîvî ango ji bo ku biresera wan pirjimar e mêjera wan jî pirjimar bûye. Lêbelê dema meriv lê baş hûr

dibe meriv têdigihêje ku pirjimariya mêjera van lêkeran ji sedemek din werhatiye. Niha em li ser vê rewşa awarte û qaliba wê bisekinin.

Wekî ku diyar e kirdeya hemû hevokan kesê sêyem ê pirjimar e. Ji ber vê yekê piştî ku di serê hevokê de kirde hate diyarkirin êdî hevokên li pev wê tîr kirde hatine rêzêkirin. Herwiha piştî lêkereke negerguhêz (musellet bûn – bûn) lêkereke gerguhêz (kuştin –standin) hatiye bikaranîn. Lewma ji ber nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar lêkerên gerguhêz (kuştin –standin) ketine bin bandora kirdeya hevpar û pirjimar hatine kesandin. Bi vî awayî ergatîvî ji holê rabûye. Bo mînak; di hevoka dawîn de digel ku bireser (ew yanî tabût) yekjimar e pêveber pê re li hev nekiriye lêbelê bi kirdeyê re li hev kiriye û pirjimar bûye. Bi vî awayî jî tevna ergatîvî pêk nehatiye. Çimkî di rewşa nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar de ziman karê ragihandina nasnameya kirdeyê dixê stuyê pêveber lewma ew pirjimar tê kesandin û peywendiya wê û bireserê bi cih naye.

50. “Çawa hinek aliman ev gotine: *milletê bi navê ‘Emalîqe ew* ji wan standibû, paşê li Benî-Îsraîliyan vegerandin” (Şoşîkî, 2014: 305-306).

Ji ber rewşa ergatîvê lêkera “standin” ketiye bin bandora cînavka xwerû “ew”ê û yekjimar teşe girtiye. Ev yek jî tê wê maneyê ku bireser kesê sêyem ê yekjimar e. Lê digel ku heman cînavk di peywira biresera lêkera “vegerandin”ê de jî hatiye bikaranîn vê carê lêker pirjimar hatiye kesandin. Diyar e ku ergatîvî li vir ji holê rabûye. Sedema vê rewşa awarte nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar e. Ji bo diyarkirina nasnameya vê kirdeya veşartî lêker pirjimar hatiye kesandin.

51. “Lewra şêwe û adetên wan îsyana bû; di wextê rehetiyê de zirtên xwe didan û nuqtên hemasî dikirin, lêbelê wexta li wan diqewimî meyla wan li ser rev û firarkirinê bû” (Şoşîkî, 2014: 308).

Kirdeya hevokê kesê sêyem ê pirjimar e û ji ber ku ew di serê hevokê de kifş e, di hevoka duyemîn de nehatiye dubarekirin. Nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar rê li ber ergatîvî digre û êdî pêveber li şûna bireserê bi kirdeyê re dikeve nav ahengiyê. Çimkî di vê rewşa awarte de kirdeya veşartî tîrê dikare bi rêya pêveberê

were ragihandin. Lewma pêveber li vir nîşandekên pirjimariyê girtine û xwe li ba kirdeyê guncane.

52. Ew çax xwe avêtin ber penaha Xwedê, ber penaha wî Qadirê ku hêza wî têra her tiştî dike. Êdî ev yek di xwe de dîtî û wiha dua kirin.

Hevokên vê nimûneyê xwedî kirdeya veşartî ne. Ji bo em kirdeyan destnîşan bikin divê em ji pêveberan pîrsa ‘kê’ bikin. ‘Wan’ yanî cînavka kesê sêyem ê pirjimar bersiva pîrsa me ye. Her wekî ku diyar e, nebûna kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de ergatîvî ji holê rakirîye. Çimkî êdî ragihandina nasnameya kirdeyê dikeve stûyê pêveberê. Lewma pêveberên vê nimûneyê bi biresera xwe re li hev nekirine. Li şûna vê yekê ew li gorî kirdeyê teşe girtine û ev pirjimariya wan kirdeya veşartî bi me daye zanîn.

Gelek balkêş e ku nebûna kirdeya kesê sêyemê pirjimar mêjera pêvebera gerguhêz her tim dixê pirjimariye. Wek mînak heger ev yek nebûya diviya hevoka pêşîn ya mînakê diviya yekjimar bihata kesandin. Lewre cînavka veşerok ‘xwe’ dema di peywira bireserê de tê bikaranîn pêveberê yekjimar dike. Yanî heke kirde di hevokê de bihata gotin dê hevok wiha bibûya: **Wan** ew çax xwe avêt ber penaha Xwedê

53. ‘‘Vêca *Resûlê Xwedê* (s) **ev ayet** ji wan re **şand**, wexta xwendin, gotin; taqeta me ji herba Xwedê û Resûlê wî re nîne, **ribaya xwe nestandin**’’ (Şoşîkî, 2014: 344).

Peyva ‘‘*Resûlê Xwedê*’’ kirdeya hevoka pêşîn ê lêbelê kirdeya hevokên din kesê sêyem ê pirjimar (wan) e. Vêca ji ber ku ev kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokan de nehatiye bicihkirin, pêveberan karê ragihandina nasnameya kirdeyê girtiye ser xwe û bi mabestê mêjera pêveberan pirjimar bûye. Lewma tevna ergatîviyê bi rêk û pêk xwe li vir venegirtiye.

54. “*Pêxemberî bi wehiya* ku ji terefê Xwedayê wî jê re hatiye nazilkirin *îman aniye* û *muminan* jî temaman *îman bi Xwedê, mealîketên wî, kitêbên wî û resûlên wî aniye*. Beqere 285” (Şoşikî, 2014:352).

Lêkera “bi...(pê) îman anîn” lêkereke bidaçek e û jê re biresereke rasterast nîne. Lewma di rewşa ergatîv de digel ku kirdeya wê tê tewandin jî ew li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin.

3.3. ERGATÎF YAPISININ HATALI KULLANIMI ÖRNEKLERİ

Dibilgisi kitaplarında belirtilen ergatif yapısının özellik ve kuralları çerçevesinde tefsirde yer alan az sayıdaki hatalı kullanım aşağıdaki gibidir.

1. “Beşeran bi nezanîn û xurafeyan **xaliqê erd û asîman** ji bîr kiribûn, **dua, nîyaz, hewar û gaziya xwe** ji xeyrê Xwedê teala re dikirin, heta bawerî bi selteneta xeybê tanîn û digotin; mirov çî li erdê girêbidin, Xwedê teala jî wê girêdide, ew çî vekin, Xwedê teala jî wê vedike” (Şoşikî, 2014:19).

Lêkerên hevokan –ji bîr kirin, dua kirin, bawerî pê anîn, gotin- hemû gerguhêz in û di demên borî de ne. Lewma divê avahiya ergatîviyê pêk were. Niha em hevokan ji aliyê ergatîviyê hildin dest. Digel ku kirdeya hevoka yekemîn bi qertafa “-an”ê hem pirjimar bûye û hem jî ketiye rewşa tewandî ji ber ku lêkera ‘ji bîr kirin’ lêkereke bidaçek e ew diviya ne li gorî kirdeyê ne jî li gorî bireserê lêbelê li gorî kesê sêyem ê yekjimar bihata kesandin. Lê ew pirjimar hatiye kesandin ku ev jî çewt e. Çimkî ev cure lêker li rêzikên ergatîviyê nakin û xwedî qalib û rewşeke awarte ne. Diviya hevok wiha bihata kesandin

‘Beşeran bi nezanîn û xurafeyan **xaliqê erd û asîman** ji bîr kiribû, ...’

Herwiha ergatîvî di hevokên din de jî ji holê rabûye. Lêbelê li gorî qalibê awarte ew rast hatine bikaranîn. Sedama vê yekê jî kirdeya veşartî ya kesê sêyem ê pirjimar e. Çimkî kirdeya hevoka yekemîn ji bo hemû hevokên din jî hevpar e. Lewma di hevokên din jî ev kirdeya kesê sêyem ê pirjimar nehatiye bi cih kirin. Ji ber ku hevok bê kirde ne peywira diyarkina vê kirdeya kesê sêyem ê pirjimar pêveberên gerguhêz girtine ser xwe û ji dêvla ku bi biresera xwe re li hev bikin ew li

gorî kirdeya veşartî yanî kesê sêyem ê pirjimar hatine kesandin. Lewma mêjera lêkerên ‘dua kirin’, ‘bawerî pê anîn’ û ‘gotin’ pirjimar bûne.

2. ‘‘Yanî *wan hîdayet dan* û di şûna wê de **delalet kirrîn**. Yanî *wan terka wê hîdayeta fitrî da* û **delalet** wergirt’’ (Şoşikî, 2014: 43).

Kirdeya hevokan cînavka kesê sêyemê pirjimar e û di rewşa tewandî de ye. Lê bireser di rewşa xwerû de ye û yekjimar e. Yanî kirde û bireser li gorî rê û rêzikên ergatîviyê hereket kirine û rast û û dirust teşe girtine. Lêbelê di hevoka yekem de digel ku bireser yekjimar e lêkera ‘‘dan’’ pirjimar hatiye kesandin. Yanî ji aliyê mêjerê ve bi bireserê re li hev nake. Diyar e ku li vir şaşıyek hatiye kirin. Pêveber diviya li gorî bireserê bihata kesandin û ew jî wek biresera xwe yekjimar bibûya. Ango awayê rast wiha ye: Yanî *wan hîdayet da*. Gelek balkêş e ku di hevoka duyemîn de pêwendiya kirde û lêkerê yanî ergatîvî pêk rast hatiye bikaranîn. Çimkî mêjera lêkera ‘‘terka ...dan’’ yekjimar hatiye kesandin û lewma ew bi bireserê re li hev dike. Niha em bala xwe bidin berdewama hevoka yekemîn: ‘‘... *û di şûna wê de delalet kirrîn*.’’ Piştî gihaneka ‘‘-û’’yê hevok dirêj bûye û ji ber ku kirdeya kesê sêyem ê pirjimar (wan)hevpar e li vir hevok bê kirde bê hatiye bikaranîn. Ev yek jî bûye sedem ku pêveber li dijî rêpîvana ergatîviyê hereket bike û bi mabesta ku nasnameya kirdeya veşartî ragihîne mêjera xwe pirjimar kiriye û xwe li cem kirdeyê gunciye. Ev qalibê awarte li vir rast hatiye bikaranîn.

Lêbelê di hevoka duyemîn de vê carê ev qayide rast nehatiye bikaranîn. Çimkî li vir jî kirdeya kesê sêyem ê pirjimar veşartî ye û bikaranîna pêveberê ya bi awayê ‘‘...*û delalet wergirt*’’ xelet e. Ev yekjimarbûna mêjera pêveberê tê wê wateyê ku kirde kesê sêyem ê yekjimar e. Yanî: *Wî/Wê delalet wergirt*. Lêbelê di rastiyê de kirdeya veşartî kesê sêyem ê pirjimar e. Diviya pêveber pirjimar bihata kesandin yanî bikaranîna rast ev e: ‘‘...*û delalet wergirtin*’’.

Nebûna kesê sêyem ê pirjimar di avahiya ergatîviyê de rewşeke awarte û îstisna ye û ziman ji xwe re vê qaliba awarte afirandiye û xwe ji aloziyê xelas kiriye. Dema em kirdeya veşartî di serê hevokê de bi cih dikin (**WAN delalet wergirt**) em dibînin ku eşkerekirina kirdeya kesê sêyem ê pirjimar hevokê vedigerine ser qalibê asayî yanî ergatîviyê.

3. ‘‘*Qur’ana Kerîm* ji bo îrşada wan **gelek rêyên hîdayetê nîşanî wan da**, lê belê wan rûyê xwe jê zîvirand’’ (Şoşikî, 2014: 45).

Biresera hevokê ji ravekê pêk tê û raveber qertafa veqetandekê (-ên) girtiye û pirjimar bûye. Ji ber ku pêveber (nîşanî wan da) gerguhêz e û di raweya dema borî de ye divê li gorî bireserê bê kesandin da ku ergatîvî pêk were. Lêbelê digel ku bireser pirjimar e mêjera pêveberê yekjimar e. Ev yek jî xelet e. Divê awayê rast wiha be: *Qur’ana Kerîm* ji bo îrşada wan **gelekrêyên hîdayetê nîşanî wan dan**.

Pêveberê hevoka duyemîn ji lêkereke bidaçek e lewma digel ku kirdeya hevokê di rewşa tewandî de ye jî lêker li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kişandin. Yanî lêker ne li gorî kirde û ne jî li gorî bireserê tê kesandin. Li jor jî heman rewşa awarte rast û durist hatiye bikaranîn.

4. ‘‘*Wan* umîda xwe bi wê ronahiyê ve girêdabûn; ewa ku car caran vedida. (Şoşikî, 2014: 52).

Kirdeya hevokê (*wan*) kesê sêyem ê pirjimar e û di rewşa tewandî de ye. Herwiha pêveber pirjimar e. Lêbelê ji ber ku pêveber lêkereke biwejt ya bidaçek e, ew diviya yekjimar bihata kesandin. Lewma eger em mêjera pêveberê yekjimar bikin dê hevok sererast bibe.

5. ‘‘Piştî *Xwedê Teala* **sifetên fasiqan beyan kir**, berê xîtaba xwe bi rêya înkâr û ecebmayînê da aliyê kafîran, hin delîl di bîra wan anîne ku ew qudreta *Xwedê teala* nîşan didin, ew delîl jî ev in; xuliqandina wan ji destpêkê heta dawiyê. Wek nimûne; *wî ew sax kirin*, paşê dîsa dê wan bimirîne, paşê dîsa jî dê wan sax bike, vejîne ‘‘ (Şoşikî, 2014: 58-59).

Li gorî avahiya ergatîviyê, ji lêkerên hevoka yekemîn ‘‘beyan kirin’’ şaş, lê ya duyemîn ‘‘bîra...yekî anîn’’ çewt hatiye bikaranîn. Çimkî digel ku biresera her du hevokan jî pirjimar in lêkera pêşîn yekjimar lê ya paşîn pirjimar hatiye kesandin ev yek jî li gorî rêzikên ergatîviyê şaş e. Heger em lêkera ‘‘ beyan kirin’’ li gorî biresera pirjimar bikişînin û mêjera wê jî pirjimar bikin dê alozî çareser bibe.

Lêbelê hevoka duyemîn li gorî rêzikên ergatîviyê rast hatiye bi kar anîn. Çimkî kirde tewandî (wî) lê bireser (ew) di rewşa xwerû de ye û pêveber (sax kirin) ketiye bin hêmana xwerû û qertafa kesane ya wê girtiye û di encamê de mêjera bireserê diyar kiriye ku ev yek jî di cih de ye.

6. “Hem çi tişt li erdê hebe, **ew** ji wan re xuliqandiye da ku ew ji zahir û batinê erdê menfîetdar bibin, hem jî **heft asîman** ji bo feydeya wan xuliqandin û ji wan re bi qendîlan muzeyyen kir da ku di seferên xwe de li ser bejahî û behrê şaş nebin” (Şoşikî, 2014: 58-59).

Lêkerên “xuliqandin” di her du hevokan de jî li gorî avahiya ergatîviyê rast hatine kişandin. Lêbelê lêkera “muzeyyen kirin” yanî “xemilandin” li gorî ergatîviyê şaş hatiye kesandin. Çimkî biresera wê û lêkera “xuliqandin” heman bêje (heft asîman) ye û ji ber ku lêkera “xuliqandin” ketiye bin bandora vê bireserê û mêjera lêkerê pirjimar bûye, em jê fehm dikin ku ew bireser pirjimar e. Lêbelê heman bireser cara duyemîn yekjimar hatiye hesibandin ku ew jî xeta ye. Divê lêkera “muzeyyen kirin” jî pirjimar bihata kesandin.

7. “Wek nimûne; wî **ew** sax kirin, paşê dîsa dê wan bimirîne, paşê dîsa jî dê wan sax bike, vejîne. Hem çi tişt li erdê hebe, **ew** ji wan re xuliqandiye da ku ew ji zahir û batinê erdê menfîetdar bibin, hem jî **heft asîman** ji bo feydeya wan xuliqandin û ji wan re bi qendîlan muzeyyen kir da ku di seferên xwe de li ser bejahî û behrê şaş nebin (Şoşikî, 2014: 58-59).

Ji lêkera “muzeyyen kirin” re bi kurdî “xemilandin” tê gotin. Ev lêker di nîşeyê de yekjimar hatiye kesandin ku ew yek jî ne cih de ye. Çimkî tiştê ku hatiye muzeyyenkirin yanî biresera wê bêjeya “heft asîman” e ku ew jî pirjimar e. Lewma diviya lêker li gorî rêzikên ergatîvê mêjera biresera xwe diyar bikira û pirjimar bihata kesandin.

8. “Belê *Adem* (e) bi tefsîlkirin ji wan re beyan kir, wexta ji wan re **navên musemmeyatangot**, wan ew sirrên ku di xîlefeta Adem de mexfî bûn, îdrak kirin û zanîn ku ew ji abûra dinyayê re bi kêr nayên. Lewra ew ji nûrê çêbûne” (Şoşikî, 2014: 63).

Lêkera ‘gotin’ di vê nîşeyê de yekjimar hatiye kesandin. Li gorî avahiya ergatîviyê ev xelet e. Çimkî biresera wê (navên musemmeyatan) ji ravekê pêk tê û raveber veqetandeka ‘-ên’ girtiye û bi vî awayî pirjimar bûye. Lewma lêker diviya li gorî bireserê bikahata kişandin û pirjimariya wê ragihanda.

9. ‘Lêbelê *ji bilî Henefiyan cumhûrê alimên din wergirtina heqdestê* li ser hînkirina Qur’anê caîz dêriyane’ (Şoşikî, 2014: 71).

Ev mînak jî li gorî rêzikên ergatîviyê şaş e. Çimkî bireser (wergirtina heqdestê) yekjimar, lêbelê pêveber (caîz dêriyane) pirjimar e. Divê lêker ji aliyê mêjerê ve bi biresera xwe re li hev bike. Lewma li vir divê lêker jî yekjimar bê kesandin.

10. ‘Eger *wan îtiraz nekirana* hema kîjan çêlek-dewar serjêkirana kafi **dikir**’ (Şoşikî, 2014: 93).

Mêjera lêkera hevoka mercî (îtiraz kirin) pirjimar e. Lêbelê gerek yekjimar bihata kesandin. Çimkî Cihûyan nexwestine emrê Mûsa (a.s) yê di derheqê serjêkirina çêlekekê bi cih bînin û lewma ji vî emrê wî re îtiraz kirine. Yanî li vir biresereke pirjimar tune ye ku ev lêker pirjimar bê kesandin.

Lêbelê lêkera ‘serjê kirin’ pirjimar hatiye kesandin û ev yek jî di cih de ye. Çimkî hevokê bê kirde ye. Lewre kirdeya ku kesê sêyem ê pirjimar e ji ber ku di serê hevokê de hatiye diyarkirin û ji bo vê hevokê jî hevpar e û ew nehatiye dubarekirin. Lewma di rewşa nebûna kirdeya kesê sêyem de lêker barê ragihandina nasnameya kirdeyê digre ser xwe û pirjimar dibe.

11. ‘Lêbelê *wan xwe* di nav sûalan de **berdan** û îş li xwe giran kirin’ (Şoşikî, 2014: 93).

Mêjera lêkera ‘berdan’ pirjimar e, lê diviya yekjimar bihata kesandin. Çimkî biresera hevokê cînavka vegerok ‘xwe’ ye. Ev cînavk ji bo hemû zayend û mêjeran tê bikaranîn. Hem cihê navdêrên mê û nêr hem jî yên yekjimar û pirjimar digire. Lewma mêjera wê her tim yekjimar e. Bi gotineke din : ‘*Heger objekta hevoka dema borî cînava »xwe«-yê be, lêker hemî caran yekhejmarîyê nîşan dide*’ (Hirofî, 2005).

Ji ber vê yekê diviya lêker wiha bihata kesandin: “*Lêbelê wan xwe di nav sûalan de berda û îş li xwe giran kirin*”

Lêbelê pêvebera hevoka duyemîn pirjimar hatiye kesandin û ev yek jî rast e. Çimkî ji ber ku kesê sêyem ê pirjimar wekî kirdeya veşartî hatiye bikaranîn di hevokê de nehatiye bikaranaîn. Lewma pêveber ji bo nasnameya kirdeya pirjimar ragihîne bi kirdeyê re li hev dike û di encamê de pirjimar dibe. Ev rewşa awarte her çiqas li avahiya ergatîviyê neke jî ziman ji bo nasnameya kirdeya kesê sêyem ê pirjimar diyar bike mêjera pêveberê pirjimar dike.

12. “Hal ev e ku *taîfeyek ji wan **kelamê Xwedê Teala** dibihîst, paşê tebdîl yan jî tewîl dikir. Ji kelamê Xwedê teala mebest yan Tewrat e, ewa ku bi Mûsa (e) re çûbûn guhdarîkirina wê hingê kelama Xwedê teala bihîstibûn, paşê çawa bihîstin wisan eda jî kiribûn, heta di dawiyê de *wan **sifetên Resûlê Xwedê** (s) jê derxistin*. ” (Şoşikî, 2014).*

Lêkera “bihîstin” ji ber rewşa ergatîvî ketiye bin bandora biresera xwe (kelamê Xwedê) ya yekjimar û mêjera xwe şibandiye wê. Ev yek jî rast û durist e. Lêbelê di kesandina lêkera “tewil kirin” de xetayek heye. Diviya ev lêker pirjimar biha kesandin. Niha em li ser vê lêkerê şîroveya xwe bidomînin.

Bêjeya “taîfeyek ji wan” kirdeya hemû hevokên gerguhêz e û em dikarin di şûna wê de cînavka tewandî ya kesê sêyem ê pirjimar (wan) bi kar bînin. Lewma piştî ew di serê hevokê de hate diyarkirin êdî ne hewce ye ku were dubarekirin. Ji ber vê ev lêker û yên piştî wê tên li gorî kirdeya veşartî hatine kişandin. Ev yek jî yanî nebûna kesê sêyem ê pirjimar ergatîvoyê ji holê radike û lêker pirjimar tê kesandin. Çimkî eger kirdeya kesê sêyem ê pirjimar veşartî be û lêker li gorî bireserê were kesandin dê wê çaxê nasnameya vê kirdeyê neyê ragihandin. Lê wateya kirdeya pirjimar dê vegere ser kesê sêyem ê yekjimar an jî kesên din yên yekjimar. Wek mînak; hevoka “... paşê tebdîl yan jî tewîl dikir” tê wê maneyê ku kirde yekjimar e. Lêbelê de ka niha em lêkerê li dijî avahiya ergatîviyê pirjimar bikin û binêrin bê wateye hevokê çawa diguhere: “... paşê tebdîl yan jî tewîl dikirin” Ev hevok tê wê maneyê: **Wan** (yanî taîfeyek ji wan) ew (yanî **kelamê Xwedê**) tebdîl yan jî tewîl kiriye. Lewma xuya ye ku di nîşeya jorîn ya vê hevokê de ji ber ku mêjera lêkeran

(tebdîl /tewîl fikir) yekjimar e di vî warî de şaşiyek hatiye kirin. Her wekî ku me destnîşan kir ev qalibê awarte dê vê aloziyê çareser bike. Gelek balkêş e ku dur re di berdewama hevokê de pêveberên wekî “bihîstin û eda kirin jê digel ku biresera wan jî eynî yanî yekjimar e li gorî vê qalibê rewşa awarte hatine kişandin ku ev tercîh jî di cîh de ye. Lê hevoka dawîn yanî : “ heta di dawiyê de *wan sîfetên Resûlê Xwedê (s) jê derxistin*” li gorî rêzikên ergatîviyê pêk hatiye. Çimkî ji ber ku kirde cînavaka tewandî ya kesê sêyem ê pirjimar e pêveber ketiye bin bandora biresera pirjimar û di encamê de mêjera wê jî pirjimar hatiye kesandin.

13. “Yan jî ji kelimê Xwedê teala mebest Qur’ana pîroz e, lewra *gelek haxam/exbar û mezinên wan kelimê Xwedê Teala dibihîstin*, paşê li gorî hewes û arzûyên nefsa xwe ji xwe re tewîl *lêdidan*” (Şoşîkî, 2014: 100).

Kirde kesê sêyem ê pirjimar e û di rewşa tewandî de ye. Herwiha lêkera “bihîstin” ji ber ku gerguhêz e û di dema borî de hatiye kişandin divê li gorî rêzikên ergatîviyê bi biresera xwe re li hev bike. Lêbelê digel ku mêjera bireserê (kelamê Xwedê) yekjimar e pêveber pirjimar hatiye kesandin. Ev awa li gorî rêzikên ergatîviyê çewt e. Çer ku em lêkerê li gorî bireserê dikesînin yanî mêjera wê yekjimar dikin, em dibînin ku pîrsgirêk çareser dibe. Lêbelê lêkera ‘lêdan’ pirjimar hatiye kesandin ku ev yek jî rast e. Çimkî kirdeya wê ya ku kesê sêyem ê pirjimar e di hevokê de tune ye. Lewma ji bo ragihandina nasnameya vê kirdeyê ew li dijî avahiya ergatîviyê hereket kiriye û bi kirdeyê re ketiye nav hevahengiyê û ji ber vê yekê pirjimar hatiye kesandin.

14. “Lêbelê *wan li menfîeta xwe ya xusûsî dinêrîn, digotin*” (Şoşîkî, 2014: 101).

Di vê nîşeyê de her du lêkerên gerguhêz jî pirjimar hatine kesandin. Lêkera “li ... (lê) nêrîn” lêkereke bidaçek e. Lewma mîna hin lêkerên bi vî rengî digel ku xwedî kirdeya tewandî ne ew her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tînin kişandin. Ne bi kirde û ne jî bireser di kesandina wan de xwedî bandorekî ne. Ji ber vê yekê diviya ev lêker yekjimar bihata kesandin. Lêbelê lêkera “gotin” her çiqas li rêpîvana ergatîviyê neke jî rast û durist hatiye kişandin. Çimkî dema kirdeya kesê sêyem ê pirjimar di hevokê de nepen yanî veşartî be ziman ji bo ku nasnameya kirdeyê diyar

bike li dijî ergatîviyê hereket dike û ji xwe re qalibêke din ya awarte diafirîne. Lewma lêker li vir pirjimar e.

15. “Dema di navbera Ewsî û Xezreciyan de herb derketa, *herdu beşên Cihûyan* li cem hevalbendên xwe yên Erebiyê **cihên xwe digirtin**, vêca *Yehûdiyan* **hev dikuşt**, **xaniyên hev wêran dikir**, **hev û du** ji xaniyên hev **derdixist** û **malên hev û du talan dikir**” (Şoşikî, 2014: 111).

Cînavka “hev” û “hev û du” karê beramberê hev an jî pev re tê kirin dest nîşan dide. Wekî cînavka berbihevin tê binavkirin û yekjimar te bikaranîn (Baran, 2012: 98). Lewma hevoka “*Yehûdiyan* **hev dikuşt**” rast û durist e. Lêbelê hevokên piştî wê tîrêjê hatine kesandin. Her wekî ku diyar e bêjeya “*Yehûdiyan*” ji bo çar hevokên ku li pey hev tîrêjê kirdeya hevpar. Ji ber vê yekê ev kirdeya pirjimar êdî ji bo lêkerên din nehatiye dubarekirin. Lêbelê nebûna vê kirdeya kesê sêyemê pirjimar ergatîviyê ji hêla radîke û lêker vedigerin ser hevahengiya bi kirdeyê û di encamê de pirjimar dibin da ku nasnameya kirdeyê diyar bikin. Hal ev e ku li jor ev qayîde û rewşa awarte pêk nehatiye. Heke ev lêkerên xwedî kirdeya veşartî pirjimar bûn kesandin dê pîrsgirêk çareser bibe. Awayê rast wiha ye:

“*Yehûdiyan* **hev dikuşt**, **xaniyên hev wêran dikirin**, **hev û du** ji xaniyên hev **derdixistin** û **malên hev û du talan dikirin**”

16. “*Wan* ji bo hevalbendên xwe yên Erebiyê bi neheqî êrîşkarî biradînen xwe, *Yehûdiyên* **hevnijadên xwe** ji xaniyên wan **derdixist**, malên wan **talan dikir** û **ew dikuştin**” (Şoşikî, 2014: 112).

Wiha diyar e ku kêşana lêkera “kuştin” rast e, lê ya “derxistin” û “talan kirin” rast û durist pêk nehatiye. Kirdeya her sê lêkeran jî cînavka tewandî ya kesê sêyemê pirjimar e. Lewma piştî di serê hevokê de kirde hatiye diyar kirin êdî hevokên li pey hev siwar bûne bîyê kirde hatine saz kirin. Lewma ji bo ku nasnameya vê kirdeya pirjimar diyar bibe peywendiya asayî ya di navbera bireser û pêveberê de têk diçe û peywendiya kirde û pêveberê xwe dide der. Wekî ku em dibînin di nîşe jorîn de ev qayîde û rewşa awarte pê nehatiye. Lewma diviya wiha bihata nivîsandin:

“*Wan* ji bo hevalbendên xwe yê Ereb bi neheqî êrîşkarî biradînen xwe, Yehûdiyên **hevniyadên xwe** ji xaniyên wan **derdixistin**, malên wan **talên dikirin** û **ewdikuştin**.”

17. “Êdî wê demê *firqeyek ji Yehûdî û haxamên wan* **Tewrat** avêtin pişt xwe û berê xwe jê guherandin” (Şoşikî, 2014: 131).

Lêkera “avêtin” li vir pirjimar hatiye kesandin lê ev awa şaş e. Çimkî ji ber rewşa ergatîviyê diviya ew li gorî bireserê bihata kişandin. Ji ber ku bireser (Tewrat) yekjimar e mêjera pêveberê jî divê yekjimar bê kesandin. Lêbelê “berê xwe jê guherandin” lêkereke gerguhêz e. Lewma eger kirdeya wê ya kesê sêyem ê pirjimar veşartî nebûya dê li gorî biresera yekjimar bihata kesandin. Lê nebûna kirdeya wê ya kesê sêyem ê pirjimar pêveber mecbûr kiriye ku nasnameya wê diyar bike. Lewma pêveber li şûna bireserê xwe bi kirdeyê re gunciye û mêjera xwe pirjimar kiriye.

18. “Di ayeta ewwel de, Xwedê teala nesîhetê li Yehûdiyên serdama tenzîlê dike û nîmetên giranbiha yê ku li bav û kalên wan kiribûdi bîra wan tîne, wek nimûne; ew ji neyarê wan Fîrewn xilas kiribûn û li çola Tîhê **gezo û goştê sûsikê** ji wan re **şandibû** xwarê. Cih û welat dabûn wan, **pêxember** ji nav wan rakiribûn, **şandibûn**, û ew di ser xelkê heyama wan de çêtir girtibûn” (Şoşikî, 2014:160).

Di vê nîşeyê de lêkera “şandin” şaş hatiye kesandin. Ji ber ku Xwedê du tişt (**gezo û goştê sûsikê**) dane wan bireser pirjimar e. Ji ber rewşa ergatîvî lêker divê vê pirjimariya bireserê ragihîne. Lewma gerek mêjera vê lêkerê pirjimar bibe.

19. “Piştî ku *me* ji mirovan re di kitêbê de **heqîqet** beyan kiriye wan hem **mena mirovan ji heqîqetê** dikirin û hem jî **xelk** diajotin zerar, kufr û cehennemê, ha cezayê wan ev e; Xwedê teala naletê li wan tîne, wan ji rehma xwe dûr dixê û xezeba xwe li wan dike; melaîket û temamê mirovan naletê li wan tînin” (Şoşikî, 2014:202).

Herwekî ku diyar e mêjera lêkera “mena ... ji ... kirin” pirjimar hatiye kesandin û ev yek jî şaş e. Divê ew yekjimar bihata bikaranîn.

Lêbelê lêkera “ajotin” pirjimar hatiye kesandin û ev terhîh jî di cih de ye. Çimkî ji ber nebûna kirdeya kesê sêyem ê pirjimar ew jî pirjimar bûye.

20. “Lewra *Bûxarî û Muslîm* rîwayet kirine ku *mirovek bi navê Nueyman* hebû, wî çend caran **mey** vexwariye, vêca **ew anîne** hizura Pêxember (s), *hin sehabîyan* nalet lê **anîn**. Loma *Resûlê Xwedê* (s) ji wan re got : “*Şeytên li ser birayê xwe xalib nekin!*” û bi vî awayî hurmeta biratiyê jê re girt” (Şoşikî, 2014: 204).

Lêkera ‘nalet **li... (lê)** anîn’ yek ji lêkerên bidaçek e ku ew li gorî ergatîviyê tevnagere, lêbelê her tim li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin. Lewma awayê jor şaş e û divê mêjera wê yekjimar bibe. Lêbelê lêkerên din yên hovokê rast û dirust in. Lêkera ‘rîwayet kirin’ pirjimar e û ev yek jî nîşanê me dide ku ji aliyê *Bûxarî û Muslîm* ve ji her çiqas wate heman wate be jî bi lefzên cûda ji hedîsekê zêdetir hedîs hatine veguhastin. Lewma ji ber ergatîvî pirjimariya bireserê bi rêya pêveberê hatiye ragihandin. Herwiha lêkera ‘vexwarin’ jî ji ber rewşa ergatîviyê yekjimar hatiye kesandin. Çimkî biresera wê yanî ‘mey’ mîna avê ‘*nehejmarnav*’ (uncountable noun) e (Zaxoyî, 2009). Lêbelê hevoka ‘vêca **ew anîne** hizura Pêxember’ xwedî helwesteke pir cûda û balkêş e. Çimkî biresera vê hevokê cînavka xwerû yanî ‘ew’ e û ji ber ku di şûna ‘*mirovek bi navê Nueyman*’ de hatiye bikaranîn ew kesê sêyem ê yekjimar e. Pir balkêş e ku pêveber pirjimar e. Lewre pêveber ji ber avahiya ergatîviyê diviya li gorî mêjera vê bireserê bihata kesandin û ew jî yekjimar bibûya. Xuyaye ku tevna ergatîvî sergîhayî nebûye û rewşeke awarte derketiye meydana. Sedema vê rewşa awarte bikaranîna kirdeya veşartî ye. Wekî ku diyar e, ne tenê kesek ‘Nuayman’ aniye pêşberî Rasulullah lê hin kesan ew aniye. Lewma kirde kesê sêyem ê pirjimar e. Nebûna vê kirdeyê bûye sedemê aloziyê. Lewma ziman di vê rewşê de barê diyarkirina nasnameya kirdeyê li pêveberê bar kiriye û di encamê de pêveber pirjimar hatiye kesandin.

21. “Birayê mumin! *Me ev meseleyên fiqhî* ji bo feydeyê xistin nav vê tefsîrê, li gorî dîtina *me ev ayeta han* ya ku nazil kiriye jî vê şîroveyê dixwaze: *Wî bes, ji we re mirar, xwîn û goştê berêz heram kiriye*” (Şoşikî, 2014: 219).

Ji ber sedema ergatîvê kirdeya hemû hevokan di rewşa tewandî de ne û lêkera ‘xistin’ û ‘nazil kirin’ ketine bin bandora biresera xwe ya yekjimar ji lewma ew yekjimar hatine kesandin. Lêbelê mêjera lêkera ‘heram kirin’ diviya pirjimar bihata kesandin. Çimkî biresera wê pirjimar e. Heke em mêjera wê pirjimar bikin dê alozî çareser bibe.

22. ‘‘Lêbelê *Henefî-mezheban ew mîqdarê seferê* bi 94 kîlometreyan teqdîr **kirine**’’ (Şoşikî,2014:).

Kirde bi qertafa ‘‘-an’’ê tewîyaye û pirjimar bûye. Pêveber (teqdîr **kirine**) jî pirjimar e. Ev awa şaş e çimkî li qayideyên ergatîviyê nake. Ji ber ku mêjera bireserê (mîqdarê seferê) yekjimar e divê pêveber yekjimar bihata kesandin. Awayê rast:

Lêbelê *Henefî-mezheban ew mîqdarê seferê* bi 94 kîlometreyan teqdîr **kiriye**.

23. ‘‘Resûlê Xwedê (s) jî **ev şertên wan** qebûl kir’’ (Şoşikî,2014).

Her wekî ku tê dîtin pêveber li vir yekjimar hatiye kesandin. Lêbelê diviya pirjimar bûya. Çimkî pêveber di rewşa ergatîviyê de li gorî mêjera bireserê tê kesandin ango yekjimarî û pirjimariya bireserê di pêveberê de tê nîşandan. Em bi hêsanî dibînin ku mêjera bireserê (ev şertên wan) di ravekê de xuya bûye ku ew pirjimar e. Lêbelê pêveber mêjera bireserê ranagihîne; çimkî yekjimar hatiye kesandin. Awayê rast divê wiha be: ‘‘Resûlê Xwedê (s) jî **ev şertên wan** qebûl **kirin**’’.

24. ‘‘Dîsa Îbn Ebbas gotiye: Ehlê cahiliyetê di mewsima heccê de kom dibûn û *her yekî ji wan behsa bavê xwe dikir*, digot: *Bavê min* nandar bû, **xwarin** dida xelkê. Vêca *wan* ji bilî medh û pesnên bavê xwe **behsa tiştêkî din nedikirin**’’ (Şoşikî, 2014: 251).

Lêkera ‘‘behsa ... kirin’’ di tevna ergatîviyê de xwedî rewşeke awarte ye. Ev lêker, ji ber sebebeke ku hêj em jê hay nebûne, ne li gorî kirdeyê ne jî bireserê tê kişandin, lê her tim yekjimar tê kesandin. Di vê nimûneyê de jî ev lêker li du deran hatiye bikaranîn. Lêbelê berê yekjimar pişt re jî pirjimar hatiye kesandin. Diyar e ku li vir xetayek hatiye kirin. Divê her du jî yekjimar bên kesandin.

25. ‘‘Dema **ev ayet** hat nazil**kirin**, jixwe *hin sehabîyan jê herambûn fêhm kir* û terka wê **kirin**, lêbelê *hinekên din jî herambûn jê fêhm nekirin*, ji lewma dev jê bernedan û li ser vexwarina we dewam **kirin**’’ (Şoşikî, 2014: 266).

Ji ber ku ‘‘jê ... fehm **kirin**’’ lêkereke bidaçek e digel ku kirde di rewşa tewandî de ye ew li gorî tevna ergatîviyê tevnagere û her tim li gorî kesê sêyem ê

yekjimar tê kişandin. Lewma ev lêker peşî rast û durist durre şaş hatiye bikaranîn. Divê bikaranîna duyemîn jî mîna a din yekjimar bê kesandin. Lê pêveberên hevokên din her çiqas li gorî ergatîviyê bi biresera xwe re li hev nekin jî xwedî mentiq û qalibeke awarte ne. Çimkî kirdeya pirjimar nehatiye gotin û nebûna vê kesê sêyem ê pirjimar wekî kirde rê li ber xirabbûna tevna ergatîviyê vekirîye û pêveber xistine forma pirjimariyê. Her çiqas ergatîvî ji holê rabûye jî dîsa ev qalibê awarte gelek kariger û berbelav e.

26. “Piştî nizûla wê *gelek sehabîyan* **terka wê kirin**. Vêca yê ku **terka wê nekiribû** û **vexwarana** jî bi rojê **ew venedixwar**, lewra wextên nimêjê li pey hev dihatin. Yanî eger **şerab vexwara** hê ji serxweşiyê xilas nebûyî wextê nimêja dindihat. Vêca firsenda vexwarina wê dima piştî eşayê. Vêca dilê kê tê de hebûya wê wextê **ew vedixwar**” (Şoşikî, 2014: 267).

Cînavka “wê” di şûna peyva “şerab”ê de hatiye bikaranîn û ji ber ku ev navdêr naye jimartin yekjimar tê hesabandin. Lê her du lêkerên binî xêzkirî vê yekjimariyê nîşan nadin çimkî pirjimar hatine kesandin û ev yek jî çewt e. Awayê rast divê wiha be:

“Piştî nizûla wê *gelek sehabîyan* **terka wê kir**. Vêca yê ku **terka wê nekiribû** û **vexwara** jî bi rojê **ew venedixwar ...**”

27. “Heta di beriya Îslamiyetê de jî di serdema cahiliyetê de *gelek mirovên eqilmend û bêhnpak* qet **şerab venexwarine**, wek nimûne: *Ebbas kurê Mirdas* hîç **ew venexwariye** û gotiye: Ez bi destê xwe cehaletê naxim zikê xwe, ez mezinê qewmê xwe bim, vêca çawa ezê bibim ehmeqê wan?!” (Şoşikî, 2014: 568).

Gelek balkêş e ku lêkera “vexwarin” tevî ku li her dû ciyan jî xwedî heman bireserê ye ew pêşî pirjimar piştî jî yekjimar hatiye bikaranîn. Xuyaye ku peywendî bi kirdeyê re hatiye çêkirin. Çimkî kirdeya hevoka pêşîn pirjimar e ji lewma dibe ku pêveber li gorî wê hatiye kişandin û ev xeta derketiye holê. Lêbelê ji ber ku biresera her du hevokan jî bêjeya “şerab” e û ji bo ku ew naye jimartin lêker divê ji ber rewşa ergatîvê yekjimar bihatana kesandin. Çimkî di demên borî de mêjer û kesaniya lêkerên gerguhêz li gorî mêjer û kesaniya bireserê tê diyarkirin. Ji ber ku di nîşeya

gorîn de mêjera bireser (şerab) yekjimar e divê mêjera lêkeran li gorî wê bihatana kişandin. Lewma “ *gelek mirovên eqilmend û bêhnpak qet şerab venexwarine*” nabe û divê bibe : “ *gelek mirovên eqilmend û bêhnpak qet şerab venexwariye*”.

28. “Lewra *wan* ji pêxemberê xwe **melikek yanî padîşahek** xwestibûn” (Şoşikî, 2014: 304).

Her wekî ku diyar e peywendi bi kirdeya pirjimar ve hatiye kirin û di encamê de pêveber pirjimar hatiye kesandin. Lê li gorî qayideyên ergatîvê ev hevok şaş e. Çimkî digel ku bireser (melikek an padîşahek) yekjimar e, pêveber pirjimar hatiye kesandin û ev yek jî li zagonên ergatîvê nake. Lewre pêveber gerhuhêz e û mêjera wê diviya li gorî mêjera bireserê bihata destnîşankirin. Rastiya vê hevokê diviya wiha bibûya: “Lewra *wan* ji pêxemberê xwe **melikek yanî padîşahek** xwestibû”

29. “Hema di serê *wan* de jî Ebû Bekr, ‘Umer, ‘Elî û dîgerên *wan* jî hebûn, tevan got; serdariya wî li ser seran û li ser çavan! Bi vî awayî *wan* **fermana Resûlê Xwedê** (s) qebûl kirin” (Şoşikî, 2014: 307).

Kirde hatiye tewandin lêbelê pêveber li gorî mêjera bireserê nehatiye kişandin. Ji ber ku bireser (fermana Resûlê Xwedê) yekjimar e, pêveber jî divê li gorî mêjera bireserê teşe bigre. Ji ber sedema ergatîvê rastiya vê hevokê wiha ye: “Bi vî awayî *wan* **fermana Resûlê Xwedê** (s) qebûl kir.”

30. “Yanî eger Xwedê îrade bikira, helbet ew ummetên ku piştî pêxemberan hatin, bi taybetî piştî ku ev delîlên qetî û mûcîzeyên diyarî çav li ser destê pêxemberan ji *wan* re hatine şandin, *wan* yê **hev û du nekuştana**, eger Xwedê bixwesta, helbet ewê neketana îxtilafê û *wan* dê **bi hev re îttifaq bikirana**, çawa ku pêxember tev bi hev re li ser heqiyê muttefiq in” (Şoşikî, 2014: 311).

Her wekî me berê jî dest nîşan kiribû cînavka “hev û du” yekjimar tê bikaranîn. Lewma rastiya wê diviya bibûya: “ *wan* yê **hev û du nekuşt**”. Herwiha diviya lêkera “îttifaq kirin” jî ne pirjimar lêbelê yekjimar bihata kesandin. Çimkî tevî ku kirdeya vê lêkerê di rewşa tewandî de ye jî ji ber ku jê re biresereke rasterast nîne ew li gorî kesê sêyem ê yekjimar tê kesandin. Em dikarin vê xeletiyê wiha sererast bikin: “*wan* yê **hev û du nekuşt**”

31. “Helbet eger *Xwedê* bixwesta, dê **mirov tev** li ser tebîetê melekana çêkirana, vêca *tu kesî* yê **bi tu kesî re muneqese û îxtilaf nekirana**, yê **hev û du jî nekuştana**, lêbelê *Xwedê* hekîm e” (Şoşikî, 2014: 311).

Mêjera pêveberên binî xêzkirî pirjimar e. Lêbelê ev awa şaş e. Diviya yekjimar bihata kesandin û wiha bibûya: “vêca *tu kesî* yê **bi tu kesî re muneqese û îxtilaf nekira**, **yê hev û du jî nekuşt**”

32. “*Mucahîd* gotiye: *Çar kesa dinya* bi dest xwe ve anîne, du ji wan mumin bûne, du ji wan jî kafir bûne; herçî herduyên mumin in Suleyman kure Dawud (e) û Zulqarneyn e. Herçî herduyên kafir in jî, Nemrûz û Buxttennasr in” (Şoşikî, 2014: 318).

Mêjera kirdeyê pirjimar lê ya bireserê yekjimar e. Di vê nîşeyê de tevî ku lêkereke gerguhêz di raweya dema borî de hatiye kişandin û kirde (*Çar kesa*) jî hatiye tewandin pêveber li gorî kirdeyê hatiye kişandin û lewma pirjimar bûye. Lêbelê ev awa şaş e çimkî diviya pêveber li gorî bireserê teşe bigirta. Lewre di tevna ergatîvê de kesa û mêjera pêveberê li gorî kesa û mêjera bireserê diyar dibe. Ji ber sedema ergatîvê awayê rast diviya wiha bibûya: “*Çar kesa dinya* bi dest xwe ve anîne”

32. “*Ayetên pêşiyê wicûda Xwedê* teala destnîşan dikirin, lêbelê ev ayet û digel ayeta: “*Dema îbrahîm got*” hebûna heşr û qiyametê îsbat dikan” (Şoşikî, 2014: 320).

Biresera hevokê ji ravekê pêk tê û yekjimariya xwe bi veqetandeka “-a” diyar kiriye. Lê mêjera kirde û pêveberê pirjimar e. Ev jî tê wê maneyê ku di vê mînakê de peywendiya kirde û pêveberê heye. Lêbelê diviya pêveber li gorî mêjera bireserê teşe bigirta. Lewma ji ber sedema ergatîvê rastiya wê diviya wiha be: “*Ayetên pêşiyê wicûda Xwedê* teala destnîşan dikan”

33. “Ji vî aliyê ku *tevan rêya hîdayetê* nîşanî mirovan **dane** û **exlaqên qenc** li navbera xelk û alemê belav kirine, em ferqê naxin navbera wan, eger ne ev be!” (Şoşikî, 2014: 353).

Kirde di rewşa tewandî de ye û pirjimar e, lê bireser yekjimar e. Lêkera gerguhêz “nîşan(î) dan” di raweya dema borî de pirjimar hatiye kesandin. Xuya ye ku bi xeletî lêker li gorî kirdeyê hatiye kişandin. Lêbelê ji ber rewşa ergatîv diviya mêjera wê li gorî bireserê diyar bibûya. Bireser jî ji xwe di ravekê de mêjera xwe diyar kiriye. Lewma diviya mêjera lêkerê jî yekjimar bibûya.



SONUÇ

Hint-Avrupa dil ailesine mensup birçok dilde zamanla ergatif yapısı kaybolmuştur ve yerine artık akuzatif özelliğe bürünmüşlerdir. Fakat Kurmanci Kürtçesi bu ergatif yapısını hala korunmaktadır. Bu dildeki ergatif dizgesi sadece geçişli geçmiş zaman cümlelerinde öznenin eğik/bükünlü nesnenin ise yalın halde olduğu ve yüklemnin özne yerine nesneyle eylemcil uyum gösterdiği dilbilgisi olgusudur. Bu dizgede yalın halde olan nesne herhangi bir ek almadığından cinsiyet ve sayı bakımından belirsizdir. İşte bu yüzden yüklem, nesnenin durumunu bildirmek amacıyla nesneyle çekime girerek onun sayı/şahıs ekini almak suretiyle nesnenin tekil ya da çoğulluğunu aktarır. Genel olarak ergatif dillerde de özne yüklemnin geçişli ya da geçişsiz çatılı olmasına ve zamanına bağlı olarak göre farklı halde bulunur. Bu dizgenin tam tersine akuzatif (nominatif) olan dillerde özne yüklemnin zaman ve çatısına göre değişmez ve her zaman yalın halde olur.

Bu çalışmada Kurmanci Kürtçesinin ergatif yapısının kullanımını ve işe yararlılığını tespit etmek için yazılı bir metne dayanarak incelemeye çalıştık. Bu bağlamda ergatif yapının özellikleri, kaideleri ve kullanılmadağı bazı istisnai durumları gösterdik. Çalışmada netice olarak şu sonuçları elde ettik:

1- Kurmanci Kürtçesi yarı ergatif bir özelliğe sahiptir. Bu özellik Kurmancinin en önemli ve en dikkat çekici dilbilgisi yapılarından biridir. O kadar ki Hirorî (2005) ergatif yapısının Kurmancinin mührü olduğunu belirtmiştir.

2- Kurmanci Kürtçesinde ergatif yapı sadece geçmiş zamanda geçişli cümlelerde karşımıza çıkmaktadır. Yani özne bükümlü hale gelmekte nesne ise yalın halde kalmaktadır. Nesne yalın halde kaldığı için cinsiyet ve sayı bakımından belirsizdir. Bu yüzden yüklem nesneye göre çekimlenerek onun sayı/şahıs yönünden belirli hale gelmesini sağlar.

3- Aynı zamanda Kurmanci K rt esi yarı akuzatif bir  zellik de g stermektedir. Őimdiki ve gelecek zamanlarda ve t m ge iŐsiz c mlelerde ergatif yerine akuzatif yapı  ne  ıkmaktadır. Akuzatif yapıda ergatif yapının tersine nesne b k nl   zne ise daima yalın kalmaktadır ve T rk e de olduĐu gibi y klem  zneye g re  ekimlenmektedir. Bu yapıda nesnenin y klem  zerinde h ibir etkisi yoktur.

4- Ergatif yapısı  zellikle yazılı dilde olduk a kullanıŐlı olduĐu i in yaygın bir Őekilde kullanılmaktadır. Bu baĐlamda incelediĐimiz yazılı metinde de bu yapı m ellif tarafından baŐarılı bir Őekilde kullanılmıŐtır.

5- Her ne kadar ergatif teriminin K rt ede kullanımı yakın zamanlara ait (2005'ten sonrası) ve K rt e dilbilgisi kitaplarında belli baŐlı yorumlar ve a ıklamalar etrafında gidip gelse de konunun istisnai durumları da dahil b t n y nleriyle araŐtırılıp ortaya  ıkarılması lazımdır. B ylece ergatif yapının ortaya  ıktıĐı durum,  zellik ve kurallar iyice anlaŐılabilsin ve Őu anda kullanımda g r len hata ve aksaklıklara   z m  retilebilsin.   nk  halihazırdaki dilbilgisi kitaplarındaki benzer a ıklamalar konuyu tam olarak a ıklıĐa kavuŐturamamakta karŐılaŐılan sorunlara etraflıca   z m sunamamaktadır. Aynı Őekilde bazı fiiller ve durumlar vardır ki ergatif yapısını ortadan kaldırmakta ve konuyu daha  etrefilli hale getirmektedir. Bu nedenle konu hakkında tartıŐma,  alıŐma ve araŐtırmalara  ok fazla ihtiya  duyulmaktadır. Zaten biz de bu  alıŐmayla s z konusu sorunların bir kısmına ıŐık tutmaya gayret ettik.

6- Aynı Őekilde ergatif yapının kural ve  zelliklerine g re hareket edildiĐinde konuŐma ve yazı dilindeki hataların daha da azalacaĐını tespit ettik.

7- Kurmanci K rt enin araŐtırma konusu olan ergatif  zelliĐi onu  oĐu d nya dillerinden farklı kılmaktadır.

KAYNAKÇA

- Alkış, H. (2019, Nisan). *Parça Bütünüün Habercisidir*. Nisan 25, 2019 tarihinde kardelendergisi: <http://www.kardelendergisi.com/yazi=1841> adresinden alındı
- Amedî, F. (2014). *Qurana Pîroz û Wergera Wî bi Kurdî*. Ensar .
- Aydoğan, İ. S. (2013). *Gûman-1*. Ankara: Lîs.
- Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*. Belkî.
- Bedirxan, C. E. (1994). *Bingehên Gramera Kurdmancî*. Weşanên Nûdem.
- Benek, A. (2015). Jiyanê Berhemdar Mela Mihemedê Şoşikî. *Nûbihar* (133), 22-23.
- Bozarslan, Z. (1999). Di Zimanê Kurdî de Tewange Sernavan. *Nûdem* (32).
- Bozarslan, Z. (2003, Kewçer). *Zimanên Ergatîv*. Ocak 19, 2018 tarihinde geocities.ws: www.geocities.ws/kmehname2003/45/diyari3.html adresinden alındı
- Bynon, T. (1979). The ergative construction in Kurdish. *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, 42(2), 211-224.
- Bynon, T. (1980). From passive to active in Kurdish via the ergative construction. In *Papers from the 4th international conference on historical linguistics* (pp. 151-163). Benjamins Amsterdam.
- Çağlayan, M. (1996). *Şark Ulemasi*. Istanbul: Çağlayan Yayinlari.
- Comrie, B. (1978). Ergativity. In *Syntactic typology: Studies in the phenomenology of language*. Edited by Winfred P. Lehmann, 329–394. Austin: Univ. of Texas Press.
- Dixon, R. M. (1994). *Ergativity*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Dorleijn, M. (1996). *The Decay Of Ergativity in Kurmanci*. Tilburg: Tilburg University Press.
- Eberhard, D. M., Simons, G. F., & Fennig, C. D. (2019). *How Many Languages Are There Spoken In The World*. Nisan 24, 2019 tarihinde Ethnologue Languages In the World: <https://www.ethnologue.com/guides/how-many-languages> adresinden alındı
- Eroğlu, Y. (2011, Haziran 23). *Ergatîvîte, Pirzimarî û Pproblemên Kirdeyan*. Eylül 15, 2018 tarihinde diyarname.com: <http://diyarname.com/news.php?ldx=4811> adresinden alındı

- Gemsiz, M. (2018). *Kuzey Kurmançça Gramer Kitaplarında Yapı Bakımından Fiiller ve İmlaları*. Haziran 5, 2019 tarihinde Yükseköğretim Kurulu Başkanlığı Tez Merkezi: <https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/TezSorguSonucYeni.jsp> adresinden alındı
- Gündoğdu, S. (2016). Muş Kurmancisinde Ortaya Çıkan Farklı Ergatif Dizim Yapıları-Variation in the Ergative Pattern of Kurmanji: Evidence from Muş. H. Karacan içinde, *Kürdoloji - Akademik Çalışmalar* (s. 342-344). Diyarbakir: Dicle Üniversitesi Basımevi.
- Haig, G. (1998). On the Interaction of Morphological and Syntactic Ergativity: Lessons From Kurdish. *Lingua* 105 , 156-157.
- Haig, G. (2004). Alignment in Kurdish: a diachronic perspective. *Unpublished Habilitationsschrift: philosophische fakultät der Albrechts-Universität zu Kiel*.
- Haig, G. L. (2008). *Alignment change in Iranian languages: A construction grammar approach* (Vol. 37). Walter de Gruyter.
- Hirorî, N. (2005, 6 10). *Ergativi Mohra Kurmanci ye*. Şubat 4, 2018 tarihinde nefel: http://www.nefel.com/kolumnists/kolumnist_detail.asp?MemberNr=10&RubricNr=&ArticleNr=202 adresinden alındı
- İncekan, A. (2009). *Ez Kurdî Hîn Dibim-Geçişli Fiiller ve Ergatîv*. İstanbul: Nûbihar.
- Kanî, A. (2017). *Morfolojîya Kurmancî û Zimannasî*. İstanbul: J&J.
- Kareem, R. (2016, Sibet). The Syntax Of Verbal Inflection In Central Kurdish.
- Kızıl, H. (2018). Çavkaniyên ji çanda kurdî di Nûra Qelban de. *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* , 579.
- Kızıl, H. (2016). Danasîna Tesîreke Bi Kurdî Nûra Qelban Mela Muhemmedê Şoşikî. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* , 201-206.
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê Kurdî*. Frankfurt: Weşanên Komkar.
- Lezgin, R. (2015). Kürtçe’de Akuzatif – Ergatif Özellik. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* , 84-85.
- Mahalingappa, L. J. (2009). *The acquisition of split-ergativity in Kurmanji Kurdish* (Doktora Tezi)
- Matras, Y. (1997). Clause combining, ergativity, and coreferent deletion in Kurmanji. *Studies in Language. International Journal sponsored by the Foundation "Foundations of Language"* , 21(3), 613-653.
- Muhammed, H. (2002). *Kurtenerînek li hin beşên rêzimana kurdî*. Ocak 20, 2018 tarihinde kulturname: <http://www.kulturname.com/?p=2802> adresinden alındı
- Muhammed, H. (2002). *Kurtenerînek li hin beşên rêzimana kurdî*. kulturname. adresinden alınmıştır

Nûbihar. (?). *Mela Muhemmede Şoşiki*. 10 29, 2018 tarihinde Nûbihar:
<http://nubihar.com/niviskar/65?page=6> adresinden alındı

Özdaş, H. (2016). Kürtçe Meâl-Tefsir Gelişim Süreci (Kurmancî Örneği). *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi* (8), 353.

Ramer, A. M. (1994). *The Origin of the Term Ergative*. Ocak 16, 2019 tarihinde academia.edu:https://www.academia.edu/38517465/_1994_The_Origin_of_the_Term_Ergative ve adresinden alındı

Reşîd, M. (2002). *PenaKurd*. Temmuz 30, 2018 tarihinde www.pen-kurd.org/kurdi/mustefareshid/ziman/mejere-lekere-i.html adresinden alındı

Samur, A. (2012). *Rêziman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî*. istanbul: Nûbihar.

Sawe, B. E. (2019, Ocak 22). *What Languages Are Spoken In the Middle East?* Nisan 23, 2019 tarihinde worldatlas: <https://www.worldatlas.com/articles/what-languages-are-spoken-in-the-middle-east.html> adresinden alındı

Şoşikî, M. M. (2010). *Tefsîra Qur'anê Nûra Qelban* (Cilt 1). Stenbol: Nûbihar.

Şoşikî, M. M. (2014). *Tefsîra Qur'anê Nûra Qelban* (Cilt 6). İstanbul: Nûbihar.

Şoşikî, M. M. (2015). Wext Çawa Derbas Bu. *Wext Çawa Derbas Bû*. (A. Benek, Röportajı Yapan) TRT Kurdi.

Tan, S. (2005). *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*. Enstîtuya Kurdî

Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî*. istanbul: Weşanên Entîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Tan, S. (2014, Mart 14). *Girtîgeh û Xebatên Bi Zimanê Kurdî*. Kasım 4, 2018 tarihinde diyarname.com: <http://diyarname.com/news.php?Idx=8156> adresinden alındı

Thackston, W. M. (2006). Ocak 19, 2018 tarihinde sites.fas.harward.edu:
<https://sites.fas.harward.edu/-iranian/Kurmanji/> adresinden alındı

Unus, S. (2000). Di zaravayê kurdmancî debabetekî balkêş: Ergatîv. *Nûdem* (34), 41.

Zaxoyî, Î. R. (2009). *Rêzman a Kurdî bo Qonax ên Amadeyî li dervayî welatî (Bergê 2)*. Duhok: Weşanxaneya Spirêz.